Li bajarên mezin şîddeta li dijî kurdan û neteweperestiya tirk • Dr. İlhan Kızılhan • ▶ 15

Tirkiye perçeyeke Ewrûpa'yê ye?
Dr. Hasan Kaygısız • ▶ 7

Selefîzm an jî guhertina îslamî ya bi îstîqrar
François Burgat • ▶ 18

LE MONDE diplomatique kurdî

Almanya: 3,50 euro
Welatên din: 4,00 euro

Hezîran 2010 - Hejmar 8 | www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com | 32 Rûpel

# Desthilatdariya bankayan

SERGE HALIMI

Qeşmeriya spekulatorên piyasa ya aborî dijberiya civakî şiyar dike û ev jî cesaret dide hukumetan da ku mesafe bixe navbera xwe û piyasa ya aboriyê. Roja 20'ê Gulan'ê Serok Barack Obama banqekarên ku li hemberî projeya wî ya ji bo birêkûpêkirina Wall Street derketin, weke "lobîstên xêrnexwaz" îlan kir. Gelo kesên ku çekan îmze dikin wê heta kengê zagonên dewletan jî binivisînin.

Roja 10'ê Gulan'ê 2010'an, ji ber temînat û enjeksiyoneke nû ya di buhayê 750 milyarî de, ku ket pîyasaya spekulasyonê, xwediyên şîrketên mezin herî kêm ji % 23,89 kara xwe bilind kirin. Heman roj, serokê Fransa'yê Nicolas Sarkozy da xuya kirin ku ji ber fikarên disiplîna malî wê alîkariya awerte ya ji bo malbatên hewcedar ku di buhayê 150 eworo da ye, berdewam neke. Bi vî awayî, di aboriyê de kirîza ku li ser kirîzê derdikeve baweriyeke wisa derdixe holê ku desthilatdariya polîtîk mîna ku li gorî rewşa moralên hîsedaran tevgere. Carnan demokrasî mirovan neçar dihêle. Siyasetmedarên hilbijartî bang li gel dikin ku dengê xwe bidin partiyên ku "piyasa" ji ber ewlekariya xwe, wan derdixe pêş.

Ji ber şik û gumananên xapandinê, êdî daxuyanî û hewldanên ji bo başiya gel, hêdê hêdî îtîbara xwe wenda dikin. Çend nûmûne: Li Amerîka'yê, M. Barack Obama bi armanca ku tedbîrên xwe yên aborî mafdar nîşan bide, Goldman Sachs bi dijwarî rexne kir. Li hember vê yekê, derdorên Komargerên amerîkî listeya karsazên ku di dema hilbijartinên serokatiyê yên 2008'an de alîkariya aborî dane Obama û hevalên wî eşkere kir: "Demokrat 4.5 milyon dolar. Komarger 1.5 milyon dolar. Siyasetmedar ji aliyek ve li hemberî endusriya aborî tedbiran digirin, ji aliyê din ve, jî bi milyonan pereyê ku Wall Street dişîne ser hesabê wan qebûl dikin."

Li Brîtanya, bi bahaneya parastina butçeya malbatên xizan, dema ku buhayê bîrayê hat rojevê, muhafazakar li hember derketin. Derdorên partiya karker di wê baweriyê de ne ku kêmkirina buhayê bîrayê tenê bi kêrî supermarketan tê û xwediyên wan wê jê feyde bibîne. Mijara kêmkirina buhayê bîrayê li hemberî cîwanan weke alav û malzeme hat bi karanîn. Ji ber ku cîwanên ku ji vê rewşê gelek kêfxweşin, dixwazin ku buhayê bîrayê ji avê jî erzantir bibe.

Li Fransa jî dema ku Nicola Sarkozy li ser kanalên televizyonên dewletê weşana hercure reklaman da rawestandin, herkes difikirî ku wê ji vê rewşê herî zêde rêvebirên kanalên taybetî ku di heman demê de dostên Sarkozy ne, kesên weke Vincent Bolloré, Martin Bouygues û hwd.. feyde bibînin û rewşeke wisa derkeve holê ku ev kes êdî ji bo parvekirina xenîmetên reklamê nekevin nava pêşpirikê.

Di cîhana siyasî de, ev şik û gumanên bi vî rengî ne tenê îro, herwiha di demên dîrokî de jî hatine ziman. Carnan, bûyerek wisa diqewume ku di şûna ku weke sikandal were dîtin de, tenê bi gotineke kilîşe jê re çaresrî tê dîtin "ev tişt ne îro, ji berê ve heye."

Bê guman di sala 1887'an de, kurê serokê wê demê yê Fransa'yê Jules Grévy, ji rewşa dê û bavê xwe yê li Elysée fayde girt

▶ 2

SIYASETA ALMAN, KURD Û TIRKIYE

# Hevalbendiya kujer a çekan

DR. NIKOLAUS BRAUNS*



*Kadir Akyol, "Kent", 14 x 18 cm, 2006*

Di şanonameya xwe ya bi navê "Faust" de helbestvanê navdar ê alman Johann Wolfgang von Goethe, welatiyekî alman weha dide axaftin:

*"Ez di yekşem û rojên betlaneyan de ji xweşiya xwe re tiştekî baştir nizanim,*
*Ji sohbeteke li ser şer û bang û hewara şer,*
*Dema ku li dûr, gelekî li dûr li Tirkiye'yê gel dikevin qirika hev.*
*Mirov li ber pace radiweste, qedehka xwe xelas dike*
*Û li jêrê dibîne çawa kelek û keştiyên rengîn di çem de berjêr dixuricin;*
*Paşê mirov dilşa vedigere malê*
*Û bi du'ayan aştî û demên aştiyê pîroz dike."*

Beriya 200 salan ev helwesta rehet guncan bû. Lê belê îro "şer û bang û hawara şer" li Tirkiye'yê, ji ya ku gelek mirov têgihiştine û gelekî wê de, bêhtir bi Almanya'yê re têkildar in. Ji bilî Rojhilata Navîn, li tu welatekî din ê dinyayê, bi qasî li Almanya'yê hene, mirovên bi eslê xwe tirk û kurd namînin. Bi ya daneyên fermî 2.7 milyon mirovên bi eslê xwe tirk li Almanya'yê hene, bêguman di nava wan de bi sedhezaran welatiyên bi eslê xwe kurd jî hene ku nasnameya wan li Almanya'yê jî nayê qebûlkirin. Bi ya gumanan, hejmara welatiyên bi eslê xwe kurd li Almanya'yê gelekî bi ser nîv milyonî ketiye û digihîje heta 800 hezarî – gelek ji wan di vê navberê de bûne welatiyên Almanya'yê. Ji ber ku di navbera Tirkiye û Almanya'yê de têkilyên siyasî, leşkerî û aborî yên, ku dikarin wekî dîrokî werin binavkirin, ji berê de hene, Almanya ji welatên Ewrûpa'yê gişan bêhtir bi pirsgirêka kurd re têkildar bûye.

▶ 4

** Dîrokzan û rojnamevan.*

www.arsivakurdi.org

# Desthilatdariya bankayan

1 ◀

û dest bi bazirganiya karê dekorasyonê kir. Di destpêka sedsala borî de, tê zanîn ku Standard Oil gelek waliyên Amerîka'ya Yekgirtî bi bertîl xwedî kir.

Mijareke din jî heye, ew jî diktatoriya aboriyê ye. Ji sala 1924'an û vir ve, sîstema "hilbijartina rojane ya xwediyên bonoyan" hebû. Kesên ku perê xwe bi deyn didan dewletê. Navê wî yê din "diwarê ji pereyan" bû. Di nava demê re, qanûnên li ser siyaset û aboriyê hatin guherandin. Rola sermayê ya li ser jiyana siyasî bi rêkûpêk bû. Heta li Amerîka'ya Yekgirtî: di serdema "pêşketina yekemîn" de, (1880-1920) heta sikandala Watergate (1974), pir buyerên ku tevliheviya aborî û siyasî nîşan didin derketin holê. Li Fransa'yê roja piştî azadiya netewî, "diwarê ji pereyan" cîhana aborî di bin çavan de hat girtin. Di encamê de, biwêja "ev tişt naguhere, ji berê ve heye" herçend were gotin jî, ev mantalîte jî diakre biguhere.

Guherîn, dîsa guherîn… lê guherîna berovajî. Ji 30'ê Çileya 1976'an vir ve, Dadgeha bilind ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê gelek qanûnên girîng ku bandora pere ya li ser siyasetê bi sînor dikirin,di şûna erêkirinê de, betal kir.

Dadger weke sedemê betalkirinê çi derdixin pêş? "Azadiya xwe îfadekirinê û ya fikir û raman divê girêdayî kapasiteya aborî ya ferdekî nebe. Mafê herkesî heye ku karibe li pêşberî civakê nêrînên xwe eşker bike." Bi gotineke din, xerc û mesref dibe fermî û xweîfadekirina wekhevî difetisîne… Çileya borî, qanûnên li ser mijarê ewqas hatin berfirehkirin ku destûr dida firmeyan daku karibin di pêşpirika hilbijartinan de çiqas dikarin li hemberî siyasetmedarek berendam têbikoşin. Ji aliyê din ve, endamên partiya komunîst ya soviyetan heryek ji wan bûn desthilatdarên endustriel, patronên çînî di nava partiya komunîste de kijan cihê bixwazin dikarin bi dest bixin, li Ewropa'yê rêvebir, wezîr û parlementer destpêkirine, bi amerîkawarî di "sektora taybetî" de cîh digirin. Rêberên olî yên Îran'ê û eskerên pakistanî ji xwe, ji ber pêşxistina karên aborî tev serxweş bûne (1). Bertilxurî, bûye weke sîstem û jiyana polîtîk ya cihanê ji rê derxistiye.

**Turne**

Di bahara 1996'an de, piştî dewra yekem serok William Clinton ji bo careke din were hilbijartin, ji nû ve ket nava kampanyaya hilbijartinan. Jê re pere diviya. Ji bo karibe piştgiriyeke aborî bi destbixe, fikrek hat bîra wî: Karsazên herî merd û dest vekirî yên endamên partiya wî hatin vexwendin ji bo şeveke xwe li qesra sipî derbas bikin. Weke mînak "di odeya Lincoln" de. Ji bo mirov karibe şevek xwe yan jî xewa xwe bi "hukumdarê mezin yê azadker re" re par ve bike, pêdivî ne bi dayîn û girtina borsayê hebû ne jî fantaziyen din dihat ferz kirin, tenê tiştek pir hêsan dihat xwestin. Karibe bi serokê Amerîka'ya Yekgirtî re li Qesra Sipî 'fincanek qahwe" vexwe. Finansorên herî mezin yên fona partiya demokrat dest pê kirin kom bi kom bi rêvebirên partiyê re hevdêtin pêkanîn. Berdevikê serok Clinton, M. Lanny Davis da xuya kirin ku ew bi van hevdîtinan dixwazin karsazên endamên partiyê di derbarê "pirsgirêkên endustriel de agahdar bikin (2)." Her merasimek "fincanek qahwa kar" ya li Qesra Sispî dikare bi milyaran dolar ziyan bide aboriya cîhanê, deynên dewletan bilind bike û dikare bibe sedem ku bi milyonan kes ji karên xwe werin avêtin.

Roja 13 Gulan 1996'an çend rêvebirên bijarte yên banqeyên herî mezin yên amerîkî li Qesra Sipî ji aliyê endamên rêvebir ve hatin pêşwazî kirin û civîna wan tam nod (90) deqe berdewam kir. Di civînê de li herdu kêlekên serok Clinton, wezîrê aboriyê M. Robert Rubin, alîkarê wî yê ji karên pere berpirsiyar M. John Hawke û berpirsiyarê karê banqeyan M. Eugene Ludwig cîh girtin. Hwerwiha xezîneya partiya demokrat M. Marvin Rosen jî di civînê de amade bû. Li gorî berdevik M. Ludwig, "banqekaran di civînê de mevzuatên pêşerojê guftûgo kirine, herwiha xwestine ku bi sererast kirina qanûnan çeper û dîwarên di navbera banqe û saziyên din yên aborî de ji holê werin rakirin (3)."

Piştî kirîza aborî û qezaya borsayê ya sala 1929'an New Deal li ser banqeyan ferz kiribû ku li hember îflazên muhtemel butçeyek girîng weke garantiya muşteriyên xwe daynin aliyekî. Vê yekê jî karê banqeyan dixist zehmetiyê. Qanûnên li ser vê mijarê ku di sala 1933'an de ji aliyê serok Franklin Roosevelt ve hatin îmze kirin heta sala 1996'an dihat pêkanîan. (qanûna Glass Steagall) Banqekarên ku ji vê rewşê ne razî bûn hêviya xwe bi "ekonomiya nû" ve girê dabûn. Yek ji armancên "fîncanek qahwa kar" ew bû ku vê astengiyê bînin bîra rêvebirên dewleta amerîkî hem jî di demeke wisa de ku ev rêvebir, ji bo careke din werin hilbijartin pêdivaya wan bi alîkariya aborî ya banqeyan heye.

Çend hefte piştî hevdîtina li Qesra Sipî, raporên fermî diyar kirin ku wezîrê aboriyê wê mevzûatek nû ya aborî bişîne pêşberî Kongrê ku tê de "zagonên di derbarê banqeyan de ku berî 60 salan hatine derxistin, nûkirina wan wê were guftûgo kirin. Ev jî tê wê wateyê ku êdî banqe bi hêsanî dikarin xebatên xwe yên aborî berfirehtir bikin û dikarin li gorî dilê xwe bikevin nav karên sîgorte û karên piyasayê (4)." Ji xwe berdewama pêvajoyê ji aliyê herkesî ve tê zanîn. Di sala 1999'an de sê sal piştî ji nûve hilbijartina serok Clînton, qanûna Glass Steagall hat betal kirin, bi giranî bi xêra xezîneya wî ya ji bo tekoşîna hilbijartinan (5). Ev guherîn bû sedem ku di piyasa salên 2000'an de, xerc û mesrefeke ji normalê zêdetir were kirin, (weke kirediya zêde ya hîpotek û razandinên cihêreng yên aborî û hwd.) ev rewş herwiha di encamê de bû yek ji sedemên kirîza aborî ya sala 2008'an.

Ya rastî, civînên "fîncanek qahwa kar" ya sala 1996'an (weke vê civînê, di heman salê de û li heman cihê herî kêm sedûsê (103) caran pêk hatin ) tenê gotina teralên alîgirê berjewedniyên fînansê piştrast kir. Ji ber ku piraniya Kongreya ku zagona Glass Steagall betal kirin ji komargeran pêk dihat Parlementerên komarger yên xwedî îdeolojiya lîberal jî ji aliyê banqeyan ve bi dolar hatin avdan. Di ser wan de pere hatin reşandin. Rêvebiriya desthilardariya Cilînton, ger civînên "fîncanek qahwa kar" pêk bihata yan nehata jî nikaribû zêde li hember daxwazên Wall Street li berxwe bida. Ji xwe wezîrê wî yê aboriyê M. Rubin berî niha ji Goldman Sachs re serokatî kiribû. Di kirîza aborî ya îlona 2008'an de jî M. Henry Paulson xezîna amerîkî bi rêve dibir. M. Paulson piştî ku Bear Stearns û Merryl Lynch – herdu raqîbên Goldman Sachs – ji mirinê re rû bi rû hîşt, piştgirî da American Insurance Group (AIG), ku topavêtina wî ziyaneke cidî da finansorê wî yê herî mezin… Gold- man Sachs.

Ji ber kîjan sedeman gel û miletek ku piraniya wî ji dewlemandan pêk nayê dikare qebûl bike ku wekilên wî daxwazên cihana endustriel, parazvanên aboriyê û yên banqeyan bîne cîh. Cîhana polîtîk li hemberî hêza ekonomîk di şûna ku meşrûtiyeta demokrasiyê ferz bike, tekiliyên xwe bi pêşdixe. Çima dema mirovên dewlemend bi xwe tên hilbijartin, di destpêkê de rêyekê dibînin ku sermaya xwe qat bi qat mezintir bikin? Tê îdîa kirin ku ji bo razandinên aborî bi têra xwe pêkwerin, ji bo sermaye tenê di derekî de kom nebe, divê derdorên piyasayê werin kêfxweş kirin û di mijara bacê de zor li wan neyê kirin. lewma berjewendiyên dewletê carnan neçare ji berjewendiyên ferdî û ji çîna bijarte re xizmetê bike ?

Ev pirsên li jor rewşa Îtalya'yê tîne bîra mirovan. Li vî welatî, yek ji mirovên herî dewlemend yên cîhanê, ti partiyek polîtîk ku karibe bandora xwe lê bike nedît, lewma bi armanca parastina berjewendiyên xwe partiya xwe ya arzî ava kir: Forza Italia, Roja 23ê Kanûn'a 2009'an rojnameya La Repubblica lîsteyek dirêj weşand ku tê de ji sala 1994'an virve cîh dide guherîna hîjdeh (18) zagonên ku împaratoriya bazirganî ya M. Silvio Berlusconi berfireh dike. Bi xêra van guherînan Berlusconî karî xwe ji zehmetiyên dadgerî jî rizgar bike. Ji aliyê din ve, wezîrê edaletê yê Costa Rica, M. Francisco Dall'Anase ji niha ve ji bo xeterek pêşerokê di nava hawarê de ye. Li gorî wî dewlet ne tenê di xizmeta berjwediyên banqeyan de ye, ewê herwiha bikeve xizmeta komên kirîmînel yên mêrkuj jî: "Komên bazirganên madeyên narkotîkê wê bikevin nava partiyên polîtîk, piştgirî bidin kampanyayên hilbijartinan û du re jî kontrola welêt bi dest bixin (6)."

Di rastiyê de ev hewldana La Reppublica piştre çi bandor li çarenûsa hilbijartinên li Îtalya kir. Rastgirên vî welatî çiqas hatin deşîfre kirin? Li gorî encama hilbijartinên dawî yên herêmê rastgiran ti zirar nedîtine. Her tişt çawa ku hatiye plan kirin di çarçoveya berjewendiyên wan de yek bi yek pêk tê. Çi îcab dike mirov xwe biqehirîne? Ji xwe siyasetmedar hewl didin dilê olîgarşiya nû kêfxweş bikin yan jî hewl didin li lutkeya pîramîda aborî li cem wan cihê xwe çêbikin? Berendamê serokatiyê yê komargerên amerîkî John McCain tespîteke di cîh de kikribû "mirovên xizan nikarin piştgirya aborî bidin siyasetê" Dûre ew bi xwe jî bû dilxwazê (lobbyist) endustriya aborî.

M. Clinton piştî ku ji ser textê Qesra Sipî daket, tenê di nava mehekî de ewqas pere qezenc kir ku bi qasî tevahiya qezenca wî ya pêncî û sê salên borî bû. Goldman Sachs tenê ji bo çar axaftinan 650 000 dolar pêşkêşî wî kir. Konferansek wî ya li Fransa'yê jê re 250 000 dolar anî. Saziya ku pere dayê Citigroup bû. Sala dawî ya li ser desthilatdariyê malbata Clînton hatina xwe ya salekî weke 357 000 dolar îlan kiribû. Di navbera salên 2001 û 2007'an wê bi tevahî 109 milyon dolar bi destxist. Tekiliyên wî yên di dema politikayê de, pişt re weke pere lê vegeriyan.

Lê belê "pantouflage" (mirovek payebilind yê dewletê dema ji şîrketeke taybetî re kar bike) nayê wê wateyê ku neçare heta dawiya jiyana xwe weke endamê olîgarşiyê bimîne. Li gorî rewşê şîrketên tayebetî, saziyên aborî, rêxistinên derveyê hukumetan ONG carnan ji dewletê bêtir bûn xwedî hukum û bûn cihê hegomanyaya entelektuel. Li Fransa'yê prestîja aborî gelek xwendevanên dibistanên bilind yên weke Dibistanan Netewî ya Dewletê (ENA), dibistana normal ya bilind û ya Polytechnique berbi xwe ve kişandin. Serok wezîrê berê Alain Juppé jî demekî mukur hatibû ku ew bi xwe jî ketiye nava hestek wisa: "Em tev ketin bin bandora wê cîhana bi pere. Bifikirn, ew cîwanên ku dihatin London'ê li pêşberî makîneyan di çend deqeyan de bi milyonan dolar ji derekî transferê derekî dikirin, di mehekî de bi milyonan euro bi destdixistin. Herkes heyran dima! […] Ez nikarim bibêjim ku di serê min de jî derbas nebû ku ez jî bikevin nava cîhana wan. Min di dilê xwe de, got eger min jî vî karî bikira îro nediketim vî halî (7)."

Li Fransa'yê, wezîrê berê yê bazirganiyê M. Yves Galland bu rêvebirê saziya balafirê ya Boeing France. Jina wezîrê berê yê ekonomî û endustriyê M. Hervé Gaymard, xanim Clara Gaymard, piştî karmendiya xwe ya li Bercy û wezîfeya xwe ya weke delege ya di bazirganiya navnetewî de, bû seroka giştî ya saziya elektrikê ya Fransa'yê. Xanim Christine Albanel ku sê salan wezîra çand û ragihandinê bû, ji nîsana 2010'an û vir ve serokatiya Telekoma Fransa'yê dike.

Bi qasî nîvê senatorên berê yên amerîkî weke lobbyist karên xwe berdewam dikin. Piraniya wan di xizmeta saziyên tazbetî de ne ku tekiliya wan di dema siyasetê de çêbû. Ev rewş ji bo 283 endamên rêvebirya Clinton û 310 endamên rêvebiriya Bush jî derbas dibe. Li Amerîka ya Yekgritî cîroya salane ya karê lobbying (parastina berjewendiyên derdorên aborî) digêhêje 8 milyar dolarî. Hêjmareke mezin e, lê kara wê kêm e! Weke mînak, di sala 2003'an de rêjeya kara ku ji ber xebata derve hatiye bi destxisitn, ya Citigroup, JP. Morgan Chase, Morgan Stanley û Merril Lynch ji % 35 heta ji % 5,25 kêm bûye. Fatura lobbying: 8 500 000 dolar. Kara ku ji bo bacê hatiye nîşandan: 2 milyar dolar. Navê zagona mijara gotinê: "qanûna ji bo afirandina cihê kar ya amerîkî (8)"…



*Kadir Akyol, "Metamorfoz I", 150 x 130 cm, 2009*

M. Alain Minc şêwirmendê berê yê M. Sarkozy dibêje "di civakên nûjen de, berjewendî û butça dewletê ne tenê di saziyên dewletê de herwiha di şîrketên taybetî de jî dikare were bi karanîn (9).

Cazîbeya cîhana aborî û (diyariyên wan) siyasetmedarên çepgiran jî berbi xwe ve kişand. Sekreterê Partiya Sosyalîst ya Fransa'yê M. François Hollande di sala 2006'an de da xuya kirin ku "serdema ku çepkir hatin ser wezîfê di sala 1981'an de, burjuvaziya bilind ji nû ve derket holê, [...] Yê ku ji kapîtalîzmê re serkêş û rêberên nû pêşkêş kirin, saziyên dewletê bû. [...] Kesên ku di asteya xizmeta gel de dest bi kariyera xwe kiribûn, di nava demê re derketin asteya dewlemendên nû û zimanekî wisa bi kardianîn ku mina ferman bidin siyasetmedarên ku di dema xwe de ew anîbûn ser wezîfê (10).

Ji vir û pê ve emê jî banqeyan û borsayê biparêzin!. Ji ber ku jinika bî ya bê mêr perê xwe radizîne van saziyan, karker ji bo di ser maeşê xwe re butçeyek bi dest bixe, û herwiha ji bo pêşeroja xwe misoger bike, hiseyan dikire. Di sala En 2004'an de, serokê berê George W. Bush di kampanya ji nûve hilbijartinê de piştgirtî da "vê çîna civakî ku bi vî armancê pere dirazîne" Rojnameya Wall Street Journal dinivisîne ku: "hilbijêrt çiqas hise bikirin ewqas piştgirtî didin siyaseta aboriya serbest ku ew jî ji aliyê komargeran ve tê parastin. [...] ji % 58'ê amerikiyan ya bi awayeke direk yan jî endirekt pere xwe razandine piyasaya aboriyê. Ev rêje berî şeş salan ji % 44 bû. Di civakê de kesên bi awayeke dîrek perê xwe razandine, ji kesên hêsantir dikarin xwe weke komarger îlan bikin (11)." Em fêmdikin ka ji bo çi M. Bush tim xeyal dikir, teqawutê jî arzî bike.

Ekonomist û aborîzan Frédéric Lordon (12) meha borî da xuya kirin ku "her desthilatdarî ku ev bîst salin ji derdorên aborî re serî ditewînin, heta ku li hemberî xwe tevgereke hişk ku neyê tolerekirin nebînin, li hember vê derdorê dernakevin." Tedbîrên ku dewletên weke Almanya, Fransa, Amerîka'ya Yekgirtî û yên welatên G-20'an li hemberî derew û spekulasyanan digirin, wê nîşanê me bidin ka pîyasa aborî wê heta kengê rojane bi rûmeta dewletan bilezîye. Hêrs û nerazîbûna civakî ya ku dikare rûyê veşartî yê banqeyan derbixe holê, dibe ku cesaret bide desthilatdariyên westiyayî yên ku ji hale xwe kerixîne daku êdî destûr nedin ku ji aliyê piyasayê ve weke xizmetkar werin bi karanîn û rûmeta ku ji xwe kêm maye biparêzin.

**Wergera ji fransî**
**Bedran Dere**

---

(1) Bixwîne: "L'argent" (pere), "L'empire économique des pasdarans" (împaratoriya abori ya pasdaran), û "Mainmise des militaires sur les richesses du Pakistan" (desteserkirina dewlemendiyên Pakistan'ê ya ji aliyê leşkeran ve) Le Monde diplomatique, çile 2009, Sibat 2010 û Çile 2008.

(2) Cf. "Guess Who's Coming for Coffee?", The Washington Post, Washington, 3 Sibat 1997.

(3) Ibid.

(4) Ibid.

(5) Bixwîne: Thomas Ferguson, "Le trésor de guerre du président Clinton" (xezîneya şer ya Serok Clinton ) Le Monde diplomatique, 1996.

(6) Hat nivîsandin ji aliyê London Review of Books, Londres, 25 Sibat 2010.

(7) Bername "Parlons Net", France Info, 27 Adar 2009.

(8) Dan Eggen, "Lobbying pays", The Washington Post, 12 Nîsan 2009

(9) France Inter, 14 avril 2010.

(10) François Hollande, Devoirs de vérité, Stock, Paris, 2006, pp. 159-161.

(11) Claudia Deane et Dan Balz, "'Investor Class' Gains Political Clout", The Wall Street Journal Europe, 28 octobre 2003.

(12) "Les blogs du Diplo", 7 mai 2010, http://blog.mondediplo.net/2010-05-07-Crise-la-croisee-des-chemins

# Hevalbendiya kujer a çekan

1 ◀

**Ji rêya hesinî ya trênan a Bexda'yê heta bi hevgirtina di nava NATO'yê de**

Hîna sala di sala 1838'an de efserê prûsyayî Helmuth von Moltke alîkarî da sultanê osmanî da ku artêşeke xurt a bi ya mînaka Prûsya'yê damezirîne û ji bo tepisandina serhildanên kurdan, wekî şêwirmendê leşkerî bi rolekî girîng rabû. Ber bi dawiya sedsala 19'an ve împaratoriya alman kete qonaxa xwe ya emperyalîst û fînans-kapîtal û li bazarên nû, qadên perexistinê û rezervên çavkaniyên xwezayî yên li derveyî Almanya'yê geriya. Rosa Luxemburg a marksîst rewş weha analîz kir: "Qada çalakbûnê ya herî girîng ji bo emperyalîzma almanan bû Tirkiye. Li vir a ku leza wê diyar dikir Deutsche Bank û bazarên wê yên gelekî mezin ên li Asya'yê yên li navenda siyaseta rojhilat a alman bûn. (1)" Ji bo ku sermayeya alman bikeve Tirkiye'yê çekfirotin û çêkirina riyên hesinî, amûrên herî girîng bûn. Împarator Wilhelm ê II. Di sala 1898'an de li Şam'ê sond xwar ku ew dostekî dilsoz ê cîhana musulman e, pêşketina emperyalîzma almanan li Rojhilata Navîn veguherî ew mijar ku li pêş dihê girtin. Ji sala 1902'an û şûn ve rêya hesinî ya Bexda'yê ku wê ji Konya'yê, di ser Bexda'yê re, bigihiştana Kendava Pers, bû sembola pirsgirêkbarkirîbûna siyaseta cîhanî ya alman. Şîrketa anonîm a ku ji aliyê Deutsche Bank ve dihat birêvebirin di heman demê de bû xwediyê mafê derxistina petrolê li qadên petrolê yên Mezopotamya'yê li dora Mûsil û Basra'yê. Stratejîstê alman ê kolonyal Paul Rohrbach di pirtûka xwe ya bi navê Die Bagdad-Bahn – Vom deutschen Weg zur Weltgeltung (Riyahesinî ya Bexda'yê: Ji riya alman ber bi qebûlkirina ji aliyê cîhanê ve) de sala 1902 weha digot: "Bi tenê Tirkiyeyeke di warê siyasî û leşkerî de bihêz, destûrê dide me ku hêviyên mezin ên mezinkirina sermayeya me ya neteweyî û başkirina aboriya me li welatên li ber beravên Ferad û Dîcle'yê, misoger bibin. Û her weha bi vî rengî emê karibin bi rastî bi îhtîmaleke mezin di qada hebûna reel de jî cihê xwe bigirin. Tirkiyeyeke lawaz ne hêja ye ku mirov qirûşekê lê xerc bike, lê belê li yeka bihêz mirov dikare çi qas pere werin xwestin ew qasî lê bide. (2)" Di vê siyasetê de piştî sedsalê jî hema bêjin tu tişt neguheriye.

Bîranînên li ser armanca şer ên sermayeya yekdestdarî ya alman, di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de wezîfeya ku ji nava êgir perengan derxe, ango herêmên Qafqasan tevî çavkaniyên petrolê yên li ber deryaya Hazar'ê dagir bike, da artêşa osmaniyan. Di bin fermandariya alman de artêşa osmanî jî mil bi mil ve li cem împaratoriya alman şer kir. Di qirkirina li dijî Ermeniyan a salên şer ên 1915 û 1916'an de, ku tê de bêhtirî milyonek mirov hatin qetilkirin, dîplomatên alman bûn pê-zaneyên wê û leşkeriya alman ji xwe bû alîkarê çekê destûbirayên xwe yên Jon-Tirkan. Adolf Hîtler di 22'ê Tebaxa 1939'an de ev qirkirin ji xwe re mînak digirt. Hîtler di axaftina xwe ya ji bo efserên payebilind ên leşkeriyê û SS'ê de, sebaret bi şerê li dijî Yekîtiya Sovyetan, ku dihate plankirin, behsa bê dilrehmî qirkirina dijmin dikir û got "Ma îro kî behsa tunekirina Ermeniyan dike? (3)"

Di çarçoveya NATO'yê de destûbiratiya çekan a alman û tirkan di salên 1960'î de vejiya. Efserên tirkan li Akademiya Artêşa Alman a li Hamburg'ê û li Dibistana Mekîneyên Zirxî ya Munster'ê hatin perwerdekirin. Piştî biryara NATO'yê ya sala 1964'an ku alîkariya bêveger a çekan da Tirkiye'yê, di heman salê de piştî Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê, Almanya bû ew dewlet ku herî zêde çekan difiroşe yan jî dide Tirkiye'yê. Heta 1991'ê çek û amûrên leşkerî, ku buhayên wan 6.3 milyar mark bûn, Almanya'yê dan yan jî firotin Tirkiye'yê. Bêhtirî nîvê van çekan piştî 1985'an, an ku piştî ku têkoşîna çekdarî li Kurdistan'ê destpêkir, dan Tirkiye'yê. Dan û firotina çekan heta îro bi tu qedexeya firotina çekan nehatiye astengkirin, lewra welatê ku çek diçinê welatekî endamê NATO'yê ye.

Di bin parastina manevraya payîzî ya NATO'yê de, ku li deverên kurdnişîn ên Tirkiye'yê pêk hat û hezar leşkerên artêşa alman jî tê de beşdar bûn, artêşa tirk di bin fermana Serokê Fermandariya Giştî ya Artêşê Kenan Evren de di 12'ê Îlona 1980'ê de darbeyeke leşkerî pêk anî. Çend rojan piştî darbeya leşkerî hukûmeta alman ji bo çekdarkirina polêsên tirk bi Tirkiye'yê re peymanek mohr kir. Ji 1986'an û vir ve tîmên taybet ên alman GSG 9, tîmên taybet ên tirk ji bo şerê li dijî serhildanan perwerde dikin. Van tîmên taybet li Kurdistan'ê hovîtiyên bêhejmar pêk anîne. Li aliyekî bi sedhezaran muxalif – sosyalîst, sendîkavan û çalakgerên kurd – di zindanên cuntayê de dihatin wendakirin û gelekên din jî dihatin qetilkirin, li aliyê din Almanya'yê têkiliyên xwe yên baş bi Tirkiye'yê re dewam dikirin. Rojnameya muhafazakar "Die Welt" di sala 1981'ê de ev xeta hevkariyê ya ku ji hev qut nabe û dewam dike, nas kir: "Bi vî awayî Komara Federal a Almanya'yê kevneşopiyeke aboriya ber bi derve ve, ya ku digihîje heta dema Împaratoriya alman, Komara Weimer û Împaratoriya Sêyemîn (dema Desthilatdariya Naziyan), dewam dike. Ev yek jî xwe di pêwendiyeke ji nêz ve ya taybet a di navbera alman û tirkan de dide der. Pêwendiyeke bi vî rengî di navbera Almanya û tu dewleteke din de nîn e (4)."

**Çekên DDR'ê û şerê li Kurdistan'ê**

Di destpêka salên 1990'î de Hukûmeta Federal a Alman beşeke mezin a çekên Artêşa Gel a Neteweyî ya DDR'ê (NVA) da Tirkiye'yê. Bi vî rengî Hukûmeta Federal a Alman bi riya 'dîplomasiya deftera çekan' a pê hevalbendekî di NATO'yê de hat çekdarîkirin, xwe ji beşdarbûneke yekser a di wî şerî de, ku di pêşengiya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê de li dijî Iraqê sala 1991'ê hat birêvebirin, xelas kir. Almanya'yê ji panzerên NVA'yê 300 panzerên heşt- dolabî yên modela BRT-60 dan Tirkiye'yê. Ev panzer çekên gelekî baş in ji bo şerê li Kurdistana çiyayî. 250 hezar tifingên kalaşnîkof ên NVA'yê jî bi taybetî ji bo çakdarîkirina bi deh hezaran cerdevanan hatin bikaranîn. Ev sîstema cerdevaniyê li dijî PKK'ê hatiye rêxistinkirin. Di sala 1992'an de şahidan da zanîn ku di êrîşa li dijî bajarê Şirnex'ê de panzerên bi vî rengî yên ji Almanya'yê, hatine bikaranîn. Salekê paşê li Almanya'yê kanala televizyonê ya dewletê ya duyemîn ZDF'ê dîmenek nîşan da. Di vê dîmenê de xuya bû ka çawa gerîllayek, li nêzîkî navçeya Cizîr'ê ya bi ser Şirnex'ê, bi panzereke BRT-60 ve hatiye girêdan û heta ku dimire di erdê re dihê kaşkirin. Ji ber ku bi ya peymana NATO'yê alavên leşkerî yên ku dane welatekî bi tenê ji bo parastina vî welatî dikarin werin bikaranîn, Hukûmeta Federal a Alman di bin zextê de neçar ma ku dayîn û firotina alavên leşkerî bo Tirkiye'yê ji bo demeke kurt rawestîne. Lê belê hukûmet heta îro jî înkar dike ku têra xwe delîl hebûn, ku nîşan didin ku ew çekên ku Almanya'yê dane Tirkiye'yê di şerê li dijî kurdan de hatiye bikaranîn. Wezîrê Karê Derve Klaus Kinkel di 1995'an de îddîa dikir ku îhtîmal hebû ku ev ew panzer bin ku Rûsya'yê firotine Tirkiye'yê, her çend Rûsya'yê bi tenê çendek panzer firotibûn Tirkiye'yê.

Piştî jihevketina Yekîtiya Sovyetan, di sala 1995'an de alîkariya leşkerî ya NATO'yê bêmûçe dida Tirkiye'yê jî bi dawî bû. Lê belê firotina çekan a bi destê şîrketên taybet ên endustriya çekan û bi garantiya îxracatê ya Hukûmeta Federal a Alman her berdewam bû. Enqere'yê di 1999'an de xwest ku tankên tîpa Leopard II bikire û ev yek wê demê ji bo hukûmeta federal veguherî azmûneke man û nemanê. Hingî Partiya Kesk, ku di koalîsyonê de bû, xwe bi Partiya Sosyal Demokrat da qebûlkirin û tank nehatin firotin. Lê demeke kurt piştî hilbijartinên giştî yên sala 2005'an, koalîsyona di navbera Keskan û Sosyal Demokratan de, piştî ku êdî hukûmeteke din jî hatibû hilbijartin, wekî yek ji karên xwe yên dawî yên hukûmetê ji bo firotina 298 tankên Leopard II peyman bi Tirkiye'yê re mohr kir. Enstîtuya Lêkolînên Aştiyê ya Stockholm'ê SIPRI di rapora xwe ya salane de, ku di Pûşber a 2009'an hat weşandin, bi belgeyan nîşan da ku Tirkiye tevî Yûnanistan û Afrîkaya Başûr hîna jî ew welat e ku herî zêde çekên alman dikire. Dema ku di Sibata 2008'an de bi hezaran leşkerên artêşa tirk sînora Başûrê Kurdistan'ê derbas kir, dîmenên televizyonan nîşan dan ku gelek çek û alavên leşkerî yên alman di vê êrîşa li dijî huqûqa navneteweyî ya Mirovî de hatine bikaranîn. Di nava wan de panzer û mekîneyên veguheztina leşkeran Unimog ên fîrmaya Mercedes Benz'ê jî hebûn. Di Adara 2010'an de dîsa bi deh hezaran leşkerên tirk li ser sînora Başûrê Kurdistan'ê hatin komkirin û veguhestina wan dewam dike, di vê demê de serokwezîra Almanya'yê Angela Merkel li Enqere'yê peymana firotina 56 tankên din ên Leopard II mohr kir.

**Berjewendiyên aborî pêştirî mafê mirovan in**

Piştî ku şerê sar bi dawî bû, ji bo siyaseta karê derve ya alman, Tirkiye ji nû ve wekî dema avakirina riya hesinî ya Bexda'yê bû xwediyê rola dergehê ku vedibe Rojhilata Navîn. Ji bo berjewendiyên li Rojhilata Navîn û Nêzîk berferehbûnê yên Almanya'yê û gihandina madeyên xam ên li wir û bazarên wir, Tirkiye hevalbendê stratejîk e. Almanya ev demeke dirêj e di warê bazirganiyê de hevalbendê herî girîng ê Tirkiye'yê ye û bazara Tirkiye'yê tevî 70.5 milyon muşteriyên pêkan û şêniyên xwe yên ciwan ji bo şîrketên alman gelekî girîng e. Mezinahiya bazirganiya dualî ya her du welatan di sala 2007'an de gihişte hejmareke gelek bilind, 24.8 milyar euroyan, û ji ber krîza aborî ya sala 2009'an ji sedî 19.8'an kêm bû. Buhayê malên Almanya'yê, ku par firotin Tirkiye'yê, 11.5 milyar euro bû. Di nava wê de beşa girîng, ji bilî endustriya çekan, a mekîneyan, alavên elektronîk, wesaît û parçeyên ji bo endustriya çêkirina otomobîlan bû. Bi mîqdara 7.6 milyar dolar, ji sala 1980'î û vir ve ew welatê biyanî ku herî zêde pereyan dixe Tirkiye'yê, Almanya ye. Di vê navberê de Rûsya niha hêdî hêdî, dike ku wekî hevalbendê bazirganiyê yê herî girîng ê Tirkiye'yê, Almanya'yê derbaz bike.

Ji bo Almanya û Ewrûpa'yê Kurdistan di warê siyaseta enerjiyê de ji bo xetên lûleyên petrolê û gaza xwezayî yên heyî û yên dihên plankirin, herêmeke gelekî girîng a transît e. Bi vî rengî xeta lûleyên gaza xwezayî Nabucco di nava erdên Kurdistan'ê re dibihure, ku Ewrûpa dixwaze pê hewcedariya xwe ya bi Rûsyayê ve kêm bike. PKK, ya ku beriya niha gelek caran li dijî xetên lûleyên petrol û gaza sirûştî çalakî li dar xistin, ji aliyê Yekîtiya Ewrûpa'yê ve wekî xetera li dijî ewlekariya enerjiyê dihê dîtin. Yekîtiya Ewrûpa'yê bi vî rengî destûrê dide "têkoşîna li dijî terorê" ya Enqerê.

Navhevketina aborî ya Tirkiye û Almanya'yê, Tirkiye'yê dixe rewşekê ku ne bi tenê girêdayî ye, her weha dixe rewşekê ku ew dikare daxwazan jî bike. Hukûmeta tirk dikare bi awayekî rehet û ji xwe razî ji Almanya'yê bixwaze ku tedbîran li dijî muxalifên kurd û tirk ên mişextbûyî bigire.

**Şerê li dijî serhildanê yê ku ji sînoran dibihure**

Dema ku piştî havîna sala 1984'an şerê çekdarî dest pê kir, PKK her ku çû bêhtir li Kurdistan'ê xurt bû û pirsgirêka kurd bi serhildanan re bala raya giştî ya navneteweyî kişand ser xwe. Bi ya NATO'yê, vê yekê seqemgîriya Tirkiye'yê dixist xeterê; Tirkiye ya ku li dijî Yekîtiya Sovyetan û pêşketin û bûyerên antî-emperyalîst ên li Rojhilata Navîn wekî bendek bû ku bi kêrî NATO'yê dihat. Di çarçoveya şerê li dijî serhildanan ê NATO'yê de wezîfeya ku dibû para dadgeriya siyasî ya Almanya'yê ew bû ku tevgera rizgariya kurd wekî terorîst krîmînalîze bike. Li Rojavayê Ewrûpa'yê kurdek bihata kuştin, ew dixistin stûyê PKK'ê. Rêxistina îstîxbaratê ya tirk MİT'ê ji bo ku gunehê wê bixe stûyê PKK'ê, li dijî konsolosxaneya giştî ya tirk a li Hamburg'ê êrîşek plan kir. Dozgerê giştî yê federal Kurt Rebmann bi dîktatoriya leşkerî ya tirk re li

dijî terorîzma navneteweyî, hevkariyeke pir ji nêz ve dikir. Heman Kurt Rebmann Partiya Karkerên Kurdistan'ê (PKK) wekî "dijminê sereke yê ewlekariya navxweyî" ragihand (5). Bi îddîaya ku endamên yekîtiyeke terorîst in û di nava PKK'ê de dijminên partiyê kuştine, bi ya xala 129 a Qanûna Cezayî ya Alman li 20 siyasetvanên kurd doz hat vekirin. Di saloneke dadgehê ya binerd de yên ku dihatin gunehbarkirin ji 24'ê Cotmeha 1989'an û pê ve di qafeseke camî de wekî heywanên kûvî hatin nîşandan – di çavên parêzvanan de ev "şêwaza Ewrûpa ya Naverast a di warê paqijiyê de bêqusûr ê dozên qelp ên girseyî yên dadgehên leşkerî yên tirk" bû. Li dijî piraniya mirovên ku hatin dadgehkirin, doz ji ber "kêmbûna delîlan" betal bû. Di encama îfadeyên şahidekî sereke de di Adara 1994'an de bi tenê li du kesên ku dihatin gunehbarkirin cezayê muebbetê hat birrîn. Du kesên din, ên ku ceza li wan hat birîn, jî di cih de hatin berdan, lewra dema ku dozê dewam dikir û ew girtî bûn û ji cezayê ku li wan hatibû birîn bêhtir ew girtî mabûn. Hewldana dozgeriya federal a alman, a ku dixwest deqa terorîstiyê li ser tevahiya tevgera rizgariyê ya kurd bide, têk çûbû.

Dema ku artêşa Tirk di 22'ê Cotmeh a 1993'an de navçeya Amed'ê Lice bombe kir, kurdên li Ewrûpa'yê ku hêrsa wan rabûbû, li dijî nûnergehên tirk, qehwexane û ofîsên tûrîzmê çalakî li dar xistin. Di çalakiyekê de xwediyê qahwexaneyekê hat kuştin, tevî ku nehat piştrastkirin ku PKK'ê ev çalakî bi rê ve biriye jî, Wezîrê Karê Navxweyî yê Almanya'yê Manfred Kanther (CDU) di 26'ê Mijdara 1993'an de qedexeya xebatê danî ser PKK'ê, Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan'ê (ERNK) û 29 komeleyên herêmî. Di fermana qedexeyê de weha dihat gotin, "[...] xebatên PKK'ê û rêxistinên pê ve girêdayî li dijî qanûnên cezayî ne, li dijî fikra bi hev re jiyana gelan e, ji bo ewlekariya navxweyî, nîzama gelemperî û gelek kar û barên din ên Komara Federal a Almanya'yê tehlûke ye. [...]. Sûcên wê ew e ku jiyana aştiyane ya di navbera kurd û tirkan de, hem li Tirkiye'yê û hem jî li Almanya'yê, xerab dikin. [...] Çalakiyên bi şîddet ên siyasî [...] ji bo berjewendiyên siyaseta derveyî welêt a Komara Federal a Almanya'yê tehlûke ne. Ev çalakî têkiliyan bi dewleta tirk re gelekî zêde xerab dikin [...]. Ajîtasyona siyasî ya PKK'ê û rêxistinên nêzî wê êdî gihiştiye astekê ku di warê siyaseta derve de nema dikarin werin başkirin. [...] siyaseta derve ya alman û siyaseta derve ya tevahiya Cîhana Rojava, ji bo aştiya li tevahiya herêmê, alîgirê yekparebûna erdê hevgirê xwe yê NATO, yê Yekîtiya Rojavayê Ewrûpa'yê WEU, û Ewrûpa'yê ye. Sebra ku em nîşanî çalakiyên PKK'ê li Almanya'yê bidin, wê bike ku bawerî bi vê siyaseta derve ya alman nemîne û baweriya yek ji hevgirên girîng ên ku em qîmetê didin, wê bi me nemîne. Wekî din, li Tirkiye'yê hêzên ku dixwazin têkiliyên bi Ewrûpa'yê re û pê re jî bi Cîhana Rojava re lawaz bikin, wê xurt bibin [...]." (6)

### Qedexeya li ser PKK'ê

Bi qedexekirina PKK'ê ya ku bi kampanyayeke sorkirinê ya li dijî "Terorkurden (kurdên terorê)" ya çapemeniya alman, bi sedhezaran welatiyên kurd ên li Almanya'yê êdî bi giştî bûn gumanbar. Bi hezaran lêpirsîn hatin destpêkirin. Ji sala 1993'an û vir ve gelek xwepêşandan, şahî û heta maçên futbolê û dawet jî hatin qedexekirin, polêsan avêt ser bi sedan komeleyên çandê û xaniyên taybet. Bi tenê nîşandana wêneyên Öcalan a di xwepêşandanan de bi awayekî rêk û pêk dibe sedema girtin û birrîna cezayê pereyan. Wekî li Tirkiye'yê, pîrozbahiyên Newroza sala 1994'an li Almanya'yê jî hatin qedexekirin. Otobûsên 21'ê Adarê diçûn cihê prîozbahiyê hîna li ser otobanan hatin rawestandin. Bi çûn û hatinê birrîna otobahnan Kurdan dixwest riyan vekin. 1'ê Tîrmeha 1994'an li Hannover'ê, Halîm Dener'ê 16 salî dema ku afîşa ERNK'ê bi dîwêr ve dikir, polêsekî sivîl ji pişt ve gule berdayê û ew qetil kir. Dadgehê biryara beraata kujer da. Bi hinceta ku şiara "Çareseriya Siyasî û Demokratîk li Kurdistan'ê" bi awayekî erînî nêzî agirbesteke PKK'ê ya li Kurdistan'ê dibe û qaşo guman heye ku PKK wê organîze dike, xwepêşandaneke mezin a ku ji bo 12'ê Adara 1996'an diviyabû ku li Dortmund'ê bihata lidarxistin, hat qedexekirin. Polês dor li Eyaleta Westfalya ya Bakurê Ren'ê (NRW) girt, destûr nehat dayîn ku mirovên ku wekî biyaniyan xuya dikin ji trênan peya bibin û mekîneyên kurdan di wan de dolabên wan bi xaçên sor hatin nîşankirin. Li Almanya'yê girtinên girseyî yên bi ya qanûnên polês en herî mezin ên piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn pêk hatin. Li gelek deveran rewş veguherî şerê li ser kolanan ê bi polêsan re. Hêrsa wî rabûyî, Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan gef xwarin û got, eger gefa dersînorkirinê li Kurdan were xwarin û wan radestî "dewleta faşîst a Tirkiye" bikin, dibe ku kurd xwe bi çalakiyên xwekujî li Almanya'yê biparêzin. Öcalan weha peyivî: "Almanya xetera ku bibe dijminê me yê şer ê duyemîn, diafirîne. Her kurd hingî wê veguhere bombeyeke zindî." (7) Wezîrê Karê Derve yê Almanya'yê îddîa kir ku PKK'ê fermana kuştina wî daye û çapemeniya şelan a Bulvar jî qaşo bi planên PKK'ê yên kuştina ajotvanê alman Michael Schumacher dizanî. Di dawiyê de Öcalan paş de gav avêt û ev daxuyanî da: "Ev ê di warê siyasî û exlaqî de ne rast be eger em bixwazin doza kurdan li Almanya'yê bi şîddetê çareser bikin. Ez bi awayekî zelal alîgir im ku şîddet neyê bikaranîn." (8) Garantiya ku Öcalan da, ya ku alîgirên PKK'ê li Almanya'yê ji niha û şûn ve wê bi ya qanûnan tevbigerin, bi rastî jî rewş hinekî aram kir. Tevî ku di heman demê de serdegirtina komeleyan dewam dikir û çalakiyên piçûk ên herêmî de beşdar bi hinceta sloganên ji bo PKK'ê gotine mirov dihatin girtin, wê salê Festîvala Navneteweyî ya Kurd bi tevlêbûna nêzî sed hezar mirovî bêpirsgirêk pêk hat.

Di dozên li dijî kesên bi ya îddîayên dewletê rêveberên PKK'ê de, kesên hatin gunehbarkirin, bi ya şemaya ji salên 90'î û vir ve wekî xwe mayî û neguherî, wekî "serokê" "yekîtiyeke krîmînel" – beriya 1998'an carina yê "yekîtiyeke terorîst"- doz li wan dihat vekirin û li para bêhtir gelek sal cezayê girtîgehê dihat birrîn. Ji bo vî cezayî ne ferz bû beşdariya sûcên berbiçav jî were piştrastkirin. Di dozan de dadgehên alman bi israr naxwazin guhertinên PKK'ê bibînin û her weha sedemên siyasî yên mirovên ku dihên gunehbarkirin ku di îfadeyên dozê yên dirêj de tînin ziman jî, ji nedîtî ve dihên. Bi vî rengî di 10'ê Nîsan a 2008'an de, Dadgeha Federal a Bilind a Frankfurt'ê 3 sal û nîv cezayê girtîgehê li nûnerê partiyên kurd ên êdî li Tirkiye'yê hatin qedexekirin HADEP û DEHAP'ê Muzafer Ayata birrî. Ayata ji sala 2002'an ve li Almanya'yê dimîne, û li Tirkiye'yê 20 salan di girtîgehê de maye.

Di sala 2008'an de zextên li ser kurdan li Almanya û welatên din ên Ewrûpa'yê zêdetir bûn. Ev yek xwe dispêre lihevkirina 5'ê Kanûn a 2007'an a li Washington'ê. Hingî Serokê DYA'yê George W. Bush û Serokwezîrê Tirkiye'yê Recep Tayyip Erdoğan li ser stratejiyeke hevpar a şerê li dijî PKK'ê li hev kiribûn. DYA'yê soz da ku bi alîkariya hevgirên ewrûpî, binesaziya avabûnên sivîl ên tevgera rizgariya kurd ên li Ewrûpa'yê bike armanca êrîşan. Serşêwirmenda wezareta karê derve ya DYA'yê Shari Villarosa, li ser mijara şerê li dijî terorîzmê de di Adara 2010'an de da xuyakirin ku "bi israr zor li ewrûpiyan hat kirin da ku li dijî PKK'ê bikevin nava liv û tevgerê." (9) Bi vî rengî li ser zexta rayedarên DYA'yê êrîşên polêsan ên bi ser saziyên nêzî PKK'ê de û girtina siyasetvanên kurd li Fransa, Îtalya, Belçîka û Almanya'yê pêk hatin.

Di çarçoveya vê hevkariyê de ku DYA dide kirin, di Pûşbera 2008'an de wezîrê karên navxweyî yê Almanya'ya Federal Wolfgang Schäuble (CDU) xebatên Roj TV'yê li Almanya'yê qedexe kirin. Roj TV bi bernameyên xwe yên bi kurdî, tirkî, erebî û suryanî li Ewrûpa û Rojhilata Navîn digihîje bi milyonan mirov û ji bo gelek kurdên li Almanya'yê yekane çavkanî ye ku pê dikarin nûçeyan rasterast ji Kurdistan'ê bibihîsin. Di belgeya qedexekirinê de dihê gotin, kanala televizyonê li dijî "fikra bi hev re jiyana gelan e". Di heman belgeyê de wezareta karê navxweyî îddîa dike ku naveroka weşanê "pesindayîna şerê çekdarî li dijî Tirkiye'yê" û "sorkirina kulta ferdekî ku li dor serokê PKK'ê Abdullah Öcalan dihê hûnandin" e. Ji ber ku dewleta tirk bi awayekî "hişktir şerê li dijî gerîlayên PKK'ê bi rê ve dibe" – ya ku behsa wê dihê kirin, êrîşên hewayî ne ku huqûqa navneteweyî bin pê dikin û Tirkiye'yê li dijî hedefên li bakurê Iraqê pêk tîne –bi ya "berjewendiyên Komara Federal a Almanya'yê" diviyabû "kanala televizyonê ya PKK'ê were qedexekirin." (10) Dadgeha Îdarî ya li Leipzigê sedemên qedexeyê erêkirin, lê dadgehê qedexe di 26'ê Sibata 2010'an de betal kir. Wekî sedem jî hat gotin, ne zelal e ka gelo qedexekirina li Almanya'yê ya televizyoneke li Danîmarka'yê lîsansa weşanê stendiye bi hevpeyka ewrûpî re li hev bike yan na. Hefteyekê paşê yekîneyên rûnixumandî yên dijterorê yên belçîkî bi ser studyoyên kanalê yên li navçeya Belçîkayê Denderleeuwê de girtin. Li cihê weşanê bûn sedema zirareke bêhtirî milyonek euroyî û gelek xebatkarên wê girtin.

### Qedexeya li ser ROJ TV

Qedexekirina Roj TV'yê bû sedem ku yekîneyeke herêmî ya gerîlayên PKK'ê 8'ê Tîrmeha 2008'an 3 endamên Komeleya Çiyagerên Alpan a alman li ser çiyayê Agiriyê, li wargeha wan a 3 hezar û 200 metreyî bilind, werin girtin. Yekîneya gerîlayan ev daxwaz dikir: "Divê hukûmeta Merkel tevî hukûmeta tirk dev jê berde ku têkoşîna azadiyê ya gelê kurd qurbanî berjewendiyên aborî bike." (11) Deh rojan paşê çiyagerên ji Bavyera'yê hatin berdan. Her çawa be, yekîneya gerîlla ku xweser tevgeriya, zirar li doza kurd kir. Lewra koma partiya Die Linke beriya çend rojan pêşniyarek dabû parlamena federal û tê de dixwest ku "çareseriya aştiyane ya pirsgirêka kurd xurttir li navenda hevîdîtinên di barê endametiya Yekîtiya Ewrûpa'yê ya Tirkiye'yê were bicihkirin". Die Linke ev pêşniyara xwe paş ve kişand, lewra tê de her weha ev daxwaz jî hebû "derxistina rêxistinên kurd ji lîsteya rêxistinên krîmînel, bi taybetî jî ya PKK'ê" da ku "hukûmeta federal piştgiriyê bide aştiya herêmê". Serokê koma parlementoya federalî ya Die Linke, Bodo Ramelow, li ber fikra raya giştî yê çapemeniyê sor kirî, çû secdê û got "Em nikarin di demekê de ku rehîneyan digire, destekê bidin PKK'ê." (12)

### Zexta li dij penaber û koçberên kurd

Zextên li dijî kurdan ên ji sînoran wê de, di salên 80'yî û 90'î de ji bo hêdî hêdî jihevxistina mafên penaber û koçberan hatin bikaranîn. Hîna di dawiya salên 80'yî de dozgerê giştî yê federal Kurt Rebmann doza sînordarkirina mafê penaberiyê kir: "Divê endamên rêveber ên PKK'ê vê fêm bikin. [...] di vê çarçoveyê de divê mirov li ber çavan bigire û li ser bihizire ku siyaseta penaberiyê û biyaniyan a zêde merd û ne bi ya pêdiviyên me yên ewlekariyê, di demên dirêj ên pêş de, li dewleta me dikare veguhere hêmaneke seqemnegîriyê." (13) Ji hingî ve bi taybetî jî penaberên ji Tirkiye'yê li Almanya'yê bi îddîaya ku li Rojavayê Tirkiye'yê derfeta penaberiya ewle ya di nava welêt de heye, hema bêjin qet şansê qebûlkirina mafê wan ê penaberiyê nemaye. Di heman demê de jî bi pratîkeke gelekî hişk a dersînorkirinê re jî rû bi rû ne. Bi ser de jî pêkanîna betalkirina mafê penaberiyê ku Destgeha Koçberî û Penaberiyê ya Federal a li Nurnbergê (BAMF) li dijî mirovên ku penaberiya wan hatiye qebûl kirin, dihê. BAMF xwe dispêre raporeke li ser rewşê ya Wezareta Karên Derve û weha dibêje: "Di salên dawiyê de li Tirkiye'yê nemaze jî di dema hukûmeta AKP'ê de bi guhertinên qanûn û destûra bingehîn û tedbîrên din ên reforman, bi taybetî jî di mijara misogerkirina mafên mirovan de gelek pêşketin hene. Bi pirranî, çavdêr guhertineke mentalîteyê ya ku tevahiya civakê digire nav xwe, qebûl dikin." Dijberên dewleta tirk ên ku li Almanya'yê di nava "derdorên çepgirên radîkal" de xwedî cihekî mezin in, eger ew werin dersînorkirin, hingî "di rewşên taybet ên yeko yeko de tehlûke heye ku dewlet zextê li wan bike". (14) Ji ber vê yekê qaşo sedemên ku li pêşiya dersînorkirinê bibin asteng nîn in. Di wê demê de ku ev rapora rewşê dihate amadekirin, di dawiya Adara 2006'an de li gelek bajarên kurdan di dema bi şîddetê tepisandina xwepêşandanên mezin de polêsan bêhtirî 10 sivîlan bi guleyan qetil kirin û di nava van sivîlan de gelek zarok jî hebûn.

Di sala 2009'an de Hukûmeta Federal a Almanya'yê bi Sûriye'yê re peymanek li ser şûnveqebûlkirina penaberan mohr kir. Bi ya vê peymanê penaberên ku mafê wan ê rûniştinê li Almanya'yê ne misoger e, wê karibin werin dersînorkirin. Di vê çarçoveyê de li tevahiya Komara Federal 7 hezar mirov mexdûr bûn. Di nava wan de kurdên ku ne welatî (bênasname) ne jî hene. Her çend li Sûriye'yê bi awayekî sîstematîk zext li kurdan dihê kirin jî, ev peyman hat mohrkirin.

Kurdên ku li Komara Federal a Almanya'yê xwediyê mafê bêdem ê rûniştinê ne jî, tûşî cudageriyê dibin. Eger ji Tirkiye'yê bin û hîna ne welatiyê Almanya'yê bin, heta îro jî rayedarên fermî wekî ku tirk bin li wan dinihêrin û "kar û barê" wan bi rê ve dibin. Bi vî rengî rayedarên bajarê Berlîn'ê qebûl nekirin ku malbateke kurd di havîna 2009'an de navê helbestvanê kurd ê navdar Cigerxwîn li kurê xwe bike. Sedem jî ew e ku di vî navî de tîpên 'x' û 'w' hene û ev tîp di alfabeya tirkî de nîn in û li Tirkiye'yê qedexe ne. Gelek dezgeh û tedbîrên ji bo destekkirina entegrasyonê bi wê rastiyê nizanin ku kurd wekî duyemîn koma herî mezin a koçberan a li Almanya'yê ne, ji koçberên tirk cihê, û xwediyê pirsgirêkên entegrasyonê yên taybet in. Wekî mînak li Almanya'yê qebûlnekirina zimanê wan ê dayikê dibe sedema encamên pêhisîna zanîstî û dêrûnî û ev encam di demên pêş de bandoreke neerînî li pêkhatina kesayetiya zarokên kurd û li şensê wan ê perwerdehiyê dike.



*Kadir Akyol, "Kadir Kent I", 18 x 12 cm, 2009*

Di konferansa "Kurd li Almanya'yê – Dîrok, dema niha, perspektîfên ji bo wekheviyê" de ku Federasyona Komeleyên Kurd li Almanya'yê YEK-KOM'ê tevî saziyên penaber, aştî û mafê mirovan organîze kiribû, 150 beşdarên siyasetvan, zanyar û nûnerên yekîtî û komeleyan di 9'ê Îlona 2009'an de li parlemana Berlîn'ê biryar dan ku doza guhertina paradîgmaya siyaseta alman a beramberî kurdan bikin. Xala navendî ev e: "Wekî komeke xweser a penaberan qebûlkirina penaberên kurd û bi ya komên din ên penaberan yeknesakdîtina wan." Wekî din daxwazên ku dihên kirin wekî mînak dersa temamker a zimanê dayikê, betalkirina qedexekirina PKK'ê, rawestandina dersînorkirina penaberên kurd in. Beşdarên konferansê ji Komara Federal a Almanya'yê her weha xwestin ku ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd bi riyên aştiyane û demokratîk bi rolekî xurttir rabe.

Dema mirov siyaseta Tirkiye'yê û Rojhilata Navîn a Almanya'yê, ku ev 150 sal in bi seqemgîrî berdewam dike, li ber çavan bigire, nemaze daxwaza dawî weha xuya dike ku ne guncan e ku pêk were. Çawa ku di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de çarenûsa gelê Ermenî bi qurbanî hevalbendiya stratejîk a çekan a alman û tirkan hat kirin, îro jî çarenûsa gelê kurd di bin berjewendiyên jeopolîtîk û aborî yên emperyalîzma almanan ên li Rojhilata Navîn û Nêzîk re dihên bicihkirin. Ne bangên ji ber hestyariyên mirovahiyê, lê bi bûyerên darî çav ên mîna demokratîkbûyîneke rateqînî ya Tirkiye'yê, ku her weha mafê diyarkirina çarenûsa xwe yê Kurdan jî qebûl dike, dikare ji binî ve û bi awayekî esasî siyaseta kurd a Almanya'yê biguhere. Ev mînak vê yekê bi awayekî zelal nîşan dide: Salekê piştî ku rejîma Baas'ê ya li Iraqê hilweşiya, wezîrê karên navxweyî yê alman Otto Schilly di buhara 2004'an de di rapora Saziya Îstîxbarata Navxweyî ya Parastina Destûra Bingehîn de Yekîtî Niştimanî Kurdistan YNK û Partiya Demokrat a Kurdistan'ê PDK di nava rêxistinên "ji bo ewlekariyê tehlûke û hewldanên radîkal ên biyaniyan de" bi cih kiribûn. (15) Piştî salekê serokê YNK'ê Celal Talabanî wekî serokkomarê Iraqê hat hilbijartin û serokê PDK'ê Mesûd Barzanî jî bû serokê Herêma Kurdistana Iraqê (Herêma Başûrê Kurdistan'ê). Hukûmeta Federal a Almanya'yê mêvandariya vî siyasetmedarî kir ku hîna nû wekî "radîkal" hatibû binavkirin. Bi vî rengî, naxwe mirov dikare hêvî bike ku rojekê Abdullah Öcalan jî li Berlîn'ê wekî mêvanê dewletê were pêşwazîkirin. Lê belê guhertin divê ji hundir were, ji hêzên demokratîk ên li Tirkiye'yê û Bakurê Kurdistan'ê.

**Wergera ji almanî**
**Lokman Turgut**

*Ev nîvîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsandin.*

---

(1) Rosa Luxemburg, Gesammelte Werke (Berhemên wê yên komkirî), berg 4, Berlîn 1990, rûpel 83.

(2) Paul Rohrbach, Die Bagdad-Bahn – Vom deutschen Weg zur Weltgeltung (Riya hesinî ya Bexda'yê: Ji riya alman ber bi qebûlkirina ji aliyê cîhanê ve), Berlîn 1902, rûpel 16.

(3) Richard Albrecht: "Wer redet heute noch von der Vernichtung der Armenier? (Ma kî îro behsa tinekirina ermeniyan dike?" – Hitlers Geheimrede am 22.August 1939 (Axaftina bi dizî ya Hitler di 22'ê Tebaxa 1939'an de), Herzogenrath 2007.

(4) Die Welt, 5'ê Cotmeha 1981'ê.

(5) Eberhard Schultz, Zehn Jahre grenzüberschreitende Kurdenverfolgung (10 salan zextên li dijî kurdan ên wêdetirî sînoran), Köln 1998, rûpel 17

(6) Verbotsverfügung des Bundesinnenministers gegen die PKK, ERNK und kurdische Vereine vom 26.November 1993 (Fermana ji aliyê Wezareta Karê Hundir ve qedexekirina PKK, ERNK û komeleyên kurd a 26'ê Mijdara 1993'an), li gorî Bürgel ji ber girtî, Türkeipolitik (siyaseta der barê Tirkiyê de), 472.

(7) Hevdîtina bi Abdullah Öcalan re, Süddeutsche Zeitung 30/31'ê.Adara 1996'an.

(8) Hevdîtina bi Abdullah Öcalan re, Der Spiegel, hejmar 46, sala 1996'an.

(9) Todays Zaman 20'ê Adara 2010'an.

(10) Wezareta Karê Hundir, fermana qedexekirinê, Berlîn 13'ê.Hezîrana 2008'an.

(11) Junge Welt 15.9.2008.

(12) Spiegel-Online 16.7.2008.

(13) Schultz, Zehn Jahre (Deh sal), 17.

(14) Junge Welt 19.4.2006.

(15) Bundesministerium des Inneren: Verfassungsschutzbericht für das Jahr 2003 (Wezareta Karê Hundir: Rapora parastina destûra bingehîn a sala 2003'an), Berlîn 2004, rûpel 228.

NÎQAŞÊN LI SER MAFÊ MIROVAN

# Tirkiye perçeyeke Ewrûpa'yê ye?

DR. HASAN KAYGISIZ*

**Teza min a pêşî ev e:**

Komara ku 1923'an nû hatîbû damezrandin bû xwedî derfet ku sala 1963'an Peymana Enqere'yê bi Yekîtiya Ewrûpa ya Aborî (CEA) re mohr bike, lewra di dema şerê sar de ji ber sedemên jeostratejîk û jeopolîtîk, hêzên rojava nêzîkbûna Tirkiye ber bi Yekîtiya Sovyetan ve weke xeterekî didîtin.

Ji dema damezrandina komarê û vir ve projeya rojavayîbûna komarê ew e ku bibe parçeyek ji hevgirtina rojavayî û saziyên rojavayî. Întellektuelên Kemalîst hewl didin bi alîkariya navgînên sembolîk qebûlkirina çanda rojava ya nû li ser civakê ferz bikin. Helbestvanê tirk Orhan Veli bi vî rengî bal kişand ser vê rojavayîkirina lihevçêkirî: "Li welatên din demokrasî bi xwînê çêbû, li welatê me bi qanûnan li ser me tê ferzkirin." Ji awirên Tirkiye'yê ve endametiya YE'yê armanceke dev jê neyê berdan e, lewra damezrênerê dewletê general Atatürk ev armanc daniye ber wan. Ji ber vê yekê armanca endametiya YE'yê weke "siyaseta dewletê" tê dîtin. Lê belê gelek astengiyên ji ber siyaseta hundir hene ku Tirkiye'yê dûrî YE'yê digirin. Astenga pêşî arteş ye. Arteş li Tirkiye'yê ji serî ve dikare weke hêza di siyasetê de xwedî roleke sereke ye di vetokirinê de, were teşxîskirin. Beriya damezrandina komarê hê di dema Împeretoriya Osmaniyan de artêş weke elîta întellektuel di civakê de hêmanekî girîng ê pêşveçûna siyasî, civakî û çandî bû. Întellektuelên Kemalîst difikirîn ku întegrasyona rojavayî bi tenê eger civaka tirk weke şêwazên jiyana rojavayî were birêxistinkirin, dikare bi ser keve. Ev şêwazên jiyana rojavayî jî bi qanûnan hatin ferzkirin. Ango rojavayîbûn li Tirkiye'yê ne bi tevgereke çandî ji jêr ve bi gewde bû, lê ji jor ve bi zorê hat ferzkirin. Vê Kemalîzmê cih neda fikrê bingehî yê rojava ku dibêje dewlet û netewe xizmeta pêşketina ferd dikin û ne berevajiyê wê.

Tevî rojavayîbûna lihevçêkirî ya Tirkiye'yê jî, Serokê Komîsyona CEA'yê Walter Hallstein dema mohrkirina peymana Enqere'yê sala 1963'an ewrûpîbûna Tirkiye'yê bi van gotinan derdixist pêş: "Tirkiye parçeyekî Ewrûpa'yê ye" (Çavkanî: Steibach, Udo; Europa und die Türkei (Ewrûpa û Tirkiye) In: Weidenfeld, Werner (edîtor.): Europa-Handbuch. Bonn 1999, rûpel 681–690. Li vir rûpel 683). Li vir ez dixwazim bînim ziman ku artêşa tirk sê salan beriya hingî ango 1960'î bi darbeyeke eskerî dest danîbû ser desthilatdariya siyasî. Helwesta Hallstein nîşan dide ku darbeya eskerî norm û pîvanên ewrûpî binpê nekirine, lewra bi Peymana Enqere'yê diviyabû Tirkiye'yê bixin nava sîstema hevgirtinên rojavayê Ewrûpa'yê. Sala 1970'î protokola li peymanê zêdekirî ya ku wê Tirkiye û Ewrûpa nêzîktirî hev bikira hat mohrkirin. Çend mehan paşê dîsa eskeriyê darbe kir û desthilatdariya welêt girte destê xwe. 24 salan paşê roja 14'ê Nîsana 1987'an Hukûmeta Tirk serlêdana xwe ya duyem ji bo endametiya tam da YE'yê; tevî ku beriya 7 salan (1980) dîsa eskeriyê darbe kiribû û hatibû ser hukim. Tevî ku Tirkiye'yê di vî wextî de jî mafê mirovan û hindikahiyan gelekî zêde binpê kiribûn, vê yekê Yekîtiya Ewrûpa'yê aciz nedikir. Lîderê Cûntayê Kenan Evren di mîtîngekê de roja 3'ê Cotmeha 1984'an li Mûş'ê got: "Ma gelo em xayînan darvenekin û wan xwedî bikin?" li vir dixwazim bi bîr bixim ku Kenan Evren di serdana xwe ya yekemîn de ji aliyê Almanya'yê ve weke Serokkomarê Tirkiye'yê hat pêşwazîkirin. Wateya vê ew e ku cunta û rejîma darbeyê ji aliyê Almanya'yê ve rewa dihat dîtin û dihat qebûlkirin. Serlêdana 1987'an ne ji ber darbeya eskerî bi ser neket. Li vir ez tesbît dikim: Desthilatdariya artêşa tirk ji bo Yekitiya Ewrûpa (YE) nirx û pîvanê rojavayî nediêşandin, tevî ku piştî her darbeya leşkerî sazî û pîvanên demokratîk ji hev dihatin xistin û betalkirin, gelek mirov dihatin qetilkirin û rastî êşkencê jî dihatin. Pêşî em dikarin di warê dîrokî de vê tesbîtê bikin ku li rojava jî mafê mirovan bi xêra şer û berxwedanên demdirêj hatin bidestxistin. Ew bi ti awayî ji destpêkê ve parçeyê xweîfadekirina rojavayî yan jî rêûresma çandî ya ewrûpî nebûn, berevajî, bi pêvajoyên gelek zor û zehmet ên fêrbûnê, yên ku ji bo civaka tirk xerîb in, hino hino rûniştin. Binpêkirina mafê mirovan û hindikahiyan ji aliyê Yekitiya Ewrûpa ve weke karekî navxweyî yê Tirkiye'yê dihat dîtin, tevî ku Tirkiye hema hema endamê tevahiya rêxistinên siyasî û aborî yên hevgirtinên rojavayî bû jî. Sîstema siyasî ya nedemokratîk ya li Tirkiye'yê weke hêmanekî acizker nedihat dîtin, lewra têkiliyên di navbera YE û Tirkiye'yê de encama şerê sar ê di navbera bendên nîzamên kapîtalîst û komunîst de bûn. Ji ber vê yekê ewrûpiyan bi sedema şerê sar û berjewendiyên aborî demeke dirêj qîmet bi rastiyên tirk û pîvanê ewrûpî nedan û ew nedîtin. Bi vî awayî di vir de heta dawiya şerê sar cot-morala (cot-standardî) ewrûpî û bi nîv dilî weke pîvan qebûlkirina nirxên xwe bi xwe, derdikeve holê.

**Teza min a duyemîn ev e:**

Piştî şerê sar rola Tirkiye'yê ya bendbûna li hemberî 'xetera komunîst' nema. Belê zêde di ser re dem nebihurî û têkiliyên di navbera Tirkiye'yê û YE'yê de ji nû ve girîng bûn. Li cem DYE'yê, Ewrûpa jî di vê navberê de veguherî navendeke duyemîn a hêzê. Ji bo ku valahiya hêzê ya li rojhilatê Ewrûpa'yê dagire, YE'yê diviyabû stratejiyeke nû ya berferehbûnê bi pêş bixista. Bi vê yekê re ji bo bibe endamê bi temamî yê YE'yê şensekî nû yê Tirkiye'yê jî çêbû. Weke welatê ku rola wê ya pirekê ji bo veguhestina enerjiyê (gaza xwezayî, nift û hwd.) heye, girîngiya Tirkiye'yê van salên dawiyê zêde bû. Di vê çarçoveyê de divê îşaret pê were kirin ku dema YE'yê sala 1999'an statuya namzetê endametiyê da Tirkiye'yê, berjewendiyên xwe yên aborî û stratejîk derxistin pêş û qîmet bi întegrasyona siyasî neda. Weke encam kesên li Tirkiye'yê rê didan ber siyasetê wisa his kirin ku hatine piştrastkirin û bawer kirin ku karibin bi guhertinên herî kêm întegreyî sîstema siyasî ya YE'yê bibin. Ev helwesta elîta rêveber a tirk yek ji sedemên sereke ye ku nehişt di pêvajoya ewrûpayîbûnê de dînamîkên hundir ên Tirkiye'yê bi xwe pêş bikevin û xwe bi sazî bikin.

**Teza min a sisiyan ev e:**

Artêşa Tirkiye'yê ku dikare weke "hêza herî girîng a redkirinê (vetoyê)" were destnîşankirin, xwediyê pozîsyoneke hêzê ya mutleq e. Lewma têgihiştina li gorî rêûresmê ji serdema Osmaniyan (1326-1923) û vir ve weha difikire ku dewlet weke hêzeke xweser e û mirov nikare dest bidiyê. Ev dewlet ne mecbûr e xwe rewa bike. Tirkiye ji aliyê sûbayan ve hat damezrandin. Mustafa Kemal û hevalên wî ji artêşa osmanî ne. Ji pozîsyona xwe ya otorîter a hêzê, ji artêşa tirk hat ku formekî dewletê yê ne demokratîk belê di heman demê de berê xwe dayî rojava 'ji jor ve ferz bike' û biafirîne. Bi vê piştperdeyê mirov dikare rave bike ku eskerî xwe ne bi tenê weke misogerkarê ewlekariya derve dibîne û xwe her weha weke parêzvanê 'demokrasiya Tirkiye'yê', 'destûra wê ya bingehîn' û 'laîktiyê' dibîne. Wekî din eskerî weke erka xwe dibîne ku nobetdarê yekparebûna neteweya tirk û erdên dewleta wê ye. Û ji bo ku pozîsyona xwe ya hêzê biparêze, timî 'dijminên dewletê' yên hundir û/yan jî derve li hev tên çêkirin. Ji vê û wêde, êşkenceyê weke metodeke 'normal' a dewletê tê dîtin û mafên hindikahiyên dînî û etnîk weke dijminê dewletê tên nirxandin. Bi taybetî berê, welatî ji biryarên siyasî û aborî dûr hatin girtin. Mirov dikare bi vî awayî Tirkiye'yê weke 'demokrasiya qadan' bi nav bike: Qadek heye li welêt, em bi nav bikin eskerî ku doza hêza siyasî dike û her weha vê hêzê pêk tîne û di heman demê de xwe nade ber ku bi mekanîzmayên demokratîk were kontrolkirin. Biryara başbûn û xirabbûna tiştekî ji bo pêşketina dewletê, bi tenê ji aliyê eskeriyê vê dihat dayîn. Ev îro li pêşiya demokratîkbûyîna Tirkiye'yê astengiyeke mezin e. Pratîka vê yekê di civaka Tirkiye'yê de îro jî bi giştî tê qebûlkirin. Li aliyekî saziyên demokratîk bi awayê fermî hene, lê belê li gorî vê çandeke demokrasiyê nîne. Stratejiya sîstema serwer ew e ku dixwaze kakil û sîsika nîzama otorîter biparêze. Heta roja me ya îro, ji Tirkiye'yê nehat nîzameke civaka sivîl bi sazî bike. Yên desthilatdar biryara li ser radeya demokratîkbûyînê didin û bi tenê tesbît dikin ka çiqas demokrasî ji gel re divê. Bi ser de jî li Tirkiye'yê koalîsyoneke xwedî bandor û nefermî ya hêzên eskerî, hêzên polês, dadgerî, partiyên neteweperest, her weha partiya sosyal demokrat CHP'ê, rêxistina neyasayî ya "gurên boz" û hin beşên aboriyê ku xwe bi aboriya-veşartî û sergirtî ya berfereh fînanse dikin, heye ku bi tirkî jêre "derîn devlet" (dewleta kûr) tê gotin.

**Teza min çaran ev e:**

Saziyeke din a civakî ku ji bo pêvajoya ewrûpayîbûnê girîng e dînê Îslamê ye, ku hê di serdema osmaniyan de jî weke dînê dewletê xwediyê roleke navendî bû. Di Îslamê de ji hev cihêkirina dewlet û dîn nîne. Têkiliyeke ji nêz ve di navbera Îslam û binpêkirina mafê mirovan û mafê hindikahiyan de heye. Îslam weke dînekî şer pêk hat. Pêxemberê dînê Îslamê Muhamed ne bi tenê pêxemberek bû, ew her weha siyasetvanek bû ku dewlet bi rê ve dibir. Azadiya dîn di Îslamê de îro jî weke mafekî gerdûnî û nikare were parçekirin, nayê dîtin. Binpêkirina mafê mirovan li welatên misilman, bi vî awayî li Tirki-

* Doktorê siyasetnasiyê.

www.arsivakurdi.org



*Kadir Akyol, 120 x 180 cm*

ye'yê jî timî bi Îslamê tên ravekirin. Îslam wekî din jî li Tirkiye'yê weke hêmanê çanda neteweyî di konsepta neteweperestiya tirk de xwedî roleke girîng e. Netewe li Tirkiye'yê bi awayekî diyarker ji aliyê dîn ve reng girtiye. Nabe ku mirov vê yekê nebîne; Mustafa Kemal'ê laîk ji bo serxwebûna neteweyî banga cîhadê kir û paşê beriya ku 29'ê Cotmeha 1923'an weke serokkomarê pêşî were hilbijartin, li pêşiya parlemanê ev tawîz da: "Îslam di komarê de weke dînê dewletê dimîne." (ji vê pirtûkê hatiye girtin: Seufert, Günter; Kubaseck, Christopher; Die Türkei – Politik, Geschichte, Kultur (Tirkiye – Siyaset, Dîrok, Çand), berg 556, Schriftenreihe der Bundeszentrale für Politische Bildung (Rêza nivîsarên Navenda Federal aji bo Perwerdeya Siyasî) . Bonn, li vir rûpela 86). Piştî vê daxuyaniyê Atatürk bi yekdengî weke yekemîn serokkomarê Tirkiye'yê hat hilbijartin. Îro jî Îslama sunî di siyaseta hundir de weke amûreke desthilatdariyê xwediyê roleke girîng e.

Dewleta Tirk weke prensîb ne li dijî radîkalîzma dînî ye,bi tenê li dijî saziyên dînî ye ku ne di kontrola wê de ne. Biryara Kemalistan ew bû ku dîn bi awayekî radîkal bixin kontrola xwe, ango şoreşekê bikin. Lê belê laîktiya tirk serê pêşî ji bo rewakirina dewleta netewe, fikrekî siyasî ye. Rêveberiya dewletê diviyabû li gorî daxwazên Kemalistan ji parastin û muhafezekirina dîn jî berpirsiyar bûya. Ji ber vê çendê, Tirkiye bi tenê bi awayekî fermî (lihevçêkirî) dewleteke laîk e. Di rastiyê de Îslam saziyeke hêzê ya dewletî ye. Ango dîroka sekulerbûna tirk xwe nasipêre jihevcihêkirina siyaset û dîn, xwe disipêre kontrola dewletê û li ser navê mentiqê dewletê bikaranîna dîn. Ji ber vê rola nakok divê dîn weke astengiyeke li pêşiya endametiya Tirkiye'yê ya YE'yê were dîtin. Di nîqaşên li ser endametiya Tirkiye'yê ya YE'yê de li aliyekî tê îdîakirin ku Tirkiye dewleteke laîk e û dîn weke amûreke hêzê ne xwediyê ti rolê ye. Li aliyê din Îslam ji bo hedef û armancên cihê weke amûrekê tê bikaranîn da ku di nava sîstemê de doza hêzê were kirin.

**Teza min a pêncan jî ev e:**

Di dema şerê sar de YE'yê girîngiyeke mezin bi binpêkirina mafê mirovan û hindikahiyan nedabû. Ew weke karekî navxweyî yê dewleta netewe ya tirk hatin dîtin. Ji dema qebûlkirina pîvanên Kopenhag'ê û vir ve ango ji sala 1993'an û vir ve, mafên mirovan û hindikahiyan yek ji xalên navendî ye ku mirov li gorî wê biryara qebûlkirina endamênû yên YE'yê dide. Lê belê ku di mijara namzetê endametiyê Tirkiye'yê de pirsgirêkên mafên mirovan û hindikahiyan bi awayên cihê û hev nagirin, tên girtinî dest. Sedemeke vê yekê ew e ku YE dixwaze li gorî berjewendiyên aborî û siyaseta hêzê ya Ewrûpa'yê Tirkiye'yê li beramberî Asya ya Navîn û Rojhilata Nêzîk bi siyaseteke ewrûpî ve girêbide. Tirkiye pireke cografîk a di navbera Rojava û Rojhilat de ye. Dema mirov vê piştperdeyê li ber çavan bigire, dibe ku girîngiya pêvajoya demokratîkbûnê di siyaseta pêkhatî de ji ber vê talî be, tevî ku di nîqaşên li pêşberî raya giştî de timî tên tematîzekirin. Di sîstema desthilatdariyê ya tirk de her angajmana ji bo mafê mirovan û hindikahiyan bi tehlûkeya ji hev belavbûnê û parçebûna welêt re weke hev tê dîtin. Li gorî vê ewrûpayîbûna Tirkiye'yê li vê qadê jî rastî berxwedaneke mezin a siyaseta hundir tê. Xwediyên hêza siyasî yên li Tirkiye ya îro hewl didin sîstemeke demokratîk, yan bêyî guhertinan yan jî bi guhertinên herî hindik bi ser bixin. Guherandinên ji bo vê jî ji destpêka pêvajoya ewrûpayîbûnê ve ango ji 1999'an ve pêk tên. Para bêtir ev guhertinên qanûnî beriya civînên bilind ên Konseya Ewrûpa'yê hatin erêkirin. Bi ser de jî di reformên xwe li gorî Ewrûpa'yê guhertinê de heta niha ti sîstematîk xuya nake. Lewra ev guhertin ne bi baweriyeke ji dil, belê ji ber zexta zêde ya ji derve û hundir pêk tên. Li pişt vê nesîstematîkbûnê mentiqek heye û heta tê xwestin ev bi vî rengî be. Stratejiya sîstema desthilatdar ew e ku kakil û sîsika xwe ya otorîter biparêze. Ji ber vê piştperdeyê di analîzkirina pirsgirêkê de mirov neçar dimîne bifikire ku paketên reforman ji aliyê pirraniya burokratên dewletê û huqûzanan ve nayên qebûlkirin. Di pratîkê de pirraniya reforman yan hîç pêk nayên yan jî bi tevahî pêk nayên. Hukûmeta tirk der barê pêvajoya reforman (lîberalbûn) de daxuyaniyên nakok dide. Li aliyekî tê eşkerekirin ku paketên reforman wê bandoreke şoreşgerî li jiyana li Tirkiye'yê bikin, Tirkiye li gorî Kanûna 1999'an îro li dinyayê û fikr û şêweyên jiyanê vekirîtir e, ji xwe bawertir û azadtir e. Li aliyê din jî tê gotin, Tirkiye'yê ji destpêka damezrandina xwe ango sala 1923'an û vir ve timî nirxên mîna azadî, demokrasî û mafê mirovan qebûl kirine û parastine.

**Teza min a şeşan ev e:**

Pirsgirêka kurd di pêvajoya ewrûpayîbûnê de benda (astengiya) navendî ye – li her du aliyan jî ev bi vî rengî ye. Bi siyaseta hundir nikare were çareserkirin, lewra ew ji bo întegrasyona dewleta netewe bi kêr hatî ye û bi taybetî jî hêza dikare veto bike ango ya eskeriyê rewa dike. Ji bo YE'yê jî pirsgirêka kurd bi taybetî fonksiyonel e, lewma ew ji bo ku Tirkiye'yê ji xwe dûr bigire tê bikaranîn da ku xwe ji pirsgirêkên aborî, siyasî û çandî vedin, yên ku muhtemel e bi endametiya Tirkiye'yê ya di paşerojê de derkevin holê.

Bi kurtî mirov dikare bêje ku mafê mirovan û hindikahiyan ne parçeyekî çandî û siyasî yê Tirkiye'yê ne. Lewma jî zehmetiyên dewletê hene van dawerivîne hinavên xwe û bi sazî bike. Heta ku Tirkiye weke mînak qirkirina ermeniyan û mafên hindikahiyên etnîk û dînî qebûl neke, girêdana wê ya bi peymanên mafê mirovan ên navneteweyî ve, bêtesîr dimîne. Ji ber vê yekê jî Tirkiye nikare di rewşa niha de bibe endamê YE'yê. Pêşketin û guherînên paşerojê wê diyar bikin gelo mumkin e Tirkiye were demokratîkkirin. Li gorî fikra min Tirkiye bi tenê weke demokrasiyeke rastî û ji dil dikare bibe endamê YE'yê.

**Wergera ji tirkî**
**Sharo Î. Garîp**

*Ev nîvîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsandin.*

www.arsivakurd.org

EWRÛPA

# Bankayên lobîst li Bruksel'ê nobedarên demokrasiyê ne!

FRANÇOIS RUFFIN*

Parlementer di ber re derbas dibin, lê plaketa li erdê, her tim li şûna xwe ye, nalive. "Pirsgirêkên mezin bi rêya civînan, gotûbêjan û bi rêya dengdanê, bi sebr û aramî û bi fedakarî dikarin werin çareserkirin." Ev hevok di bin koka darekî de li ber deriyê Parlamento ya Ewrûpa'yê ya li Bruksel'ê li ser plaketekê hatiye kolan: "Di 6'ê Kanûn a 2001'ê de ji aliyê Seroka Parlementoya Ewrûpa'yê Nicole Fontaine ve hatiye vekirin." Li vê derê tiştekî din heye ku bala mirovan dikişîne. Ew jî ew e ku di navbera nivîs û îmzeyê de logoyekê cih digire: "SEAP. Society of European Affairs Professionnals. Incorporating felpa. Civata lobî û profesyonelên kar û barên Ewrûpa'yê."

Gelo mirov dikare heman tiştî li Paris'ê, li Roma'yê yan jî li Madrîd'ê bifikire? Wekî mînak; mîna ku li pêşiya parlementoya neteweyî ya li Fransa'yê, li binê Hemicycle'ê abîdeyeke (MADEF) Tevgera Şîrketên Fransî hatibe danîn? Yan jî tevgera "lobiyên ji bo nukleerê" di nava baxçeyê Luxemburg'ê de abîdeyek deyne ku pê sipasiyên xwe pêşkeşî senatoyê kiribin?

Saziya SEAP (Society of European Affairs Professionnals), di nava endamên wê de rêvebirên şîrketên wekî Unilever, Carrefour, Gaz de France, Volvo, L'Oreal, û yên Suez jî cih digirin. Hemû jî, yek ji yê din xêrxwaztir in! Bi ya malpera wê ya înternetê, navnîşana wê li –79 Boulevard Saint-Michel, Bruxelles – avahiyeke asayî ye. Li ber derî cihaza înterfonê dibêje: "Ji bo SEAP'ê pê li UNESDA bikin." Saziya ku dikare logoya xwe deyne pêşiya Parlementoyê, navê wê hîna jî li ser qutiyeke posteyê jî nîn e! Wî xwe sipartiye cem (Union of European Beverages Associations- Yekitiya Ewrûpa'yê ya Komeleyên Vexwarinê) ku saziyên wekî Coca-Cola, Danone, Nestlé, Unilever endamên wê yên bingehîn in.

Ji saziya Association Corporate Europe Observatory (1) (Komeleya Ewrûpa'yê ya Çavdêriyê ya Şîrketan) Olivier Hoedeman dibêje: "Ev sazî di sala 1997'an hat avakirin, di wan deman de li ser birêkûpêkkirina komên xebatê (lobbyes) jî gotûbêj hebûn. Di van nîqaşan de, ew alîgirê "xweseriya saziyan" bûn. Bi ya wan, sektora pîşeya wan wê prensîb û şertên xwe, bi xwe diyar bikirana, ew ji etîk û exlaqê kar berpirsiyar bûna. An ku ji bo çarçoveya karên wan ne hewce bû ku zagon bihatana derxistin. Wan statuko parast, û di armanca xwe de jî bi serketin. Ew îro bi tu awayî, ji şert û prensibên xwe re jî tu rêzê nagirin. Berî ku bikevin vê avahiyê û ji xwe re cihekî çêbikin, wan xwe wekî "lobîst" bi nav kiribû. Ji xwe di cîhana zanîngehan de, Parlementoya Ewrûpa'yê wekî saziya herî xerab dihê nasîn. Berî her tiştî ji ber ku di parlementoyê de çavên gel tune. Li vê derê gel tune. Tu mirov tune ku bikaribe bibêje ku: "Tu mafê we nîn e hûn weha tevgerin". Parlementer di valahiyê de mane. Ji hjilbijêrên xwe dûr in. Tu desteka ku karibin pişta xwe bidinê nema ye. Li vê derê komên "lobbyes'an dikevin dewrê û şûna gel tijî dikin.''



Kadir Akyol, "Kadir Kent II", 18 x 12 cm, 2009

Di dema seredana me de, serokê saziya SEAP'ê M. Yves de Lespinay ne li cihê xwe bû, lê dû re têlefonî me kir û li ser mijara plaketê weha axivî: "Di amadekarî û danîna vê plaketê de ne tenê em hebûn. Her tişt bi zelalî û eşkere pêk hatin. Xanim Nicole Fontaine jî li wê derê bû. M. Hans Gert Pöttering berê ku bibe serokê Parlementoyê li wê derê amade bû." Ev axaftin îspata berdewamiya dostaniyeke dilsoz e. Ji bo başiya her kesî: "komên 'lobbyistes' bûne wekilê demokrasiyê.

- Gelo ji wan hesap dihê pirsîn ka çima panoya sazgehên patronan heye, çima ya sendîkaya karkeran tune?

- Na, ji ber ku sendîka girêdayî berjewendiyên sektorekî ne. Lê yê me, em bi awayekî giştî li pey parastina pişeyekê ne."

An ku dixwaze bibêje, sendikavanên karên hesinî, yên xebatên postexanê, yên perwerdehiyê, yên rêyên hesinî tev ji gel dûr in, li pey berjewendiyên sektorekî ne, lê belê berjewendiyên Karsaz, nêzikî yê civakê ne?

"Bandora cîhana kar a li ser Yekîti'yê li ber çavan e?

- Ez weha dibînm, ku hûn rastiyê çewt fêm dikin."

Lê M. Jacques Delors, rastî pir baş fem kiriye. Serokê Komîsyona Ewrûpî yê sala 1993'an Delor dibêje "Rêvebirên ERT

* Rojnamevan, ji redaktorên rojnameya Fakir, Amiens.

www.arsivakurdi.org

(Maseya Grover a Karsazên Ewrûpî) her tim piştgirî dan nihêrînên min." Ji bo pêşxistina Ewrûpa'yê M. Delors bi cîhana Karsaz re bi navê Maseya Grover a Karsazên Ewrûpî hevkariyek saz kir, (European round table of industrialists, ERT), ku bi qasî 45 "rêvebirên endustrî" ji şîrketên wekî Total, Nestlé, Renault, Siemens û hwd. tê de cih digirin. Mîmarê yekane yê bazarê axaftinên xwe berdewam dike: "Tiştê ku min di sala 1984'an de kir, ew bû ku bikaribim bi hukûmetan re nuqteyên hevbeş peyda bikim û ji bo hevkariyê bi wan re bigihîjin lihevkirinekê. Ji ber ku piraniya wan, ji bilî nihêrîna bazareke mezin her fikrê red dikirin. Daxwaza cîhana Karsaz ya ji bo yekitiyê hukûmet jî anîn cem hev." (2) Bi vî awayî ev sosyalistê me rabû, di bin navê "pêşxistina Ewrûpa'yê de" "sendikayên Ewrûpî" yan jî "gelên ewrûpî" ji nedîtî ve hat û pişta xwe bi lobiya patronan ve girê da.

Plansazî hatibû amadekirin: Di Çile ya 1985'an de, serokê Maseya Grover a Karsazên Ewrûpî ERT (û yê Philips'ê), M. Wisse Dekker, bi navê "Ewrûpa 1990: Plansaziya xebatê " dokumanek weşand û tê de dihê pêşniyaz kirin ku li hember astengiyên bazirganî û tixûbên bacê tekoşîn were meşandin. Di Çile ya 1985'an de, M. Delors li Bruksel'ê dest bi wezîfeya xwe kir û li pêşberî Parlementoya Ewrûpa'yê nihêrîna xwe ya ji bo têkoşîna li hember astengiyên bazirganî û tuxûbên bacê anî ziman. (3) Baş bû ku PDG ji bo copyright'a (mafên telîfê) vê fikrê, hîna serî lê neda bû...

Beşa yekem ya xebatan pêk hatin, an ku pêngava pêşî bi serket, lê piştî şeş salan, ji bo destpêkirina pêngava duyemîn dîsa Maseya Grover a Karsazên Ewrûpî ERT hat bikaranîn. Jean-Marie Cavada di payîza 1991'an de, di bernameya xwe ya pedagojîk de da xuyakirin ku "Ewrûpa pir zû nameşe, ev proje gava sedsalê ye. Ev hesta giran ji aliyê pir kesan ve hatiye hîskirin, çil û pênc mezintirîn saziyên endustriyel ên Ewrûpa'yê ku xitabî aboriya sê milyon kesan temsîl dikin, îro di rewşeke alarmê de ne. Ew ji Ewrûpa'yê pir gavên nû hêvî dikin."

Rojnamevanê ku ji tevgera hemdem a demokrat bi armanca pêşxistina tevgera gel derbasî Yekîtiyê bû, bi awayekî objektîf weha dibêje: "Ev bername bi xebata çil û pênc saziyên Karsaz ên Ewrûpa'yê hat destpêkirin, ji wan sê berpirsiyar ev kes in: navê koma wan, 'maseya Grover a Ewrûpî ye. Jérôme Monod (serokê Lyonnaise des eaux), Pehr Gyllenhammar (Serokê Volvo, çawa ku hûn dizanin, hevkarê Renault, hevkarê Mitsubishi), û Umberto Agnelli (serokê koma mezin a Fiat'ê)." Bankakarek jî tev li vê komê hatiye kirin, – bê guman ji bo ku mêzîna rewşê sererast bike: "Bernard Esambert, serokê Bankaya la financière Rothschild." (4)

Di destpêka salên 1990'î de bloka rojhilat hilweşiya, pey re "gefa komunîst" jî nema. Ji xwe projeya Yekîtiya Ewrûpa'yê jî li hember vê gefê pêk hatibû. Li aliyê din, hedefên ku di sala 1986'an de ji aliyê Peymana Taybetî ve hatibûn diyarkirin, tev pêk hatin: Êdî dem hatibû, civîna bilind a serokdewletan a di bin navê "tevgera rizgariyê" de, di Kanûn'a 1991'î de li Maastricht'tê pêk hat. Bi vê firsendê, patron hewlê didin piyonên xwe derînin pêş. M. Jérôme Monod bernameyê îlan dike: ew wezîfeya "perwerdehiya pîşeyî" ku wekî rola xwe ya sereke dibînin, digire ser xwe. Avakirina "binesaziya ku ji seranserî Ewrûpa'yê derbas dibe" (çarçoveyê bixwînin). Pêkanîna "projeya pereyê yekgirtî, ji ber ku divê em pir zû pêş kevin, em nikarin biçin derve û her tim diwanzdeh pereyên cuda di bêrika xwe de bigerînin. Li Amerîka'yê binihêrin, dolarê wan heye, li Japonya'yê binihêrin, perê wan yê yen heye."

Dê vê "pêngava sedsalê" de ku bi hevalbendiya Bruksel'ê pêk hat, M. Delors weha dibêje: "Min îro rapora Maseya Grover a Karsazên Ewrûpî (ERT) xwend. Rêberên Karsaz bang li hukûmetan dikin ku bi awayekî lezgîn herin pêş. Ne karê min e ku ez berevajiyê vê nihêrînê biparêzim, ji ber ku pêdivaya me bi wan heye. Yan na emê nikaribin bi ya rîtma bûyeran tevbigerin (...) Divê bang li serokên diwanzdeh welatan û hukûmetan were kirin û divê zanibin ku di dawiya salê de, randevuyeke wan a girîng heye. Ewê tev bi hev re xetên bingehîn ên Ewrûpa'ya di sala 2000'an de diyar bikin. Divê bi tu awayî ev kar dereng nemîne. Di vê çarçovê de tenê dikarim bibêjim, ji ber ku dîrok bi çar gavan pêş dikeve, divê em jî lez bikin xwe bigihînin wê. Em di saetê de ji 602'î derbasî 100'î bûbûn, lê niha divê em di saetê de bi 140 pêşkevin." (5)

Piştî sê mehan, pêvajoya kontratê bi dawî dibe, Ji Maastricht'ê bigire heta Amsterdam'ê, ji stratejiya Lîzbon'ê bigire heta peymana destûra bingehîn, Ewrûpa bi lezeke "saetê bi 140km" bi pêş ket. Mirovê numeroya yekemîn ê Medef'ê û serokê niha yê Business Europe ku yek ji saziyên herî girîng ê patronan e, M. Ernest-Antoine Seillière kêfxweşiya xwe tîne ziman û dibêje: "Şertên Ewrûpa'yê ji bo faydeya welatê me roleke girîng lîst, me bi xêra van projeyan welatê xwe ber bi reforman de bir." Lê belê mirovê numeroya duyem a heman saziyê M. Denis Kessler jî dibêje: "Ewrûpa bûye wekî makîneyeke ku bêyî haya wê jê hebe Fransa diguherîne." Çawa ku M. Alain Madelin (6) jî soz dabû ev rewş "li hemberî sosyalîzmê sîgorta jiyanê ye." Ev rastî li ser mermer hatiye kolan. Ne tenê li pêşiya Parlementoyê, "Ewrûpayeke sosyal tu caran çênabe." (7)

**Wergera ji fransî**
**Bedran Dere**

---

(1) Bixwîne: Observatoire de l'Europe industrielle, Europe Inc. Comment les multinationales construisent l'Europe & l'économie mondiale, (Fira-netew çawa Ewrûpa'yê ava dikin, û ekonomiya cîhanî) Agone, Marseille, 2005.

(2) "Demain l'Europe" (Ewropa'ya sibê), Antenne 2, 7 tebax 1993.

(3) Europe Inc., op. cit., p. 61.

(4) Ew pişt re dibe Alîkarê Serokê Koma Bolloré, Şêwirmendê Çavdêriya Lagardère Group'e; rêvebirê şîrketên Saint-Gobain û Total, ew her weha dibe Endamê Koleja Komîsyona Tevgera Borsa'yê (COB) û Endamê Koleja Otorîteya Bazara Aborî (AMF).

(5) "La Marche du Siècle", (pêngava sedsalê) FR3, 18 îlon 1991.

(6) Ev her sê terîf û binavkirin ji van çavkaniyan hatin girtin: Europe 1, 27 Tebax 2003; La Tribune 4 Kanûn 2000; Le Monde, 23 Hezîran 1992.

(7) Sernivîsa berhema François Denord û Antoine Schwartz e ku ji weşanên Raisons d'agir derket. 2009.

(8) "La Marche du Siècle", (Pêngava Sedsalê) FR3, 18 Îlon 1991. Ev binavkirin ji vê bernameyê hat girtin.

(9) Cité dans Europe Inc., op. cit.

# Rakirina astengên fîzîkî

Diwanzdeh hezar kîlometre çêkirina rêyên otoban: Ev projeya Komîsyona Ewrûpa'yê ya sala 1991'an bû. Da ku mirov zanibe kê, çima pêkanîna vê projeyê dixwest, pêwîst nake mirov li dûr bigere, çend hefte beriya ragihandina projeyê, bersiva vê pirsê di ekranên televizyonan de bû.

Patronê Fiat'ê Giovanni Agnelli, digot: "Rêyên Ewrûpa'yê pir teng in, eger Ewrûpa xwe nû bike, wê di nava çend salên pêş de, hêjmara wesayîtan bibe du qat.'' (8) Di bernameya televîzyonê ya bi navê "pêngava sedsalê" de, Jean-Marie Cavada piştgirî dide nihêrîna wî û ji berhema bi navê Maseya Grover a Endustriyel ku nû hatiye weşandin, mînakekê dide: "Ji bo ku kamyonek di navbera Chicago-Houston de rêwîtiyê bike, an ku bi qasî 2000 kilometre, jê re 33 saet divê. Heman mesafe li parzemîna Ewrûpa'yê, an ku di navbera Anvers û Rome'ê de jê re du qat dem divê an ku bi qasî 57 saetan. Ev jî hemû rastiya me dide nîşandan." Ji bo ku em karibin rewşa xwe sererast bikin, divê di destpêkê de qanûn werin hêsankirin: "bilindkirina lîmîta ajotinê, dirêjkirina dema kar, bilindkirina lîmîta giraniya bar, serbestiya xebat û ajotina dawiya heftê... Zagonên di barê barkêşiya li Ewrûpa'yê de hem pir zêde ne, hem jî pir zehmet in."

Bersiva M. Jacques Delors dereng namîne: Bi awayekî zindî pêşniyazên xwe pêşkêş dike. "yek ji raporên destpêkê yên Maseya Grover di bin navê Missing Links (têkiliyên kêm) de hat weşandin. Bi ya raporê, eger em di nava parzemîna Ewrûpa'yê de, trafîka wesayîtan lezgîntir nekin û buhayê çûyîn û hatinê erzantir nekin, emê nikaribin ji bazara mezin a hundirîn sûdê werbigirin û kar bi dest bixin. Ji ber van sedeman, ji 1985'an vir ve em pêşniyazî Konseya Wezîran a Yekîtiyê dikin ku bernameyek ciddî û xwedî îddia ya binesaziya parzemînê amade bikin."

Rapora "Missing Links" (ji aliyê patronê Volvo ve hat weşandin) di sala 1985'an de derket. Balkêş e ku M. Delors jî "ji 1985'an vir ve ev bernameya bi îddîa " pêşniyaz dike. Bernameya La Marche du Siècle (pêngava sedsalê) di sala 1991'an de dest pê kir. Dîsa balkêş e ku M. Delors plana Trans Europe Network (TEN) ji sala 1991'an vir ve daye destpêkirin. Di vê plana bi navê TEN de, çêkirina 12.000 (diwanzdeh hezar) kilometre rêya otoban a ji bo kamyonên barkêşiyê cih digire...

Ev prîma asfalta bi qîr bi ya şertên peymana Maastricht'ê dihê sererastkirin û di sala 2004'an de dihê nûkirin. Di sala 1997'an de, sekreterê giştî yê ERT'ê kêfxweşiya xwe venaşêre û weha dibêje: "Niha êdî pirsgirêk maye li ser detayan. Ez bawer im di prensîb de, me li hev kiriye. Di binê derya Manche'ê de avakirina tunelê hat destpêkirin, Trenên xwedî vîtesa lezgîn niha li ber hilberînê ne. Rêya ku welatên Îskandinavya û Danîmarka'yê digihîne hev niha li ber avabûnê ye. (9)

Ew qas diwarên bêton bi kêrî çi hatin, ew tirs û fikar ji bo çi bûn? Bi bazareke bi tenê ya yekgirtî Ewrûpa'yê çeperên bazirganî, bac û bazara pereyên cihêreng yên di navbera welatan de rakir. Niha tenê maye çeper û astengiyên fîzîkî: Heta ku birin û anîna mal hem ji aliyê dem ve hem jî, ji aliyê pere û benzîn ve buha be, çi sûda "bazara mezin a hûndurîn" heye. Ji bo "sûd û kar were bidestxistin" divê çûn û hatina rêyan were hêsankirin da ku trafîk lezgîntir be û di nava ewlekariyê de bi pêş keve: wekî mînak di bin çiyayên Alpan de, di binê Pyrénées û derya Manche'ê de tunel werin vekirin. "Di bazara Ewrûpa'yê de divê mal û xizmet karibin bi hêsanî di nava ewlekariyê de û bi erzanî bigihîjin cihê xwe."

Di vê erdnîgariyaa vekirî û serbest de, parzemîna xwedî pir netew wê ekonomiya xwe bi pêş bixe. Karê afirandin û hilberînê ne tenê bi destê şîrketekê were berdewamkirin lê divê ev kar li her welatî bi pir kesan were kirin. Divê hilberîn ji rewşeke lokal derkeve û berfireh bibe, heta ku bigihîje "welatên ku lê heqdestê mirovan erzan e." Di sala 1989'an de, Whirlpool li Ewrûpa'ya rojava xwedî 38 kargehan bû. Niha di Ewrûpa'ya yekgirtî de tenê deh kargeh mane. Li Îtalya, Fansa, bi taybetî jî li Almanya'yê bi hezaran kes ji kar hatin avêtin...


Bandora li ser ekolojî û hawirdorê: Di navbera 1985 û 1995'an de, gaza karbonîk a ku ji aliyê wesayitên barkêşiyê ve hat derxistin, ji sê paran parekî zêde bû. Bi ya plana nû ya sala 2004'an, Komîsyona Ewrûpa'yê guman dike ku wê heta sala 2020'an, rêjeya karên transport û barkêşiyê du qat zêde bibe. Heta sala 2030'an, bandora gaza $CO_2$ a ku ji ber wesayîtên barkêşiyê derdikeve wê ji % 54 zêde bibe. Ji bo telafîkirina vê ziyana ekolojîk – çawa ku heman komîsyon pêşniyaz dike– divê em "ampûlên ekonomîk ên enerjiyê" bi kar bînin. Dema ku ji odê derdikevin jî wan vemirînin...

www.arsiv.kurdi.org

MÎNAKA NEW YORK'Ê

# Li dibistanan ewlekarî

CHASE MADAR*



*Kadir Akyol, "Metamorfoz II", 140 x 120 cm, 2007*

Bi 1,1 milyon xwendekarên xwe yên ku pirraniya wan ji çînên gel dihên, akademiya New York'ê yek ji akademiyên herî girîng ên Dewletên Yekgirtî ye. Di sala 1998'an de, pirsgirêkên bi heman rengî yên dijwar ên di barê perwerdehiyê de rû dabûn, îro wezîrê fransî yê Perwerdehiya neteweyî, Luc Chatel, komarparêz Rudolph Giuliani û her weha şeredarê bajêr xistiye nava tevgerekê, ji ber vê yekê ewlekariya dibistanên ku wek "yên dijwar" navdar bûne sparteyî hêza polêsên herêmî, Beşa Polês a New York'ê (NYPD) hatibû kirin. 4500 ajansên ewlekariya dibistanî ya bajêr ku personelên polês digihînin, êdî nema ne bi perwerdekaran û ne jî bi serôkên saziyan dişêwirin û rasterast serî li NYPD'ê didin. Ji bo xurtkirina îmaja zilamê bi zend û bend ê M. Giuliani û ji bo şûngirê wî M. Michael Bloomberg (bê etîket (1)) ku wî ve rê kiribû, veguhestina hêzên pergala peywirê bi awayek asayî ji sektora perwerdehê dihê peydakirin.

Otorîte bi rêk û pêk û bi dengekî berz bang dikin ku metoda wan a bi masûlke û serîlêdana alavên çavdêriyê yên teknolojîk di nava saziyên, ku bêhtir di nava rewşeke bi xeter de ne, derfeta daxistina rêjeya sûcdariyê dide bidestxistin. Lê ji bo lihevkirina van armancên diyarkirî kêm pispor bawerî bi van îstatîstîkên "perdaxkirî" tînin. Rapora teftîşa tevahî ya bajêr ku di sala 2007'an de pêk hatibû, li ber çavan raxistibû ku di nava temamî akademiyê de bi awayekî grîng bûyerên şîddetê di binê gumanan de derketibûn. (2) Ji bo hevdîtinên bi sendîkaya perwerdekaran, ya şefên saziyan û her weha bi ya Teamsters Local 237 re, ku şaxeke hêzdar a sendîkayî ye û ajansên ewlekariya dibistanan hildigire nava xwe, polês û beşa perwerdehiyê xwe nedan ber pejirandina erêkirinê.

Heger bandora wan a li ser daketina sûcdariyê wekî xwe bimana wê çaxê wan dê kêmtir destûr nedana pêkhatina pergala dîsîplînê ya nifşeke nû. Di derdora perwerdehiyê de, nobedarên kêm kalîfiye îmtiyazên lijneya hîndekariyê û yên şefên saziyan bin pê dikin û di qada dîsîplînê de dibin xwediyê otorîteya herî bilind. Ev jî dibe sedem ku bêserûberî û zirzopiyeke nedîtî derkeve holê. Her weha, di 17'ê mijdara 2006'an de nobedarekî destê du zarokên çar salî li qeydê xistibûn, ji ber ku ew zarok ji bo razana nîvrojê (3) nehatibûn rê; di 17'ê rêbendana 2008'an de, zarokekî pênc salî ji ber tevgera xwe ya xerab tûşî pêkanîneke bi heman awayî bûbû û ji bo "nirxandina" (4) rewşa psîkolojîk bi destê zorê

** Parêzerê dadgehên medenî û nivîskarê rapora bi navê "Safety With Dignity: Alternatives to Over-Policing in School" New York, Tîrmeh 2009.*

www.asokurdi.org

ew bûbûn nexweşxaneyeke psîkiyatriyê. Her weha, senator Eric Adams bi awayekî acizbûyî nihêrînên xwe anîbû ziman û weha gotibû: “Bêguman, kelemçeyên(destbend) hesinî ji bo zarokekî pênc salî ne tiştekî pêketî bû.” Û pê re vê pêşniyarê kiribû: “Kelemçeyên velkro bêne bikaranîn.”

Bi ya zagona di barê azadiya ragihandinê de, îstatîstîkên polêsê New York’ê, yên bi ya zagona di barê azadiya ragihandinê de hatibûn bidestxistin, diyar dikin ku di navbera salên 2005 û 2007’an de, 309 xwendekar bi sedema ku qedexeyê bin pê kirine, ketine ber lêpirsînê an jî hatine biçûkxistin (5). Her weha, di nava heman saziyan de xwendekar bêyî ku biçin qereqola polêsan, car bi car û demên kurt destên wan hatine kelemçekirin. Bi gotineke din, hin şêweyên tevgerê yên ku rêziknameyê karakterîze dikin berî wextan li ser hîma hewla cezakirinê hatibûn danîn, her weha gerek li nava bûroya serek-mamoste dikaribû bûbûya mijara cezakirinê ku niha êdî ev yek bi xwe hewcedarî bi teqîbata cezakirinê ne.

Lê belê, kesên ku di van demên dawîn de ketine ber curma erka ajansên ewlekariyê ne hew bi tenê şagirtên lîseyê û kolejê ne. Personelên dibistanê yên ku karê cezakirinê hilgirtine ser milê xwe darizandinên gelek hişk dikin an jî pirrî caran bi ya daxwaza dîl girtin jî pêk dihên. Ya herî xerab jî ev e. Di 9’ê cotmeha 2007’an de, xwendekareke serkeftî ya lîseya Manhattan’ê hatibû girtin, ji ber ku beriya saeta vebûnê wê xwestibû mamosteykî xwe bibîne hewl dabû ku derbasî hundir bibe; dema ku mudurê dibistanê xwe avêtibû nava bûyerê ew jî hatibû kelemçekirin û pê re hatibû binçavkirin. Girtinên nelirê yên şefên saziyan û yên mamosteyên ku xwestibûn şagirtên xwe li hember hêzên pergalê biparêzin, bi gelemperî bi servivîsên mezin veguhezîbûn ser rûpelên rojnameyan. Endamên bi kadro yên dibistanê, ji ber fikarên ku ew ê ji hêla birêveberiyên xwe ve xerab bêne dîtin an jî ji ber tirsa ku ew ê ji kar bêne qewirandin, dudilî dikin û şermezarkirinên xwe bi awayekî eşkere naynin ziman. Lê digel vê tiştê taybet jî ev e ku gelek ji wan, ji erk û peywirên ajansên ewlekariyê bi gazin in û bi ya xwendekarên xwe wan di radeyeke gelek kevnar de dibînin. Bi ya Nûnerê şefên sendîkaya saziyên New York’ê, M. Ernes Logana girtinên perwerdekaran bi tenê “parçeyê berbiçav ê çiyayê qeşayê (iceberg)” pêk tîne. Bûyerên bi vî rengî di qada dibistanê de, li ser mijara ravekirinê sûcê pirsekê derdixe holê. Bêguman xistina hundir a çekên bi agir û ya kêran di warê cezakirinê de cezayek hişk heq dike. Lê M. Logan weha diyar dike: “Gelo heman standart dikarin li ser kesekî mezin ê li kolanan û li ser zarokek donzdeh salî yê di nava hewşa dibistanê de bê pêkanîn. Heger Johnny li Joey bide û bêvila wî birîn bike ma divê biçe girtîgehê? Ez ne bawer im ku divê wisa be.” Her weha, nobedarên ciwan ên ku bi lez û bez dihên perwerdekirin, dema ku bi bûyerekê re rû bi rû dibin bi tenê yek helwestekê, ku nas dikin, didin diyar kirin: Hesta sûcdariyê. Civaknas Jeffrey Sprague’ê ku li zanîngeha Oregonê di warê dîsîplîna dibistanê de pispor e, bandorên pirsgirêka ewlekariyê bi tevahî weha tîne ziman: “Dema ku polês dikeve nava dibistanê rêjeya sûcê sê qat zêdetir dibe.” Pirrî caran, alozî li derdora benda ewlekariyê, ya ku li ber devê deriyê dibistanan hatiye avakirin, derdikeve holê. Sembolên wek kovboyan an jî yên navgînên bi tebane (silîndîr) ku nasnameya Amerîkî didin diyarkirin derdikevin holê ku ev rewş bêhtir di nava banliyoyên dewlemend de û li taxên ku jiyana bajarî lê bilindtir e derdikeve holê. Beşa perwrdehiyê vê nakokiyê bi karaktera neqandî ya ekîpmanan ve girê dide û bi vî awayî rewşê baş dide diyarkirin. Şefên saziyan ên ku naxwazin bi kar û barên darizandinê dakevin û serê xwe pê re biêşînin, hinek jî ji bona xwe, serî li ber çewisandinên hişk ên hiyerarşiya xwe datînin, bi heman rengî sazî jî naxwaze pirsgirêkên taybet pêş çavan bike. M. M. Giulani û Bloomberg weha îddîa dikin: Di encama ravekirinên medyatîk û hilbijartinî de dahênandin û helwesta bedenî ya hişkbûnê dibe ku karekî bêhtir kêrhatî be û hê kêmtir encamên vê yekê derbasî nava cîhana rastîn bike. Ligel vê yekê, M. Felice Lepore ku mudurê lîseyek xebatên sporê ya Bronx’ê ye, vê nirxandinê dike ku “Dedektorên hesinî hesteke sexte ya ewlekariyê didin. Heger kesek bixwaze tiştekî derbasî nava avahiyê bike her tim dikare vî tiştî pêk bîne. Û gelo em çi mesajê didin xwendekarên xwe dema ku em ji wan dixwazin ku ji bo çûyîna dibistanê bila ew li hember kontrolên bi vî rengî îtaatkar bin ? Gelek hevalên min li ser vî tiştî li hev du dikin: Ev yek pê re wê bibe sedema pêkhatina rewşeke aloz. (6) Ew bi zanebûn dipeyive: berî ku dest bi karê mamostetiyê bike, wî di nava teşkîlata polêsan a Dewletê, ya New Jerseyê û New York’ê de xizmetê dikir. Di 28 adara 2008’an de, li Brooklynê, dema ku xwendekarekî Lîseya Paul Robson, bi tevî ku kontrol pêk hatibû jî, di nava hewşa dibistana xwe de hatibû kêrkirin, a wê çaxê bêkêriya van dedektoran hatibû peyitandin.

> Bi ya zagona di barê azadiya ragihandinê de, îstatîstîkên polêsê New York’ê, yên bi ya zagona di barê azadiya ragihandinê de hatibûn bidestxistin, diyar dikin ku di navbera salên 2005 û 2007’an de, 309 xwendekar bi sedema ku qedexeyê bin pê kirine, ketine ber lêpirsînê an jî hatine biçûkxistin.

Di sala 1999’an de (7), di Lîseya Kolombiya’yê de tevkujiyek pêk hatibû û wê demê 15 xwendekar hatibûn kuştin û bi dehan jî birîndar bûbûn, lê belê heta roja îro jî li wê derê benda ewlekariyê nehatiye avakirin. Littleton di nava Coloradoyê de banliyoyek e ku dikare teknolojiyên pêşketîtir bi kar bîne. Lê dê û bavên xwendekaran, ku pirrî wan ji çînên dewlemend dihên, tew nafikirin bê ka zarokên wan ên ku sûc dikin çawa û bi çi awayî dihên tewanbarkirin û her weha ev yek jî dibe sedema hewesdarbûna xeşîmiyê an jî têkoşîna li hember şîddetê. Gelek dê û bavên Newyorkî vê baweriyê par ve dikin: ji bilî reşik û îspanyolên ku ji nav çînên gel dihên, ew ne xwediyê manîvelayeke siyasî ne û ne jî wek wan xwediyê hêza rûmetê ne, wê çaxê divê ew li ber pergala ku bi wan hatiye empozekirin serî bitewînin. Li ser şeş dibistanên ku di nava herêmên “bihîstiyar/hesas” de hatine avakirin, dema ku metodên “alternatîf” dihên pêkanîn, di navbera derdorên xebatkar û dibistanên taxên dewlemend de cudahiyeke gelek kêm dihê dîtin. Akademiya New York’ê, di barê vê cûdahiya kêm a di navbera wan û taxên ku ji reşik û îspanyolan de bêhtir bi erênî difikire. Di barê kêmkirina şîddeta di dibistanan de hin stratejî hene ku ev stratejî xwe dane peyitandin. Rapora bi navê “Ewlekariyeke bi rûmet” ku di sala 2009’an de ji hêla komeke komeleyên serbixwe ve hatibû weşandin xwe dispêre agahî/daneyên fermî û ev dane ji derdorên nêzîk ên akademiya New York’ê (8) hatine berhevkirin. Ev agahî vê yekê rave dikin ku şeş lîseyên bajêr ên li şeş taxên gelêrî, ku jiyanên cihêreng ên dîsiplîna bajêr û aloziyên biçûk pejirandibûn, ji sûcên saziyên ku li heman derdorê û di bin berpirsiyariya hêza polês de hatine avakirin, bi rêjeyên kêmtir sûcdarî tomar dikin. Mamosteyê lîseyeke gelêrî ya bi navê Bushwick Community High School a li Brooklynê, M. Tabari Bomani weha dibêje: “Heger hûn naxwazin ku xwendekar wek sûcdaran tevbigerin wê çaxê bi çavê sûcdarekî li wan nenihêrin.” Heger mala ku ajansên ewlekariyê pê ve girêdayî di warê pêkanîna ewlekariya saziyan de kêm bimîne, wê çaxê di nava van dibistanan de ku wekî model xuya dibin karê dîsîplînê di nava çarçoveya peywirên ekîbeke perwerdekar; her weha di nava çarçoveya peywirên şef û çavdêrên saziyê de dimîne. Her çi qas tevkariya/xwe tevlêkirina xwendekaran bi sînor be jî bi qasî radeya xwe daxuyaniyên di barê pergala hundurîn de bi hev re par ve dike, û tevgerên ku din ava dibistanê de wek qusûr hatine erêkirin bi tu awayî nikare bibe sedema darizandinê an jî lêpirsîna dadgehî. Di heman demê de, dîsîplîna xwe bi xwe (otodîsiplîn) cesaretê dide mirov û exlaqê rêzgirtina rû bi rû ye ku di jiyana rojane de dikeve pratîkê û ev exlaq di her civîn û ligelhevbûnê de bi zanebûn dihê dêlindêzkirin. Xwendekarên vê dibistanê yên ku ji heman derdorê dihên di nava saziyek ku di bin çavdêriya polêsan de ye dihên perwerdekirin. Ew zarokên malbatên ku li ber kerta xizaniyê ne, van malbatên ku bi giranî koçber in, nizanin bi îngilîzî bipeyivin. Bi tevî vê yekê jî ev sazî ji yên din bêhtir û baştir encamên akademîk bi dest dixin û di van saziyan de, di pêvajoya perwerdehiyê de terikandinên dibistanê hîna kêmtir in. Lê digel vê yekê, ceribandina ewlekariya dibistanî ya polêsîye, ya bi karê Newyorkî dikare bi dawî bibe. Di panzdeh salên dawîn de, daketina rêjeya sûcdariyê, qîmeta sekna şanoyî ya “hişkbûnê” ku ji bo vê qadê pêwist e, kêm kir. Nûnerên polîtîk naxwazin bibin hevkarê dîmena zarokek pênc salî ku ji alî polêsan ve dihê kelemçekirin û birin. Her weha, beşa perwerdehiyê ku ji rexneyên hemû kes dizane re guhên xwe girtiye, wisa xuya dike ku hîna ne amadeyî tu hewldanekê ye, lê derdorên bihestiyar û rêxistinên çalakger di nava tevgerê de ne û derdorên çapemeniyê jî ji vê mijarê haydar in. Bi awayekî dijraber, bisînorkirina budçeya vê peywirdarkirina gelemperî ya ku di çarçoveya qeyrana aborî de dihê bacdarîkirin, dikaribû ji bo ewlekariya dibistanê bûbûya çareseriya herî baş a reformeke alternatîf. Lê bi rastî, nêzîktêdayînên hê mirovanetir ên di barê pirsgirêkê de, bi tenê beşek qels ji maliyeta ku ji bo qiyametek ajansên ewlekariyê, bendên ewlekariyê, lêçûnên darizandinê, tezmînata ku ji bo xwendekar û perwerdekarên bi neheqî dihên girtin, dihê veqetandin pêwist dibîne û hew. Digel vê yekê, di nava saziyan de têkoşîna perwerdekaran û yekîtiya dibistanê ya ji bo zevtkirina kontrola dîsîplînê bi ser neket û ji bo vêya hîna pêwistî bi salên dûvdirêj heye. Her weha, hin pêşniyarên şermok jî dihên kirin ku ji bo ewlekariya dibistanan, di binê çavdêriya merciyeke ji polês û hemwelatiyan pêkhatî de (Civilan Complaint Review Board) ku ev belgeyeke mirî ye, 4500 ajans bêne bicihkirin. Hemû tişt li ber çavan diyar e: Heger hûn riya ketina nava dibistanê bidin polêsan careke din derxistina wî ya ji wê derê gelek dijwar e. Rêbazek wek rêbaza New York’ê ku berî wextan bi awayekî vekirî hatibû ceribandin, gelo otorîteyên fransî jî dixwazin biceribînin?

**Wergera ji fransî**
**Rıfat Arya**

---

(1) Pêşî endamê Partiya Demokrat bû, vê keyserê ragihandina fînansê û aboriyê di sala 2001’de tevlî Partiya komarger bû û rengên hilbijartina şaredariya New York’ê diyar kir. Di sala 2007’an de wî bêalîbûna xwe da diyarkirin.

(2) Richard Steier, “Backs Thompson’s Finding:Union. Schools Hide Extent of Violence.”, TeheChif-leader.com, 29 Îlon 20027.

(3) ”Public Enemy N0 1”, New York Daily News, 10 Adar 2008.

(4) “Cuffed kid troubles Scools Chancellor”, New York Daily News, 26 Rêbendan 2008.

(5) ”300 Student Busts were illegal, NYCLU tells Police Commissioner Ray Kelly”, New York Daily News, 8 Cotmeh 2008

(6) Coach helps save stabbed student” New York Daily News, 29 Adar 2008.

(7) Ev tevkujî mijara dokumentera Michael Moore ye “Bowling for Colombine” di sala 2002’an de derket.

(8) Annenberg Instute for School Reform “Safety With Dignity:Alternatives to Over-Policing Schools, New York, Tîrmeh 2009.

KOLEJÊN CIVAKÎ

# Di perwerdehiyê de hêviyeke nû

DOMINIQUE GODRÈCHE*

Xanim Jill Biden, hemjîna Alîkarê Serokê Amerîka'yê Joseph R.biden, di dema serdana xwe ya Paris'ê ya 5'ê Tîrmeha 2009'an de, da xuya kirin ku dibistana community colleges (kolejên civakî) "çareseriya pêşerojê ye" ji bo welatê wê.

Di roja 14'ê heman mehê de, Serok Obama –piştî bêdengiyeke salan- cara yekem li ser vê mijarê ket nava hewldanan û girîngî da pêşxistina kalîteya dibistanên bilind ên li welêt da ku rêjeya xwendevanên xwedî diploma, yên li Amerîka ya Yekgirtî, di qada navneteweyî de bilind bike.

Plan û projeyeke xwedî budçeyeke dora 12 milyar dolarî hatiye amadekirin. Divê ji sala 2020'an û şûn ve, salê herî kêm pênc milyon xwendevan dîploma bi dest bixin. Weqif û saziyên wekî Gates, Lumina, Kellog û Ford ragihandin ku ewê jî piştgirî bidin vê projeya pêşxistina kolejan…

Serok û rêvebirên Amerîka'yê ji ber kîjan sedeman ji nişkan ve ketin nava van hewldanan? Ji ber ku, ji xwe, ev salek e bi hejmareke mezin xwendevan xwe qeydî dibistanan dikin.

Eger sedemeke din a nediyar tune be, çima bi taybetî jî di van demên krîza aborî de projeyeke bi vî rengî dihê amadekirin? Dibistanên community colleges ku deriyên wan ji herkesî re vekirî ne, an ku ji her tebeqeya civakê û ji her temenî mirov dikarin tê de perwerde bibin, li Amerîka ya Yekgirtî wekî alternatîfa perwerdehiya zanîngehan dihê qebûlkirin. Mufredata kolejan a li ser du salan, xwendevanan digihîne asteke weha ku bibikaribin dereceya lîsansê bi destbixin. –ev derece, di şertên normal de, ancax piştî du sal xwendina zanîngehê dikare were bidestxistin-. Perwedehiya li van kolejan her weha derfetê dide ciwanên, ku dibistanên qels û şûndemayî xwendine, da ku bibikaribin ji perwedehiya bilind sûdê werbigirin. Ev derfet bi taybetî jî ji bo wan xwendevanan çareseriyeke baş e ku ji ber sedemên cihêreng nikarin çar sal xwendina xwe ya li zanîngehên taybetî fînanse bikin. Di van kolejan de pewerdehiyeke profesyonel ya xwedî sertifika, dihê dayîn. Ciwanên ji tebeqeya xizan û yên penaber ku ji perwedehiya asayî bêpar dimînin, bi rêya van dibistanan dikarin xwe bigihînin perwedehiyeke cihêreng û dewlemend. Ji bo ciwanên ku di perwedehiya xwe ya asayî de bi serneketine lê dîsa jî dixwazin di civakê de bibin xwedî pîşe, ev kolej roleke sereke dilîze.

Koleja Santa Fe (Meksîka ya Nû), ku di sala 1982'an de hatiye damezrandin, ji bo mijarên behsa wan dihê kirin, mînakeke tîpîk e. Di vê kolejê de bernameyeke perwerdehiyê ya pir alî heye: ji huqûqê bigire heta sînemayê, ji agahiyên li ser tendurustiyê bigire heta teknolojiya nûjen, li ser pir mijaran perwerdehî dihê dayîn...

Bi vî awayî, xwendevanekî/e beşa psîkolojiyê wê her weha bikaribe di van kolejan de dersên li ser ekonomî û yên li ser dad û edaleta kiriminel jî bişopîne. Dekanê fakulteya psikolojiyê û hunerên lîberal (Psychology and Liberal Art Studies) Bruno Bornet bi bîr dixe ku îro beşeke ji girseya gel ji sîstema pewerdehiyê bêpar maye û di wê baweriyê de ye ku "ev dibistan şansekî yeksan dide her beşa civakê da ku ji xwendina bilind para xwe bigirin, ev jî bi xwe re civakeke demokratîk derdixe holê." Santa Fe, bajarê hunerê, mirovên ji pîşeyên cihêreng ber bi xwe ve dikişîne: Hunermend, peykervan û galerîst wekî profesor an jî wekî xwendevan serî li koleja bajêr didin.

Dekanê Fakulteya Hunerê Douglas Barkey behsa girîngiya mufredat û naveroka dersan dike û dibêje: "Her nîv salekê, di somestirekê de em bi qasî sê hezar xwendevanan perwerde dikin, salên wan kêm zêde dora 40'î de ne û piraniya wan yan lîse qedandiye yan jî di gelek beşan de hunermend in. Profesorê kolejê divê master kiribe, yan jî herî kêm xwedî tecrûbeyeke pişeyî ya bîst salan be: asta mamoste û profesorên me ji yên zanîngehê ne kêmtir e."

Armanca rêvebirên dibistanê ew e ku van kolejên civakî bi ya rewşa aborî ya herêmê bi rêk û pêk bikin û bi asta kalîteya dersan bikaribin bersiv bidin pêwîstiyên perwerdehî û daxwazên nû yên civakê. Berdewamiya daîmî ya dersan û cihêrengiya xwendekaran hem asta dersan dewlementir dike hem jî rêvebir û mamosteyên dibistanê ji hêla pîşeyî ve motîve dike. Koleja Santa Fe deriyên xwe ji kesên teqawit re jî vedike. Ji herêm û dewletên derdorê, kesên ku dixwazin bi civaka amerîkiyên espanyolî re têkiliyeke dostane dînin di van kolajan de espanyolî hîn dibin. Rûniştvanên nû yên herêmê, wekî xanim Kathleen, ku dersên îspanyolî dişopîne, dibêje, 'ji bo ku bikaribin navên kolanan fêm bikim û ji hev derînin û her weha ji bo ku bikaribin bi hevalbendên xwe yên amerikiyên esapanyolî re biaxivin, ez diçim dersên espanyolî". Ji bilî mezinan, zarok û ciwan jî van dersan dişopînin. Félix Lopez, peykervanê hunera 'santos' (peykerên kevneşopiya civaka herêmî ku îro bi espanyolî diaxivin) ku li koleja civakî dersan dide weha dibêje: "li cem me, dema ku kesek dizewice, wekî kevneşopî dixwaze hunera peykervaniyê fêr bibe, ji ber ku piraniya kesan dixwazin di avahiyên kevnare yên kevneşopî de bijîn, lewma jî dihên dersên me dişopînin. Çand û kultura me, li van kolejan dihê berdewamkirin. Di pola min de, şanzdeh xwendevan hene, ku temenên wan di navbera 20 û 70 an de diguhere. Hinek ji wan, ji derdorê, hinekên wan jî, ji welatên biyanî hatine. (1)"

Serokê şaredariya Santa Fe Davis Coss girîngî dide perwedehiya koçberên li bajarê xwe, statuya wan çi dibe bila bibe. Cross dibêje: "hin dewlet îddîa dikin ku perwedehiya zarokên koçberan bi taybetî jî yên ku bêfermî dijîn, li ser wan gelek buha dibe mal. Meksika-nû ku yek ji dewletên herî xizan e, em di wê baweriyê de ne ku dema mirov zarokan perwerde neke, li aboriya bajêr buhatir dibe mal. Santa Fe her tim bûye bajarê stargeha penaber û koçberan ji ber ku ew dikarin bi hêsanî li wê derê mafê xebat û perwerdehiyê bi dest bixin." Ji profesorên kolejê Andrew Lovatto, ku ev bîst sal in li dibistanê kar dike, dibêje gelek normal e ku 'koleja civakî' ew qas bi navûdeng bûye û balê dikişîne ser vê mijarê: "Di vê demê de gelek kargeh deriyên xwe digirin, mirov ji kar dihên avêtin û rêjeya betalan bilind bûye. Çareya bi tenê ew e ku divê mirov pîşeyeke duyem fêr bibe. Em vê derfet û îmkanê dixin xizmeta gel. Hêza kolejan ji vê perwedehiya domdar dihê."

Dewleta federal jî rol daye vê kolejê da ku di qada herêmî de, bibe navgîna pêşxistina aboriyê û di qada navneteweyî de jî, ji bo dewletên xizan, bibe mînakeke baş. Seroka koleja Santa Fe Xanim Sheila Ortega dibêje: "li zanîngehê, mirov yan avjeniyê fêr dibe, yan jî noqî binê avê dibe. Lê di kolejan de, ji bo serkeftina xwendekaran çi ji destê me dihê, em dikin. Kalîteya perwedehiya me ji ya zaningehê bilindtir e, ji ber ku di poleke wan de carnan hejmara xwendekaran ji sê sed kesî derbaz dibin. Ji bo kesên temen bilind, û ji bo kesên ku ji debara malabata xwe berpirsiyar in û neçar in kar bikin, kolej hêviyeke mezin e. Ez bi zimanekî vekirî bibêjim: divê ji van kolejan re pere were xistin, ne ji zanînghan re."

Ji salekê û vir ve, ji ber krîza aborî, hejmareke mezin kes hewlê didin di van kolejan de qeyda xwe çêbikin. Rêjeya serlêdana ji bo koleja Sana Fe, ji % 12 zêde bûye. Di demeke weha de, dewlet krediya ku ji bo saziyên perwerdehiyê veqetandibû kêm kir: Wekî mînak, li Vîrjînya bakur, di nava çar salan de, rêjeya budçeya ji bo perwerdehiyê ji % 60 daket ji % 45 an. Lê belê bi ya raporên salane hejmara xwendevanên koleja Northern Virginia Community College (Koleja Gelî ya Vîrjînya ya Bakur) tenê di salekê de ji % 10 zêdetir bûbû. Ji ber van sedeman, kolej bi pirsgirêkên ciddî yên aborî re rû bi rû mane. Ji ber ku budçeya kolejan girêdayî rêjeya baca bajêr e. Xanim Ortego li ser pirsgirêka aboriya dibistanê weha dibêje: "Ji ber derfetên kêm ên aboriyê, ji ber ku em nikarin profesorên nû bigirin kar, em neçar in qeydên deqa dawî red bikin. Li dewletên din, wekî mînak li Kalîforniya'yê rewş xerabtir e. Wekî tedbîra li hember vê rewşê, gelek kolej, di rêya xwendina bilind de, hejmara dersên xwe zêde dikin. Bi ya American Association of Community Colleges (Komeleya Kolejên Gelî yên Amerîka'yê), bi qasî nivê xwendevanên ku xwe amadeyê lîsansê dikin, neçar in dersên xwe li malên xwe bixebitin. Piraniya van xwendekaran ji amerikiyên afrikî û ji amerikiyên espanyolî pêk dihê, ew jî dîsa piranî jin in.

Ji aliyê din ve, perwedehiya azad çi qas pêş keve, aboriya wê jî pê re paralel mezin dibe. Bi ya lêkolînên salên 2009 û 2010'an ên saziya National Association of Independent Colleges (Komeleya Neteweyî ya Kolejên Serbixwe), li seranserî welêt, eleqeya ji bo kolejan zêde bûye ev jî bi xwe re çavkaniya aborî ya van dibistanan ji % 9.2 dewlementir kiriye (2).

Li zanîngehên taybet, rewş cuda ye, ew neçar mane qeyda gelek xwendekaran qebûl nekin, bi ya heman anketa li jor, rêjeya xwendekarên nû, di destpêka sala 2009'an de, tenê ji sedî 4,2 zêde bûye. Ji sî û heft salan vir ve ev rêjeya herî li jêr e. Perwedehiya li zanîngehên taybet ew qas buha bûye ku ji bo hin malbatan, mîna ku ev maf li wan hatibe qedexe kirin. Zanîngehên erzan tijî dibin û yên buha jî vala dibin. Zanîngeha taybet a herî bi navdar a George Washington ji bo sala destpêkê salê 41.610 dolar dixwaze. Zanîngeha Maryland jî jê 8 hezar kêmtir dixwaze. Bi ya anketa saziya Oppenheimer Funds (Weqfên Oppenheimer), ji deh amerîkiyan neh, di wê baweriyê de ne ku buhayê terîfa zanîngehê wê di salên pêş de ew qas zêde bibe ku xwendina bilind wê bibe tiştek weha ku

**Rojnamevan.*



*Kadir Akyol, “Kent Bozumu”*

mirov nikaribe xwe bigîhîne. Ji % 43 amerikiyan nekaribûn 5 hezar dolar berhev bikin ji bo derbasî zanîngehê bibin.

Zêdebûna hejmara betalan û her weha xerabûna piyaseya aborî, rewşa welêt ji aliyê neyînî ve guherand. Ji bo karekî baş were bidestxistin, herî kêm divê mirov xwedî dîplomaya lîsansê be. Ji sala 2005'an vir ve, xwendina ji bo bi destxistina vê lîsansê ji çar salan daket sê salan. Pir kes hem dikarin di malên xwe de bi rêya internetê dersan bişopînin yan jî diçin kolejên civakî. Di neh salên dawî de, hejmara wan kesan ku bi vî awayî lîsansa ‘Bachelor’ bi destdixin, ji % 30 zêde bû. Bi vî awayî hem ji budçeya dibistanê mesref nayê kirin, hem jî ji budçeya malbatê ji dibistanê re nayê veqetandin û di ser de jî xwendekar di nava malbata xwe de dimîne. Dezgehên xwedî prestîj ên wekî Harvard’ê (ku rêjeya serkeftinê ji % 97 e) ne tê de, mirov bi giranî bi du rêyan dikare xwe bigîne dîploma lîsansê. Bidestxistina vê lîsansê û serkeftina xwendekar helbet girêdayî dibistanê û rewşa wê ya aboriyê ye jî. Lewma plan û projeya serok Obama ya di barê dibistanên civakî de, pir bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin. Alîkarî û desteka dewleta federal dikare hêz bide encamên perwedehiya kolejan û her weha wê cudahiya di navabera çînên civakê de kêmtir bike.

Rêvebiriya welêt amade xuya dike, ji bo ku bersivê bide van hêviyan. Bi taybetî jî di hêla perwerdekirina karkerên ji bo kar û barên ekolojîk (karkerên kesk) de, daxuyaniyên erînî hatin dayîn. Pirsgirêkên jîngehê û perwedehiya li ser mijarê divê derdorên endustriyel jî eleqeder bike. Gelo wê dibistana Lane Community College (Koleja Gelî ya Lane) bikaribe deriyên xwe ji hin xwendekaran re vebike û li ser teknolojiya ku enerjiyê nû dike û li ser parastina çavkaniyên avê û rêvebirina enerjiyê dîploma bide wan.

Gotina “karkerên kesk” ku ji aliyê mîlîtanên jîngehparêz û kesayetiyên polîtîk ên amerîkî ve gelek dihê hezkirin, bala pir kesan dikişîne. Hukûmeta federal di van dawiyan de ji bo vê mijarê qanûnekê derxist. Bi ya vê yekê ewê bi qasî 100 milyar dolar bixin xizmeta projeyên enerjiya ku xwe nû dike, tamîrata avahiyan ji bo bigihîjin asta standartên ekolojîk, bikaranîna enerjiyê ya bi zanebûn, modernîzekirin û nûjenkirina xetên elektirikê. Ev projeya, ku wê carnan bi awayekî kredî carnan jî wekî alikariyeke bêveger were fînansekirin, wê ji sed hezaran kesî re deriyên nû yên kar veke.

Bi ya rapora Neteweyên Yekgirtî, kêmasiya hejmara xebatkarên pispor ên teknîka ekolojîk (kesk) li tevahiya cihanê, li pêşiya mezinbûna sektora enerjiya ku xwe nû dike û li pêşiya perwedehiya bikaranîna enerjiyê pirsgirêka sereke ye. Ev yek dihê wateyê ku divê li ser vê mijarê hem di qada federalî de hem jî li herêman, bernameyên perwerdehiyê werin sazkirin. Saziya Academy for Educational Development (Akademiya Pêşdexistina Perwerdehiyê) û Konseya Neteweyî bi raporekê balê dikişînin ser girîngiya perwerdekirina pisporan û rola ku ji kolejan dihê hêvîkirin. Ji Redaktorên vê saziyê Mindy Feldbaum dibêje: “Bi hezaran xebatkarên ku di vê sektorê de hatine wezîfedar kirin, divê pisporiya xwe bi pêşbixin û li ser mijarê perwerdehiyê bibînin. Kolejên civakî saziyên bi tenê ne ku dikarin roleke girîng bilîzin. Ji ber têkiliya wan a dîrekt a bi bazara kar re, ew dikarin bersiv bidin pêwistiyên kargeh, endustriya nû û karmsazên ku pêdiviya wan bi kesên nû hene. (3). Seroka koleja Santa Fe Sheila Ortega raporê piştrast dike û weha dibêje: Xwendekarên me mifteya çarenûsa xwe ya pîşeyî bi destdixin. Ev carnan şansê dawî ye, ji bo ku bikaribin xwe ji xizaniyê rizgar bibin. Ew her weha ji bo pêşeroja aboriya welêt jî dikarin bibin hêviyeke xuyangî.

**Wergera ji fransî**
**Bedran Dere**

(1) Hin kolej ji derveyî Amerîka’yê jî xwendekar qebûl dikin. Bi taybetî jî ji Çîn’ê. Di sala 2008-2009’an de hejmara xwendekarên biyanî ji % 10,5 % zêde bûye.

http://chronicle.com/article/Number-of-Foreign-Students-in/49142).

(2) Hin alîkarî ji aliyê bernameyên dewletê ve dihên terxankirin, yên din jî di çarçoveya bernameya Free Application for Federal Student Aid (Serlêdana bêmûçe ji bo alîkariya federal a xwendekaran) de wekî bûrs dihê dayîn.

(3) America.gov, Kolejên civakî amade ne xebatkarên (kesk) bigihînin 8 Nîsan 2009.

# Dîrokçeya kolejên civakî

Kolejên civakî (community college) cara pêşî di sala 1901’an de di bin navê Joliet Junior College de, di çarçoveya dibistana Îllinois de hat damezrandin. Armanca wan ew bû ku xwendevanan bigîhînin asta bi destxistina dîploma bakeloriyayê (li Fransa’yê di asta lisansê de ye) Di navbera salên 1920 -1930’an de, di van kolejan de li ser mijar û pîşeyên cihêreng ên profesyonel û nîv-profesyonel ders hatin dayîn û dîploma hatin belavkirin. Di 1947’an de, komîsyona Truman, di Higher Education for American Democracy (Perwerdehiya Bilind ji bo Demokrasiya Amerîkî) de bi awayekî vekirî wezîfe û armanca bingehîn a van kolejan diyar kir: perwerdehiyeke erzan di xizmeta civak û gelên heremî de.

Kolejên bi navê American Association of Junior Colleges ku bi tevahî çar sed û pêncî û heft (457) dibistan digirtin nava xwe tev di sala 1960’an de hatin vekirin. Di sala 1965’an de sîstema dayîna bûrsê hat birêkûpêkkirin, Di salên 1970’î de pîşe û perwerdehiya li ser teknikê ya li ser du salan jî tê de hat bicihkirin. Di sala 1992’an de navê van kolejan wekî ‘American Association of Community Colleges’ (Komeleya Kolejên Gelî yên Amerîkî) hat guherandin. Bi vê saziya perwerdehiyê ve girêdayî îro hezar û du sed kolej di nava xwe de bi qasî yanzdeh milyon û nîv xwendevan dihewînin. Di sala 2009’an de hejmara kesên ku dixwazin xwe qeyd bikin ji % 10 zêde bûye.

Di heman demê de, hin ji van xwendekaran piştî salekê dev ji dibistanê berdidin. (ji % 30ê wan hewlê didin derbasî dibistanên amerîkî yên bilind bibin) nîvê tevahiya xwendekaran jî heta bi destxistina dîplomayê xwendina xwe berdewam nakin. Seroka saziya Education Trust (Weqfa Perwerdehiyê), Xanim Kati Haycock dibêje “bi taybetî jî kesên ji hindikahiyan herêmê xwe zû ji perwerdehiyê dikişînin” (1). Rastiyeke din ê kolejan ku mirovan aciz dike ew e ku salê bi qasî milyonek xwendekarên ji dibistanên cuda, ji bo dersên xwe yên şûnvemayî bi taybetî jî matematîk û îngîlîziya xwe pêş bixin tev li dersên kolejan dibin.

**Wergera ji fransî**
**Bedran Dere**

(1) US News and World Report, “Dropouts loom large for schools”, Washington DC, Îlon 2009.

TIRKIYE

# Şîddeta li dijî kurdan û neteweperestiya tirk

DR. İLHAN KIZILHAN*

**Têkoşîna kurdan a ji bo nasname û çanda wan, şerê çekdarî yê kurdan li dijî artêşa tirk, tirsên neteweperestî yên elîta desthilatdar xurt dikin û ew jî tirs û êrîşkariya xwe li ser gelê tirk didin xuyakirin.**

Li bajarên mezin ên tirkan, kurd rojane bi hewldanên qetilkirinê, êrîş, destdirêjî û dijûnan re rûbirû ne; ev jiyaneke rojane ya pêşhukim û dîtina dijminane ye. Ji bo welatiyên kurd, jiyana rojane veguheriye ya lidervehiştin û êrîşên bi ser kurdan de. Êrîşkar ji aliyê kesên xwediyê heman zêhniyet û fikrî ve tên parastin û ji aliyê pirraniyeke bêdeng ve bi awayekjî neyekser ji bo êrîşên bi vî rengî tên teşwîqkirin û kirinên wan tên rewa kirin. Tevî şerê eşkere yê di navbera PKK'ê û artêşa tirk de yê li çiyayên Kurdistan'ê, şîddet û dijminahiya kurdan li bajarên mezin ên Tirkiye'yê ketiye qonaxeke bi tehlûke. Rûbirûbûneke bi van dijberiyan û lêkolîneke li ser sedemên şîddeta bi vî rengî ya li dijî hindikahiyên dînî û etnîk gelekî kêm tê kirin. Belê, lê sedema bingehîn a vê "kînê" û zêdebûna cihêkarî, lidervehiştin û rasîzman li Tirkiye'yê çi ye? Ji bo çi hê jî jênehatîbûna siyaseta tirk di bi awayekî demokratîk çareserkirina pirsgirêka kurd de dewam dike? Yan jî gelo daxwaza çareserkirinê nîne û eger nîne, çima? Ez dixwazim di vê gotarê de bi van pirsan û pirsên mîna van dakevim.

** Prof. Dr. İlhan Kızılhan, Instîtuya Lêkolînên li ser aştiyê – Rojhilata Navîn, Cooperative State University BW, Universität Freiburg, xebatkarê koma projeya Pirsgirêkan û aştiyê li zanîngeha Konstanzê, nivîskarê gelek lêkolînên li ser hindikahiyên etnîk li Rojhilata Navîn û li ser posttrawmatalojiyê, şêwirmendê zanistî ji bo gelek kanalên televizyon û radyoyê, ji bo dadgeh û saziyên din ên dewletê zilamê pispor, psîkolog, doktorê civakê, psîkoterapîst.*

### Çareserkirina pirsgirêkê yan parastina pirsgirêkê?

Mirov berê awirên xwe bide ser pêvajoya pirsgirêkên li Tirkiye'yê, her weha yên li Yûgoslawya, Hindistan an jî Bakurê Îrlandayê, mirov dibîne: Ne înkar dibe sedema pirsgirêkan, lê belê pirsgirêk ji ber çi sedem û berjewendiyan derketibin holê bila derketibin, bi xwe înkarê diafirînin. Para bêhtir ev înkar ne çavkaniyên pirsgirêkan in, berevajî navgînek in ji bo ku pirsgirêk demeke dirêj hebe û dewam bike. Dema mirov wisa bawer dike ku bi pirranî di pirsgirêkan de tişta hîmî û girîng çareserkirin e, hingî mirov nabîne ku pirsgirêk ji bo xwe yan jî ji bo dînamîkên civakî tên dewamkirin û ev dînamîkên civakî jî bi riya pirsgirêkan tên seferberkirin. Sedema vê jî ew e ku di gelek pirsgirêkan de kes hene ku karê wan ji çareserkirinê bêhtir di pirsgirkan bi xwe de heye. Ev yek ne bi tenê bi rant û kurtêlxwurên şer re sînordar e ku bi taybetî jî di warê aborî de – nexasim ji pirsgirêkên bi şîddet – kar dikin. Nexêr, tiştên din jî hene ku mirov dikarin ji pirsgirêkekê bi dest bixin: Şeref û hêz, alîgirên dilsoz, netewîbûn û nasname.

### Nasnameya neteweperest û rewakirin

Hebûna komên etnîk û dînî ên cihêreng li welatên demokratîk weke pirrengî û dewlemendiyê tê dîtin. Şertê vê helwesta erênî hebûna sîstemeke demokratîk û mirovên bi pirranî demokrat in. Dewletên neteweperest, weke Tirkiye'yê ku bi riya Kemalîzmê şîara wê "yek al, yek netewe û yek etnîsîte" ye, nasnameyên cihê bi kar tînin da ku pirsgirêkê ji bo berjewendiyên xwe dijwartir bikin. Li pey daxwaza derûnî ya lêgerîna nasnameyeke pozîtîf "ez kîm e?", analîzên siyasî, civakî, aborî, dînî û etnîk nayên kirin (û ne analîzek bi tenê heye), berê vê lêgerînê didin ser endametiya yek koma diyar ango "tirk." Ya esas, meyila mirovan ber bi têgîneke erênî ya xwe bi xwe heye (Turner, 1979). Ji ber ku beşek ji têgîna me bi xwe (yan jî nasnameya me) ya têkildarî girêdana bi komekê ve ji berê ve hatiye binavkirin, hingî naxwe divê her wiha ji bo nêrîna bi çavekî erênî li koma xwe bi xwe pêştercîhek hebe. Bi riya îdeolojî û pîvanên siyasî ev nirxandinên erênî dikarin werin nepixandin û mubalexekirin. Encama liberhevgirtina di navbera koman de ji bo ferdan gelekî girîng e, lewra bi awayekî neyekser hêzê dide bawerîbixweanîna me. Eger koma ferd endamê wê (li vir "tirk") di aliyekî nirxan de bi awayekî zelal weke çêtir dikare were dîtin, hingî mumkin e ku di encama vê de koma din weke kêmnirx û piçûk were dîtin. Bi vî rengî zextek pêk tê ya ku cihêrengbûnê ferz dike. Endamên komên cihê jî hewl didin koma xwe bi awayekî pozîtîf ji ya din cihê bikin. Bikaranîna şîddetê û cihêkarî di vê pêvajoya "nirxpêdana pozîtîf" a koma xwe bi xwe de, derfet û îhtîmal in.

Pirsgirêk seferber dikin, mijarên tevgerên civakî li dora wan dibin kom, diafirînin. Ew dijberan, belê herweha civatan jî çêdikin. Bi vî rengî mirov dikare weha maneyê bide pirsgirêka li Tirkiye'yê: Bi destê Kemalîzmê avakirina – û bi şîddetê pêkanîna – dijminahiya tirk û kurdan bi riya jihevcihêkirina tirk û netirkan, beşek ji projeya neteweperest e ku armanca wê ji derve xwecihêkirin û li hundir yekîtî ye. Di vê çarçoveyê de kurd dibin dijminê yedek, ne-tirk, ango di pratîkê de yên din. Li vir ya ku "nasnameya gelekî" ava dike li gorî dost û dijmin jihevcihêkirin e.

### Dezavantaja bawerî bi hebûna tê kirin

Pirsgirêkên herêmî yê di navbera koman de, şerê çekdarî yê bi PKK'ê re û her weha tevgerên dînî-neteweperest para bêhtir weke reaksiyonên parastinê li hemberî şert û mercên heyî hatin nirxandin. Serboriyên biyanîbûnê, şert û mercên bênirxbûna civakê û anomî, bêparbûna nisbî weke ku pêkhatina wê rave bikin, xuya dikin. Rêbazên sosyolojîk ên rêûresma Emile Durkheim timî bi lez guherîna civakî-aborî, bajarîbûn, ferdbûn, bênirx dîtina rêûresmê û dîn (Max Weber "jêçûna efsûna dinyayê") û bi serê xwe modernîte (weke pêvajoya jihevcihêbûna civakî) ji serborî û tecrûbeyên anomiyê (dûrbûna ferdan ji nirxên civakê) û weke encam ji girîngiya zêde dibe ya siyaseta nasnameyê, berpirsiyar digire (Castell, 1997).

Ji bo dijwarkirina pirsgirêkeke di navbera du koman de divê lihevnekirineke (yan jî nakokiyeke) tê hîskirin di navbera tişta ya mirov e û ya ku mirov ji xwe re weke heq dibînine de di rastiyê de yan jî bi awayekî lihevçêkirî, zelal were darîçavkirin. Ev lihevnekirin dikare bi riya liberhevgirtina di rabihuriyê de bi koma xwe re yan jî - hê bêhtir – bi komên din re derkeve holê. Ev liberhevgirtin bigihêjin asta kendaleke di navbera ya bidestketî û ya hatî hêvîkirin, hingî mirov xwe têra xwe motîvebûyî hîs dikin da ku guhertineke civakî bidin destpêkirin. Ev yek nexasim dema ku liberhevgirtin di navbera koman de tê kirin û ne di navbera ez bi xwe û yên din te tê kirin, pêk tê (Castell 1997; Turner 1992).

Di encama rêzek lêkolîn de hat nîşandan ku pêşhukim, helwestên rastgir ên radîkal û heta ji bo şîddetê amadebûn, eleqeya wan bi pêbarbûn û mehrûmbûna civakî re heye (Zick 1997). Koma pirranî ya "tirkan" divê xwedî wê hîssê be ku li gorî hindikahiya ne-tirkan (weke mînak kurd, ermenî, rûm û hwd.) bi dezavantaj be. Bi desteka fikrên neteweperest û endambûna komeke nirxbilindtir a bawerî pê heye, dibe ku hîsa dezavatajîbûnê li cihê kar, di siyasetê de û li dibistanan bibe sedema cihêkariya li dijî netirkan.

### Projeya neteweperest

Pir caran belavbûna neteweperestiya tirk û şîddeta li dijî kurdên li Tirkiye'yê weke reaksiyonek yan jî xweparastina ji "fikrên biyanî" yên mîna komunîzm, demokrasiya girseyî yan jî tirsa ji damezrandina dewleteke kurd hatin nirxandin. Lê belê şîddeta di navbera tirk û kurdan de ya niha li Tirkiye'yê heyî, mirov nikare bêyî projeya neteweperest a Tirki-

www.arsivakurdi.org

ye'yê fêm bike. Ev ne projeyeke xweparastinê ye, berevajî êrîşkar e: Li gorî têgihiştina dewleteke pirranîparêz, pêkanîn (û ferzkirina) yekîtiyeke ku li dora endametiyeke lihevçêkirî ya etnîk hatiye binavkirin, armanca vê projeyê ye.

Têkoşîna kurdan a ji bo nasnameya û çanda wan, şerê çekdarî yê kurdan li dijî artêşa tirk, tirsên neteweperestî yên elîta desthilatdar xurt dikin û ew jî tirs û êrîşkariya xwe li ser gelê tirk didin xuyakirin.

Weke mînak ji damezrandina komarê û vir ve, artêşa tirk veguherî semboleke navendî ya yekîtî û lidervehiştinê, ji bo diyarkirina yên ku li gorî fikrê neteweperestiya tirk rewa ye di civaka tirk û siyaseta wê de cihê xwe bigirin û yên ku "biyanî" ne.

Di dema diyarkirinê de pêvajoyên diyar ên tevlîkirin û lidervehiştinê birêve diçin û ev pêvajo komeke em/dubeşkirina civakê li gorî tirk û ne-tirk xurt dike û berbipêş ve dibe. Ji bo ev pêk were ji destpêka damezrandina Komara Tirkiye'yê û vir ve bi riya sîstema perwerdeyê, çapemenî û tevnên din ên cur bi cur û rêxistinên wan ev îdeolojiya "Kemalîzmê" xistin hundirê her mal û saziyê.

Li aliyê din axaftina bi zimanê kurdî, xwe weke endamê nasnameya kurd qebûlkirin û têkoşîna siyasî ya kurdan qaşo nîşanên biyanîbûna kurdan û êrîşkariya wan a li dijî yekîtiya tirkan in. Ev nîşan jî bi peyvên mîna "terorîzm" û PKK tên bi gewdekirin. Atatürk û îdeolojiya wî ya neteweperest a bi navê Kemalîzm, ji bo tirkîtiya neteweperest semboleke cihê xwe girtî ye, ev tirkîtî jî li ser tevahiya komên siyasî û dînî di şerê hevpar ê li dijî tehlûkeya ji derve de bûye yek. Ev nirx û sembol divê hem ferdî û hem jî komî werin parastin. Nîqaşkirina vê di cih de weke xiyanetê tê binavkirin.

**Helwesta dij-kurd**

Helwesta dij-kurd a ji damezrandina Komara Tirkiye'yê û vir ve ango ji 1923'an û vir ve heyî, ya ku di dema darbeya eskerî ya Kenan Evren a sala 1980'î de îdeolojiya dewletê ya ferzkirî bû, piştî destpêkirina hevdîtinên endametiya Yekîtiya Ewrûpa'yê di pratîkê de di şevekê de hatin redkirin û li ber çavên raya giştî paşê navê wê weke "pêşîlêvekirina kurd" hat hildan û çend hefteyan paşê weke "pêşîlêvekirina demokratîk" ev nav hate sererastkirin. Ev pêvajo bi bayê bezê hê di malzarokê de hate fetisandin, lewra gavên ji bo vê pêwîst ên ber bi demokrasiya di nava gewdeyê dewletê de bi xwe û nîqaş û guftûgoyên raya giştî di nava civakê de nehatin pêkanîn.

Tirkiye ya ku kolektîf û komî renggirtî tevî mirovên xwe yên xwedî meyilên li gorî reûresman, berjewendiyên tevahiyê, di vê rewşê de yên Tirkiye'yê, li pêşiya mafên ferdan digire û her weha li pêşiya mafên kurdan û hindikahiyên din jî (Kizilhan 2008).

Girîng e mirov hin tiştan li ser çarçoveya siyasî ya damezrandina Komara Tirkiye'yê bibêje. Bi vî rengî wê zelal bibe, jihevdeketina Împaratoriya Osmaniyan ku qet nebe pêncsed sal di ser xwe re bihurandin, bandora xwe li têgihiştina azadî û demokrasiyê ya dewleta piçûk a nû damezrandî kir û sîstema huqûqî ya civaka tirk îro jî xwe disipêre vî hîmî (Steibach 2000).

Ji destpêka sedsala 19'an û vir ve ji bo elît û întelektuelên tirkan maneya azadiyê lêgerîna li têgînên rizgarkirina (Dabag 1998) Împaratoriya Osmanî ya ji hev de diket bû. Di serî de întelektuelên bandora Şoreşa Fransa'yê gelekî li wan bûyî, li hin riyan digeriyan da ku sazî û dezgeha mezin a rêveberiya îdarî, eskerî û aborî reformîze bikin. Armanca wan ti carî ne azadiya ferdî ya mirovan bû (Akşam 2006).

Mirov ji aliyê Îslamê ve lê binêre, fikrê azadiyê hingî jî û îro jî, ti carî ji bo ferdan nehat nîqaşkirin, berevajî ji bo tevahiya civakê fikrê azadiyê hat guftûgokirin. Ji ber vê yekê jî ne bi tenê pirsgirêkên etnîk û dînî, daxwazên hindikahiyan timî weke êrîşên li dijî tevahiya Tirkiye'yê û weke hewldanên jihevdexistina Tirkiye'yê tên nirxandin (Steinbach 2000), heta bi mexdûrên binpêkirinên mafan ên ku weke ferd serî li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpa'yê didin û gilî dikin jî tên gunehbarkirin ku destekê didin rûreşkirina Tirkiye'yê û hewl didin dewletê teşhîr bikin. Ev awayê fikr ê kolektîf bandora xwe li tevahiya civakê dike û tesîrê li helwest û kirinên wê dike. Ango dema ku mirovan di dema damezrandina Komara Tirkiye'yê de behsa azadiyê dikir, maneya vê azadiyê azadbûna civakê ji bin nîrê desthilatdariya biyaniyan û li dinyayê ji nû ve avakirina prestîja tirkosmanî bû.

Azadiya bi maneya azadbûna ji ferzkirin û desthilatdariyên berê û her weha pêvajoyeke ferdbûyînê ya modern bi tenê azadbûna ji hêzên derve û hundir bû ku li pêşiya pêkhatina siyasî ya împaratoriya tirk asteng bûn. Îro bi xwe jî maneya azadiyê, azadbûn û bi awayekî azad pêkhatina berjewendiyên neteweyî yên tirk û fantaziyên desthilatdariya dewleteke tûranî ye ya ku sînorên wê ji Anatol'ê digihijin Çîn'ê (Dabag 1998).



Kadir A

Bi heman rengî têgihiştina sekularbûnê jî li Tirkiye'yê xwe disipêre heman zêhniyetê: Kemalîzm îdîa dike ku ew nûneriya laîktiya bi rastî dike. Fikrê xwe disipêriyê jî ew e ku Kemalîzm "dîn nîne, lê belê şêwazekî jiyanê" ye û ji ber vê yekê jî bi şertê ku qebûl bikin tirk in û xwe bi vî rengî bi nav bikin, dikare mirovên ji her baweriyê bihewîne. Ji ber vê yekê bi awayekî ku bi zanistî nikare were piştrast kirin, heta kenê mirov pê were hewl hat dayîn peyva etnîk "tirk" weke peyveke di ser etnîsîteyan re bi nav bikin ku komên etnîk ên li Tirkiye'yê giş karibin pê werin binavkirin û ev komên etnîk jî weke tirk werin binavkirin.

Ji bo berbelavkirina neteweperestiya tirk şîddeta dewletê

Tirkiye weke dewlet û îdeolojî xwe bi kirin û çalakiyên cur bi cur yên şîddetê terîf dike û her weha bi awayê taybet ê pê sedemên şîddetê tên ravekirin û rêxistinkirin jî. Van şêwazên taybet kir ku neteweperestî û rêxistinên neteweperest belav bibin. Şîddeta li dora vê dijmindîtinê hatî birêxistinkirin, dikarî pêşî pirsgirêkên civakî yên deveran bike herêmî û di bin navê "pirsgirêka terorîzmê" de hemûyan li hev zêde bike. Ya diduyan, ji şîddetê hat ku nerazî-

www.arsivakurd.org



*, 40 x 90 cm*

bûnên ji dewleta tirk ên cihê û gelek caran jî berevajiyê hev bûn, bihewîne û rexnekirina dewletê jî herêmî bike. Ya sisiyan şîddetê dikarî pêşniyarên ji bo beşdarbûn û hewldanên azadiyê biafirîne û qadên mirov dikare têde tevbigere veke ku şêwazên siyaseta parlemanteriyê nikarin pêk bînin.

Ya rastî jixwe diyar dibe ku pirsgirêkên civakî yên ku projeya yekîtiyê pêwîst dikin destûrê nadin ku daîmî ji holê werin rakirin û timî dîsa ji nava mentiqê xwe bi xwe ji nû ve derdikevin holê. Lê belê ji projeya yekîtiyê têgihiştina neteweperest a dewletê paş ve dimîne. Maneya vê ew e ku rast e, seferberiya neteweyî û timî hebûna nimûneyên rewakirinê yên pirraniyê nikarin yekîtiya tê hêvîkirin pêk bînin, lê belê wan paşvexistineke misêwa ya rewabûn, normalbûn û siyaseta înkarê lawaz kir.

### "Nerewabûna" kurdan

Neteweperestiya esensiyalîst (ya xwe disipêre cewher) a komên neteweperest ên tirk û şîddet ku di ser wan re rêxistinkirî (carcaran herêmîparêz in, weke mînak herêma Derya Reş, herêmên kurdan û hwd.), ji hev cihêkirin û jihevdiyarkirina zelal a dost û dijmin ferz dike; welatiyên rewa ji welatiyên nerewa cihê dike. Pirsgirêk di heman demê de dikare bibe wesîleya yekîtiya di navbera van komên neteweperest de, weke mînak yekîtiya di navbera CHP û MHP'ê de lewra naveroka pirsgirêkê gelekî zelûl e. Tişta di pirsgirêkê de diyar û darîçav mexdûr û sînorê di navbera dost û dijmin de ye. Pirsgirêk zelûl e, lewra ji vê û wê de di warê naverokê de pûç û vala ye. Ji bilî kişandina vê xeta sînor, ti mijara wê ya diyarkirî nîne. Zelûliya şemaya dualî, milîtantiya şêlû ya ku di warê xîtab û pratîkê de kişandina xeta sînor diyar dike, hevnegirtin û nakokiyên îdeolojîk di berjewendiyên komên cihê yên di nava heman "bereyê" de bêqîmet dike.

Li bajarên mezin ên tirk, şîddeta dişibe qirkirinê ya li dijî kurdan an jî şer û texrîbata li herêmên kurdan ên Tirkiye'yê, ne ji ber mecbûriyetên avahiyê (strukturel) yan jî mecbûriyetên civakî pêk tên; sedema pêkhatina wan ne "xwedana der" a tebeqeyên nefretê ne jî. Dema ku şîddeta dewletê yan jî şîddeta neteweperest a ferdan û rêxistinên wan li dijî kurdan pêk tê, di serî de maneya wê îdîaya xwedîbûna erdên Tirkiye'yê ya neteweperest û kemalîst, îdîaya hebûna serweriya etnîk a tirkan û derxistina pêş a "nerewabûna" kurdan e. Ew di heman demê de tînin ziman ka ev îdîayên xwedîbûna erd çiqasî belav bûne, ev yek ji bo komên cihê yên etnîk çiqasî xwezayî bûye. Vê di serî de xwe di beşdariya saziyên dewletê da der û nîşanên din jî ev in; polêsê destwerneda êrîşkaran û qismî kir kurd (jin û zarok jî di navê de) bibin mexdûr û bêparastin dev bi êrîşkaran ve werin berdan, doktor û nexweşxaneyên ku şervanên PKK'ê derman nekirin û hwd. da der. Jixwe vê yekê helbet xwe pê da der ku hukûmet neamade bû bi fermanên zelal ê ku bidaya polês û artêşê, helwest û êrîşên mîna qirkirinê yên dijî kurdan bi dawî bike.

Eger armanc di pirsgirêkekê de ne çareserî be çi bi dijberek, çi bê dijber, û bêhtir komekê weke kom zexm û qehîmtir bike û bibe berdevk û nûnerê berjewendiyên wê yên sereke, hingî postulatên înkarkirinê û siyaseta jidervehiştinê bi kêra wê tên. Ew dikin ku çareseriya mijarekê were paşvexistin, ji demên neral û dinyayên ne real re werin hiştin.

Esensîyalîzma dijminahiyê ya ku hê li ser şîddetê hûr û kûr dibe, dike ku pirsgirêk timî dîsa ji nû ve were terîfkirin, awayê wê li gorî şert û mercên herêmî û kêliyê were guhertin, beriya her tiştî bi demê re dewamîbûna wê were misogerkirin û pirsgirêk timî ji nû ve were darîçavkirin. Kurt û kurmancî armanc ne çareserî ye, berevajî bi îhtîmaleke mezin, bi navgîn û rêbazên nû dewamkirina pirsgirêkan e.

**Wergera ji almanî**
**Lokman Turgut**

*Ev nîvîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsandin.*

**Çavkanî**


Akşam, T. (2006). A shamful Act. The Armenien Genocide and the Question of Turkish Responsibility (Kirineke mirov pê rûreş bibe. Qirkirina Ermeniyan û pirsa berpirsiyariya tirkan). New York: Metropolitan Books.

Brown, K. (1981). Race, Class and Culture. Towards a Theoretization of the "Choice/Constraint" Concept (Nijad, çîn û çand. Ber bi teorîzekirineke têgîna "tercîh/şert ve). Di: Jackson, P./Smith, S.J. (edîtor): Social Interaction and Ethnic Segregation (Danûstendina civakî û jihevbûna etnîk). London, New York, rûpel 185-203.

Castells, M. (1997), The Information Age, Vol. II: The Power of Identity (Serdema agahiyan, berg II: Hêza Nasnameyê), Oxford 1997, rûpel. 65-67.

Dabag, M. (1998). Jungtürkische Visionen und der Völkermord an den Armeniern (Vîzyonên Jontirkan û Qirkirina Ermeniyan). Di: Genozid und Moderne, Bd. 1, Strukturen kollektiver Gewalt im 20. Jahrhundert (Qirkirin û modernîte, berg I, avahiyên şîddeta kolektîf di sedsala 20'an de). Opladen: Leske und Budich.

Kizilhan, I (2000). Kinder im Krieg, Soziale und psychologische Einwirkung des Krieges auf Kinder (Di şer de zarok, bandorên şer ên civakî û derûnî li ser zarokan). Di: Konflikt und Gewalt, Ursachen- Entwicklungstendenzen – Perspektiven. Schriftenreihe des Österreichischen Studienzentrums für Frieden und Konfliktlösung (Pirsgirêk û şîddet, sedem - meyilên pêşketinê - perspektîf. Rêzenivîsên Navenda Lêkolînên ji bo aştî û çareseriya pirsgirêkan a awûsturyayî) – ÖSFK (weşêner). Münster: agenda Verlag.

Kizilhan, I. (2004). Sozialisation im Krieg (Di şer de civakîbûn). Di: Sommer und Fuchs (edîtor). Handbuch der Kriegs- und Friedenspsychologie (pirtûka destan a psîkolojiya şer û aştiyê). Weinheim: Beltz Verlag (rûpel 357-368).

Kizilhan, I. (2008). Die Gegenwärtigkeit der Vergangenheit. Funktionen der Erinnerns an belastende Ereignisse (Rojanebûna rabihuriyê. Fonksiyonên bibîranîna bûyerên li ser derûniya mirov bar in). Berlin: Regener Verlag

Steinbach, U. (2000). Geschichte der Türkei (Dîroka Tirkiye'yê), München: Beck.

Tajfel, H. (1974). Social Identity and Intergroup Behavior (Nasnameya civakî û danûstendina koman bi hev re). Di: Social Science Information, 13 (1974)2, rûpel 65-93.

Tajfel, H. (1982). Gruppenkonflikt und Vorurteil: Entstehung und Funktion sozialer Stereotypen (pirsgirêkên koman û pêşhukim: Pêkhatin û fonksiyona steryotîpên civakî), Bern, Stuttgart, Wien.

Zick, A. (1997) Vorurteile und Rassismus (Pêşhukim û rasîzm), Münster: Waxmann Verlag.


www.arsivakurdi.org

ÎSLAM

# Selefîzm an jî guhertina îslamî ya bi îstîqrar

FRANÇOIS BURGAT*

Ji salên 1970'î û vir ve dikên siyasî yên ereb li dora sê helwestên "musulman" reng digirin: Sofî navdar in bi dengdana rejîmên heyî, Birayên Musulman bêhtir bi dijberî û dengdayîna li dijî rejîman tên nasîn, li aliyê din selefîst hilbijartinan weke hêmanekî ku civakê ji hev parçe dike dinirxînin û tercîh dikin ku xwe dûrî sindoqên hilbijartinan bigirin (beşa di çarçoveyê de bixwîne). Ev rêzên nivîsê ber bi vê encamê ve dibin: Qet nebe hin ji selefistan riya xwe îzolekirinê dibijêrin (Li Erebistan a Suûdî, di dema hilbijartinên herêmî yên 2005'an de), sofîyên li Iraq û Pakistanê, ya çekdarî jî di nav de (ji nû ve) riya muxalefetê hildibijêrin. Eger em behsa Birayên Musulman bikin, tevgera ku sala 1928'an li Misir'ê ji aliyê Hesen el-Bannah ve hat damezrandin, ji wan hat ku girseyên hilbijartinan pêk bînin û wan bixin nava liv û tevgerê. Birayên Musulman hêdî hêdî bawerî pê anîn ku bikevin hilbijartinan û karûbarên xwe di çarçoveya parlemantarîzmê de bi rê ve bibin û ji wan tê pirraniyê bixin nava tevgerê.

Nifşê Birayên Musulman ên ku di siyasetê de kirin ku dewra pêşî a "îslamîstên" modern vejî û bi taybetî jî li Filistîn, Misir û li Mexreb'ê di nava muxalifan de hê jî xwedî cihekî navendî ne, êdî her diçe bêhtir xwe disipêre hevrikiya bi tevgera jêre dibêjin "selefîst" (1). Û ya kêm tê nîqaşkirin xisletên hevpar in. Ev xisletên "selefîzma" wan dikin yek, mîna ji ser xwe birina nîşana mîrateya Ixwan Muflisîn (ew "birayên têkçûyî") pêdiviyek e.

Tevî ku mumkin e xweîfadekirina wan li welatên ereb û di nava civakên rojava de cihên ku lê bi cih bûne, ji hev cihê be, di baweriya van "ên nû" yên seferberiyên îslamîst de tu tiştî ... nû nîn e. Wê ne rast be mirov bêje selefîst ew nifş e ku piştî Birayên Musulman, Bereya Îslamî ya Silametê (Front islamique de salut - FIS), yan jî Adil wal-Îhsan ê mexrebî hatine. Ya rastî selefîst beriya Birayên Musulman hebûn, li Misir'ê û li Erebistana Suûdî (2). Tê de guman nîn e ku seferberiya "Birayên Musulman" e ya ku xwe ji "qurmê" tevgera îslamî ya salên 1930'î qut dike. Ji wan hat ku heta salên 1990'î nav û dengê we belav bikin û di warê popularîte û darîçaviya siyasî de dengê xwe bi ser yê hevrikên xwe yên selefîst bixin.

Ji bo bigihîjin desthilatdariyê, Birayên Musulman beridîneke ji dil û bikok a doktrînal dan destpêkirin û pêk anîn – dema ev kirin jî referansên biyanî yên mîna destûra bingehîn û demokrasî, ji bo gotin bi gotin xwendineke fikrê îslamî yê klasîk bi kar anîn. Mirov ji encamên van reforman matmayî namîne, ew bûn sedema tansiyon û parçebûnên navxweyî, û her weha qada serbest ji bo mijarên din ên lihevnekirinê jî hişt. Nifşê Birayên Musulman çiqasî di bereya têkoşîna qanûnî de giraniya wî zêde dibe, ewqasî jî ew bi nerazîbûneke selefistan re rûbirû dibe; selefîstên ku "modernbûnên" Birayên Musulman weke "gavpaşdeavêtinan (tawîzan)" gunehbar dikin.

Dema mirov bi awira selefistan lê binêre, nifşê pîr dibe yê Birayên Musulman herî zêde "karîbû" li rejîmên ku weke laîk dihatin nasîn û ev nifş li ber wan radibû (Misir, Sûrî û hwd.) heta radeyekê mecbûriyeta ji nû ve misilmanbûneke sembolîk, ferz bike. Û destûr dan ku were pîvan ka seferberiyên behskirî yên "dînî" li vê herêma dinyayê di nava civakê de çiqasî bikok şax berdane: Tevahiya rejîmên behsa wan hat kirin ev daxwazên civakê kirin para xwe – tevî ku wan di mijara sansûrê de hin tişt lê zêde kirin.

Li hember koalîsyona otoritarîzma ereb û "civaka navneteweyî", ji Selefîstan re hêsantir e guneh bixin stûyê yekdestdariya Birayên Musulman, stratejiya "Birayên Musulman" bi xwe heta niha ti berhemên zêde yên siyasî bi xwe re neanîne. Îdeologê el-Qaîde'yê yê Misirî Ayman el-Zehawirî Birayên Musulman bi destekkirina laîktî û demokrasiyê gunehbar dike. El-Zehawirî bi vî awayî bi rengekî nakokane ji herkesî çêtir nîşan dide ku Birayên Musulman yek ji hêmanên "modernbûna" fikrê siyasî yê civaka xwe ne – qet nebe li gorî ya elîtên laîk, veguherînek e ku di warê civakî û çandî de baştir tê qebûlkirin.

Selefistan xwe ji rêûresma Birayên Musulman qut kir, beşek ji maneya vê ew e ku selefîst hin kategoriyên fikrê siyasî yên Rojava yên ku ji aliyê Birayên Musulman ve kirasê îslamî li wan hatî kirin, red dikin: Damezrandina partiyên siyasî, strukturên rêxistinî, tevlîbûna hilbijartinan, cihgirtna jinan di qada siyasî yan jî pîşeyî de (3).

Selefîst hemû wê îşaret bi girîngiya çavkaniyên yekser bikin, ev jî Quran û Sineta (4) Pêxember Mihemed e. Lê ev otorîteyên huqûqî dixwazin xwe ji "zanîn û tecrûbeya mezhebên sunî (henefîtî, malikîtî, henbelîtî û şafiîtî) qut bikin," û bi vî rengî ji qedexekirina vê şîroveyê wêdetir ya ku îfadeya civakî û siyasî ya berbiçav a pîvana dînî ye, dixwazin civak xwedî li mafê xwe yê pêkanîna dînî derkeve, heta ku yekdestdariya wê bi dest bixe (5). Ji bo ku israra xwe ya di prensîpa yekbûna xwedê de nîşan bidin, selefîst her pîrozkirina mirovî ya di navbera bawermend û xaliqê wan de, weke "şirîkê" pisîk ê mirov ku ji xwedê re hatî çêkirin, red dikin. Timî îşaretpêkirina hedîsên gelekî bi kitekit, li gorî wan her tişta bawermend ji bo zelalkirina xwendina wehiyan pê hewce ye, di nav xwe de hildigirin da ku vî bawermendî biparêze ku kes nekeve navbera wî û xwedê de. Kulta xasên xwedê û mirovên pîroz, pîroz û mezin dîtina şêx, sofî yan jî îmamên şiî yên ku weke qet têknaçin navdar in û heta rêzgirtina ji zanyar û alimên nivîsê "yên ku dengê xwe tevlî yê xwedê dikin" jî bi îdîaya zirarê didin prensîpa yekbûna xwedê, tên redkirin.

Wekî din tevgera selefîst para bêhtir baskên bereyên ji wan re tê gotin "piyetîst (li dijî dogmayên ortodaksiya dînî)" yan jî "kiyetîst (ên xwe ji kar û emelê dinê şuştinê, di riya xwedê de ne)" (6) mezin dike, ev jî heta ku ji xwe re bêjin em misilman in, banga serî tewandina li ber her hukûmetê dikin, "bertîlxwar û otokratîk" bin jî. Armanc jî ew e xwe ji zirara herî xirab dûr bigirin: Fitne, ango zirardayîna yekîtiya civaka bawermendan. Li ser banga ulemaya nêzî rejîma suûdî, têra xwe selefistan dîndariya xwe ji îfadeyên nakok paqijkirin û ji Birayên Musulman veqetiyan. Selefîstên li gorî Birayên Musulman xwediyê nêrîn û awirên kêmtir modernîst, ji Yemenê heta bi Misir û Mexreb'ê, rejîmên weke modernîzator navdar in bi awayekî nakok bêhtir xatirê wan girtin, lewra di vê alînegirtina di hilbijartinan de van rejîman amûreke lawazkirina muxalefeta xwe didît.

Li hin welatên cîhana ereb, selefîst rastî zextan tên yan jî li rojava weke gunehkarê civakî û dînî tên deqkirin. Ji ber vê jî kotaya wan a namzetên "cîhadîst" a çalakiya yekser a li dijî elîtên neteweyî û xwediyên nîzama cîhanî heye. Dema vê dikin ji xwe re Seyid Qutb (7) ê Misirî mînak digirin. Seyid Qutb teza Birayên Musulman di salên 1960'î de radîkal kiribû. Li Erebistana Suûdî û li Misir'ê, lê her weha li goşe û keviyên Ewrûpayê jî baskê piyetîst tevlî nav refên hin tebgeran dibin, yên mîna ya Cuhayman el-Uteybî, plankarê êrîşa sala 1979'an li dijî mizgefta mezin a Mekehê (8), yan jî dibistana cîhadîst a teorîsyen Seyid Qutb û ya Dr. Eyman el-Zehawirî.

Tevî ku dan zanîn ew her nivîsa "nû" red dikin jî, selefîst bi ti awayî ji bayê dînamîka guhertinê ne parastî ne. Ji Birayên Musulman guhertî, bereya selefîstan bi awayekî xwezayîtir "pirreng" e di pêwendiyên xwe yên bi siyasetê re (weke di vîzyona wê ya rola jinan a civakî ku têde bi awayekî hişk tevlîhevbûna jin û mêran red dike) û yekrengiya wê ya rêxistinî kêm e. Ew bi kelecan pêdiviya "vegereke" ber bi "çavkaniyên" ji tevahiya tevlîbûna mirovan şuştî, destnîşan dike; ev yek ji yên beriya xwe bêhtir, bersivên doktrînal ên zelal dernaxe holê. Di xwendina Quranê ya selefistan de ji yên beriya xwe bêhtir parastina li dijî şîroveyên guhertî, nîne. Û eger mekanîzmaya ji bo şîrovekirina eyatên xwedê pêwîst hat çêkirin, ew beriya vê, bawermendan ji bandora desthilatdariya demî naparêzin.

Komên bi awayekî zelal ji Birayên Musulman qut bûyî, mîna ku şagirtên Hesen el-Bannah di dema xwe de tevgeriyan, beridîn; ango tevlî hilbijartinan bûn. Li Yemenê jî li Erebistana Suûdî û Kuweytê jî selefîst qebûl dikin namzetan destnîşan bikin (9). Ev modernîzasyona ku weke xirab rûreşkirina Birayên Musulman rewa dikir, ji niha şûn ve dikare xisleta helwesta selefis-

** Zanyarê siyasetê, nivîskarê L'islamisme à l'heure d'Al-Qaida (Di dema el-Qaîde'yê de îslamîzm), weşanên La Découverte, Parîs, 2005.*

www.arsivakurdi.org



*Kadir Akyol, "Metamorfoz Kent", 150x130 cm, 2009*

tan diyar bike. Di derketina holê ya salên 2000'î ya selefistan de, Birayên Misliman ên "modernîzator" ew redkirin, bi rengê ku di dema xwe de elîtên "rojavayîbûyî" yên li dijî wan şer dikirin, ew red kiribûn. Di nava qada gelemperiyê de Birayên Musulman doza mafê zêdetir ketine nav kar û barên civakî û siyasî dikin, selefîst berovajî bersivê didin binketina îdîa dikin a şagirtên Hesen el-Bannah e û lidervehiştina daimî ya ku ew bi xwe mexdûrê wê ne. Bersiva wan gengeşe û pratîkên li dijî lidervehiştinê ye. Zelûliya selefîst, xwe ji guhertinê bêhtir di dewamîbûnê de dide der.

Ev dewamîbûn di destûra sembolîk de jî xwe dide xuya kirin; ev destûra ku dike awirên medyatîk ê rojavayî biçin ser: Derdorên selefîst destûrê didin ku mekanîzmaya deqkirin û reşkirinê xwe nû bike, hem jî mîna salên 1970'î. Di salên 1970'î de yekemîn derketina holê ya "îslamistan" bû. Ev mekanîzma wan ji tevahiya lêkolînên çapemeniyê û tevahiya rêveberiya siyasî ya bi mentiq diparêze.

**Wergera ji fransî**
**Lokman Turgut**

---

(1) Bernard Rougier, Qu'est-ce que le salafaisme? (Selefîzm çi ye?), weşanên PUF, Parîs, 2009.

(2) Cemiet Ansar el-Sunna sala 1926'an hat damezrandin ango du salan beriya li Qahîrê damezrandina rêxistina Birayên Musulman, û sala 1931'ê Şêx İbn Badis Komeleya Ûlemayên Cezayîr'ê saz kir.

(3) François Burgat û Mohammed Sbitli, "Les salafis au Yémen ou… la modernisation malgré tout (Li Yemenê Selefîst an jî … tevî her tiştî modernî- zasyon)", Chroniques yéménites, Sanaa, hejmar 12, 2002 . L'Islamisme en face, weşanên La Découverte 2007

(4) Tevahiya kirin, gotin û rabûnûrûniştina pêxember û eshabiyên wî.

(5) Rougier, berhema li jor navbihurî, rûpel 19.

(6) Gilles Kepel, Jihad: expansion et déclin de l'islamisme (Cîhad: ferehbûn û lawazbûna îslamîzmê), Parîs, weşanên Gallimard, 2000.

(7) Rêveberê Birayên Musulman; rejîma serokkomarê Misir'ê Cemal Abdulnasir ew avêt zindanê û sala 1966'an ew bi dar vekir. Ew teorîsyenê ku bû îlhama komên herî radîkal e.

(8) 20'ê Mijdara 1979'an, komeke ji dused îslamîstî mizgefta mezin a Meke'yê dagir kir. Dagirkirinê du hefteyan dewam kir û eger alîkariya cendermeyên fransî nebûya wê bêhtir dewam bikira.

(9) Pascal Ménoret, "Le cheikh, l'électeur et le SMS. Mobilisation électorale et pratiques de votes en Arabie Saoudite (Şêx, hilbijêr û SMS. Seferberiya ji bo hilbijartinan û pêkanînên dengdanê li Erebistana Suûdî)", Transcontinentales, Parîs, hejmar 1, somestra 2., 2005

## Vegotina peyvan

**Îslamîzm**
Xetên vê peyvê nediyar û şêlû dimînin, lewra ev peyv bi kêra bi navkirina tevgerên gelekî ji hev cihê û hin caran jî dijberê hev tê; ji El-Qaîde'yê heta Birayên Musulman, di navê de Hamas û Hizbullah jî hene – rêxistinên şîddetê bi kar tînin jî û yên qaîdeyên demokrasiyê qebûl dikin jî. Yekane nuqteya wan a hevpar ew e ku xwe weke alîgirê şîrovekirineke dînê îslamê didin nasîn û wê ji bo çalakî û kirinên xwe yên siyasî dikin rehberek.

**Birayên Musulman**
Ev rêxistina herî bi bandor e. Ew in malzaroka pirraniya komên îslamîst jê çêbûyî, heta yên herî radîkal jî. Sala 1928'an ji aliyê Hesen el-Bannah ve hat damezrandin, şaxên xwe li cîhanê berdan û li gelek welatên ereb "baskên" wê hene yên ku di rastiyê de ji hev serbixwe ne (1). Para bêhtir muhafazekar in û ji bilî li Filistînê şîddeta çekdarî red dikin.

**Selefîzm**
Ji rêxistinekê bêhtir tevgerek e ku gelek cihêtiyan di nava xwe de dihewîne. Ev tevger banga vegera sineta Pêxember Mihemed û eshabiyên wî dike (selef gotineke bi erebî ye û maneya wê "pêşî" ne). Gelek caran wehabîtiya suûdî bandor lê kiriye. Selefîst beriya her tiştî pêre mijûl in ka li gorî şerîetê çi helal û çi heram e. Bi pirranî xwe ji qada siyasetê dûr digirin û tevî vîzyoneke muhafazekar di warê civakî de, qada têkoşîna wan ji nû ve misilmankirina civakê ye. Komeke keviyê ya piçûk a cîhadîst ku ji selefîzmê peyde bû, banga şerê çekdarî dike, di el-Qaîde'yê de xwe dide xuyakirin (2).

**Sofîtî**
Ev tevgereke mîstîk a misilman e, di terîqetên ji aliyê mezinên rûhanî ve damezrandî de bi rêxistin in. Sofîtî jî xisleta wê pirrengiya wê ya gelekî dewlemend e. Li Rojava, li cihê ku dijberiya îslamîzmê heye, gelekî bi başî nav û dengê wê belav e. Lê rastî ji vê gelekî bi tevlîhevtir e. Weke mînak li Mexreb'ê rêxistina Şêx Abdulselam Yasîn a bi navê el-Adl we el-Ihsan (dad û qencî), desthilatdariyê û hêzên serxwe yên muxalif xwe bi zor li vê rêxistinê radigirtin. Ji Hesen el-Banah heta bi Hesen Tûrabî yê sûdanî, weke gelek lîderên îslamî, rengê tecrûbeyên sofî yên damezrênerê wê li vê rêxistinê ketiye.

---

(1) Bixwîne: Wendy Kristianasen, "Une internationale en trompe-l'œil (Înternasyonaleke xapandina çêv)", Le Monde diplomatique, Nîsana 2000'î.

(2) Bixwîne: Wendy Kristianasen, "Qu'est-ce que le salafisme?", Le Monde diplomatique, Sibat 2008'î.

www.arsivakurd.org

# Birayên Musulman ên Rojava

JEAN-PIERRE FILIU

Birayên Musulman ji du nifşan ve li welatên ewrûpî torên xwe pêş de xistine. Wan di vî warî de kapasîteyeke mezin a rêkxistin û mudaxeleyê gihandine hev û bi vî awayî wan kêsayetiya di warê anîna endamên nû de xistine di ber de. Wan karîbû xwe bikin muxattabên sereke li cem desthilatdarên giştî, ne tenê weha, bi sazkirna konseyeke ewrûpî ji bo fetwayan û lêkolînê (CEFR) wan sebaret bi pêvajoya întegrasyona ewrûpî gav avêtin pêş, tevî ku di Yekîtiya Ewrûpa'yê de pirsên olî ji selahiyetên neteweyî dimînin. Civaknasa li Zanîngeha Louvain'ê, Brigitte Maréchal, bi navê "Rêwîtiyeke li Welatê Birayan" pirtûkek pir bi belge, ku tabloyeke ji du rengên cuda ye, pêşkêşî me dike: Avabûnên hişk li cem hinekan û wêrekiyeke konseptûel li cem hinekên din (1). Ew awayê, ku ev rexistin nahêle projeyên ji bo jiyana çandî û civakî ya tevlihev xweş here û asteng dike, wesif dike. Lê pêşbirka digel pêlên din, bi taybetî selefîst, rêxistin neçar hiştiye reseniya xwe biçesipîne û Marechal dibîne ku, "tevger, carinan bêyî ku bixwaze, kesayetiyên bi otorîte û serbixwe diafirîne ku, Birayan derbas dikin, lê jiyana rêxistinê jî dirêj dikin."

Bi vî awayî, statûya mafê kesan a îslamî li Ewrûpa'yê Birayan mobîlîze dike ku, ew jî dixwazin bi riya CEFR'ê plûralîzma legal teşwîq bikin. Di Sibata 2008'an de, ji Arşuvêkê Canterbury vexwendinek ku ne li bal bû ji bo dîdarekê ji wan re hat ku dawî bû sebeba tengaviyê. Di lêgerîna referansên rûhanî de ku di nav xelkê Musulman yê civakên rojavayî de peyda dibin, Şêxê Misrî Youssef Qardhaoui cihekî gelek ber bi çav digire. Tevî ku, ew di sala 1926'an ji dayîk bû ye û ji hêla dîrokî ve ew ji Birayên Musulmanan dihê jimartin û ew bi dehan salan ve li Qatar'ê dimîne, ewî zaniye, bi saya televîzyona satelîtî û înternetê cihekî bi rûmet li seranserî cîhanê ji bo xwe çêbike. Pirtûka kollektîf ku ne ji mêj ve li ser wî hatiye nivîsandin bi sernavê bi wate "Muftiyê Global" aliyên cihêwaz yê vê "diyarde" yê wesif dike (2).

Qardhaoui, Serokê CEFR'ê, alîgirê "jurisprudensek'a (îçtîhat) hindikayiyan" e, ya ku şerîatê întegreyî çarçoveya legal a welatên Yekîtiya Ewrûpa'yê dike. Ew alîgirê înstîtîsyonalîzekirinek a hîn ji pêşî de ye. Qard- haoui nêşan dide çi qas otorîteya van kesayetiyan bi têkiliyên di gel deshilatdarên giştî yên ewrûpî dihê avakirin. Li hember firekçandîyeke huqûqî (3), Tareq Oubrou, Îmamê Mizgefta Bordeau'yê, bi ser ku ji nav tevgera "Bratîst" dihê, pêşniyar dike ku rûhiyeta huqûqa fransî derbasî şîretên olî bibin. Ev "şerîeta hindikayiyan" dixwaze wek "Dêra Gallicane" otonom be, heta dixwaze ku bi rêzgirtina ji serdestiya rêbazên komarî re, xwe "layik" bike. Di pirtûkeke dîdaran de digel du nivîskarên fransî û belçîkî, ku eşkere xwe didin naskirin yek wek "bêbawer" û yê din wek "Musulman", Oubrou misoger vebirî dike ku; "mafê Musulmanan mafê fransî [ye]"û ew li hember xwestekan derdikevin ji bo ku "her tim berê Musulmanan (yên Fransa'yê) bidin derve" radibe. Ew hîna dûrtir diçe: "Çênabe ku Filistîn li ser hesabê jiyana me ya olî be, heta ne ya civakî be, li vir li Fransa'yê, ne jî têkiliyên me digel cihûyên Fransa'yê li ser me ferz bike." Her bi vê mantalîte, ew dîbîne ku divê hemwelatiyê wî yên Musulman Şoha'yê (qira cihûyan) nasbikin, ji ber ku, "wekî welatiyên ewrûpî, divê em ji vir û pê ve vê dîroka trajîk a Ewrûpa'yê li ser xwe bigirin." Ev nasnameya ewrûpî, Qubrou bi xurtî daxwaz dike, lê ev yek ji wan îmamên Fransa'yê yên hindik in, ku yek ji diduyan xwedî hemwelatiya fransî ne. Beriya ku li Bordeaux'yê bi temamî bi cih bibe, wî li Pau'yê, li Nant'ê û li Limoges'ê rêberiya olî kiriye, her weha di zindanan de. Perwerdeyiya olî ku xwe bi xwe kiriye û xwendina dermannasiya îndustruel, ku di ber de kiriye, hiştin ku ew hin destpêkên xwe yên dogmatîk di dema ciwaniya xwe ya milîtaniyê de red bike. Ew vê yekê bi "sefîhtiyek rast" wesif dike. Ew bi xurtî dibêje: "Cîhadiyên ku, bi şaştî ev nav di çapemeniyê de li wan dihê kirin, ew tenêg gunehkar in."

**Wergera ji fransî**
**Shergo Omar**

(1) Brigitte Maréchal, Les Frères musulmans en Europe,(Birayên Musulman li Ewrûpa'yê) PUF, Paris, 2009, 312 rûpel, 26 euro.

(2) Jakob Skovgaard-Petersen et Bettina Gräf (sous la direction de), Global mufti, the phenomenon of Yusuf al-Qaradawi, Columbia University Press, 2009, 262 rûpel, 35 dollar.

(3) Tareq Obrou, melle, Albin Michel, Paris, 2009, 252 rûpel, 16 euro.

# Li Misir'ê çîna nû û şoreşa civakî

ALAIN GRESH

Di pûşbera sala 1967'an de, artêşa îsraîlî êriş dibe ser komên koalîsyona ku ji hêzên Misir, Sûrî û Ûrdûn'ê pêk dihat û wan têk dibe. Vê dîrokê ne bi tenê têkçûna xeyalên yekîtiya herêmê destnîşan dikir, her weha serokê misirî Cemal Abdul Nasir jî tîne hişê mirov. Wê ne bi tenê têkşikestina nasyonalîzma ereb û destpêka bilindbûna îslamiyeteke polîtîk a bi şêweyên cihêreng îmze dikir û ne jî bi tenê destpêka tevgereke muhafazakar a cîhadeke cîhanî diyar dikir. Her weha, ew dihê wateya hewl û daxwazeke xurt a veguherîna civakî ya Misirê, damezirandina aboriyeke netewî ya serbixwe, bigewdekirina civakek bêhtir wekhev û bêhtir dadperwer.

Me ji bîr kir em behs bikin, "zabitên serbest" ên di bin birêveberiya Nasir de, di tîrmeha sala 1952'an de qral (keyser) Farûq ji ser text dixin û her weha nema xeyalên "Azadkirina Filîstîn'ê" dikin, an jî dev ji serencamên derveyî ber didin. Pêşî ew dixwazin monarşiyeke xerabûyî bi temamî di bin erdê xin û digel vêya dawî li serdestiya brîtanî bînin, ji bo damezirandina Misireke xurt û nûjen ku ji rêza paşdemayînê derket. Ji sala 1960'î û pê ve, berî hemû tiştî ew riya reformeke kiştûkaliyê didin ber xwe, xwe dajon nava nêrîna "sosyalîzma ereb", her weha pê re jî partiyeke aboriyê bi netewebûnê dikin, bi ya pergala sovyetî endustiriyeke xurt sazkar dikin, ku wê demê ev yek ji bo pêşketinê nêrîneke baweriyê pêşkeşî cîhana sêyemîn dikir. Ev şoreş bi çînên birêvebir ên kevin ku li derve hatibûn hiştin xwe dide diyarkirin: ku ev "feodalên" gundî û bajarî yên di nava bajaran de girêdayî rejîma kevin bûn. Şoreş bi bernameyên berfireh ên di warê perwerdehî, tendurustî û bi derfetên demokratîk ên ketina zanîngehê û bi zagonên civaka pêşverû û bi zêdekrina hejmara karmendan derdikeve holê û perepêş dibe: di sala 1962'an de, bi derxistina zagonekê re hemû mezûnên zanîngehê di karmendiya gelêrî de peywir werdigirin. Lê belê ve pakirina reel a rewşa kesên bêhtir xizan û livbaziya herî mezin a civakî digel pêkanînên otorîter -partiya tekane, çewisandinên sendîkayan- û digel zêdekirina servîsên îstîxbaratê dimeşe.

Yûsûf Şahîn di fîlma xwe ya bi navê Beytik (Le Moineau-1972) de sînorên pergalê gelek baş anîbû ziman: xerabûn û berjewendiya di bin sloganên sosyalistan de nixamtî. Piştî têkçûna sala 1967'an, Nasir biryara lidarxistina nîqaşekê dide da ku bi awayekî lez û bez ev nîqaş li ser mijara "çîna nû" were kirin. Reforma kiştûkaliyê newekheviyên din û kapîtalîzmeke bejî (çolterî) derdixe holê ku bes hindikahiyekê jê sûdê werdigirt û piraniya giran ku ji gundiyan pêk dihat ji axê bêpar dima. Di nava bajaran de, bazirgan û rahijmend bi birêvebirên dewletê û karmendên payebilind re hevkariyê dikin ku ev karmend bi giranî zabit bûn- ku di sala 1967'an de, ji 26'an 22 kes waliyên herêmî û ji sisêyan yek jî wezîr bûn- li dora zagonan dihêwirin û serwetekê bi gewde dikin. Partiya yekane û birêvebirî bêhtir navbeynkarî dike di navbera dewlemendan de, û livbaziyên civakî her dihên tengijandin.

Ev hemû "diyarkirin" rê li ber tundreviyeke gotegotê vedike: pêdiviya partiyeke pêşeng (avangard), livbaziya çîna karker û gundiyên xizan, rola rewşenbîrên şoreşger. Ji sala 1968'an û bi şûn de, Misir dikeve nava livbaziyeke berfireh ku ev livbazî ji Amerîka'yê ta Vîetnam'ê cîhana sêyemîn dabû ber pêlên xwe.

Digel vê yekê, hêz û erkên şoreşa Nasirî têkdişikên. Rejîma qelsketî naxwaze (an jî nikare) xwe nû bike û tundiya xwe hinek daxîne jêr. Di îlona sala 1970'ê de dema ku Nasir ji ber krîza dil jiyana xwe ji dest dide, çi alavên "dijraberiya şoreşekê" hene hemû cihê xwe werdigirin. Zilamê ku cihê wî werdigire, Enwer Sedat wê dest bi veguherînekê bike: hevbendiya bi Dewletên Yekgirtî re, serbestkirina aborî (înfîtah). Serdema şoreşan bi dawî dibe, bi tevî ku her tim berxwedaneke jîndar heye jî êdî "çîna nû" digel têgiha bêrêziyê xwe dike ser zar û ziman.

**Wergera ji fransî**
**Rıfat Arya**

www.arsivakurd.org

URDUN

# Krîza nasnameyê li cem Îslamiyan

VICKEN CHETERIAN*

Pêşketina bihêz, a Hamas'ê ku di van salên dawî de pêk hat -bi taybetî ji serkeftina wê ya Çile ya 2006'an û vir ve, ew bûye parçeyeke hilbijartinên giştî- li ser axa ku ji aliyê Israîl'ê ve hat dagirkirin, wekî li ser diyaspora filîstinî heye, li ser jiyana siyasî ya Urdun'ê jî ew bûye xwedî bandoreke girîng. Bi taybetî di nava rêxistina Birayên Musulman de ev rastî pirtir dixuye. Ji ber ku Birayên Musulman hêza sereke ya vî welatî ye û bûye sedem ku di nava rêxistinên filistînayan de û di barê têkiliyên bi hukûmetê de nakokî çêbibin.

Bi ya birêz Abdel Latif Arabiyat, yek ji rêveberên dîrokî yê rêxistina Birayên Musulman beşa urdunî ye, bandora daxuyaniyên çapemeniyê, yên di barê pevçûnên navxweyî yên di nava serokatiya rêxistina wan de, bûne sedem ku ew bixwazin rewşê germ bikin. Digel hemû tiştan, ew qebûl dike ku, di barê nakokiyên navxweyî de, ew bûne xwedî gumanan û di nava rêxistinê de nêzîkatiya du beşan; "baz" û "kevok" derketiye holê.

Ev krîza ku di havîna 2009'an de derket holê, li ser hêza polîtîk a sereke ya vî welatî, ku rewşa wî hessas e, di demeke dijwar re derbas dibe. Bi wendakirina serdestiya xwe ya li Başûrê Şeria'yê, di dema şerê Pûşber a 1967'an de, wê demê herêm ji Rêxistina Azadiya Filistînî (OLP) re hişt û nikaribû careke din heman serdestiyê bi dest bixe, monarşiya haşîmî dizane ku pêşeroja wê ya siyasî di çareseriya pirsgirêka filistînî re derbas dibe. Serjimeriya vî welatî, ku ji 6 milyonan zêdetir e, di nava xwe de bûye du parçe: Ji du urduniyan yek penaberê filistînî ye.

Beşa Urdun'ê ya Birayên Musulman di sala 1946'an de, sala ku Qraliyeta Haşîmî serxwebûna xwe bidest xist, bi awayekî fermî hate damezrandin û ji bo monarşiyê, di demeke dirêj de, bû alîkariyeke girîng. Di sala 1970'an de, dema ku fedaiyên filistînî li dijî desthilatdariya Qral Huseyîn derketin (Elûna res) (1), Birayên Musulman xwestin "bêalî" bimînin, di encama heman pêvajoyê de wan peywira pir wezaretan jî bi dest xistin. "Hevalbendî rêxistineke şoreşgerî nebû, ew tenê ji bo seqemgîrî pêwîst bû. Bi pêşketina partiyên nijadperest û çepgir, me bi rêveberiyê re hevalbendiyekê nefermî ava kir." Ev gotin yên birêz Abdel Latif Arabiyat in, ew bi xwe wezîrekî berê ye û ji parlementoya Urdun'ê re jî berdevkî kiribû.

Di hilbijartinên parlamentoyê, ên 1989'an de, hevalbendiyê ji 80 parlemenan 22'yan stendin û bû hêza herî girîng a Parlamentoyê. Lê belê peymana aştiyê, ku di sala 1994'an de di navbera Urdun û Israîl'ê de hate îmzekirin, bû sedem ku rexneyên wan li hemberî rêveberiyê tûjtir bibin, nemaze ji mirina Qral Huseyîn û hatina Abdullah II, di 1999'an de, şûn de, têkîliyên bi rêveberiyê re zêdetir xerab bûn, Ji ber ku rêveberiya nû Hamas qedexe kir û pir rêveberên wê jî ji welat dûr xistin. Yek ji lêkolînvanên di warê tevgerên îslamî de birêz Hassan Abou Hanieh weha bi bîr tîne "Ji bo Qral Huseyîn, Birayên Musulman mijareke siyasî bû, lê belê ji bo Qral Abdullah II ev pirsgirêkeke ewlekariyê ye."

Li dijî Hamas'ê tenê di nava rejîmê de nakokî pêknehatin; Her weha wî êrişên li dijî hevalbendiyê jî zêdetir kirin. Di 2006'an de, piştî beşdarbûna di merasîma cenazeya Abou Museb Al-Zarqawî de, yek ji nûnerên sereke yên Al-Qaida ya Iraq'ê, du parlementerên Birayên Musulman hatin girtin. Di heman salê de, rayedarên dewletê kontrola navenda alîkariya îslamî, ya nexweşxaneyan, ya klînîkan, ya dibistanan û ya wargehan hêtîman girtin bin destê xwe. Rayedarên dewletê, rêveberên vê rêxistinê, ya ku wekî "dewleta di nava dewletê de" dihate naskirin, bi neqanûniyê tewambar kirin, lê belê tu car wan heman doz nekirin mijara dadgehan. Alîgirên vê rêxistinê ji sendîkayên xwendevanan, ji rêveberiyên şaredariyan û ji mizgeftan hatin derxistin. Bi ya berdevkê Birayên Musulman, birêz Jamal Aboubaker "ji bo me tu saziyeke bibandor nemaye. Em xwe di rewşeke darbeya leşkerî de dihesibînin. Sedemeke tenê ya vê rewşa ku em tê de ne heye; ji ber ku em hêzeke girseyî ne û ji aliyê gel ve dihên hezkirin û pejirandin."

Di hilbijartinên 2007'an de, hêza Eniya Çalakiya Îslamî, ya ku wekî vîtrîna Birayên Musulman hatiye naskirin, hat kêmkirin. Piştî kiryarên nelirê yên cur be cur, bi taybetî di qanûna hilbijartinan de, tenê 6 parlementerên wê mane. Ev rewş bû sedem ku Qral bi tena serê xwe bikaribe parlementoyê fesih bike, di sala 2009'an de, bêyî ku dîroka hilbijartinên nû were diyarkirin. Bi ya mudurê Navenda Lêgerînê ya Al-Quds, birêz Oraib Rantawi "zexta ku bîst salan berê li dijî hêzên çepgir dimeşiya, îro li dijî rêxistinên îslamî dihê meşandin."

Li Urdun'ê, siyaseta derve qasî pirsgirêkên navxweyî girîng dihên dîtin. Li wê derê, ji protestokirina neheqiyên ku di dema hilbijartinan de çêbûyî, an jî nerazîbûnên di barê bêkariyê de zêdetir, mirov dikare pirtir xwepêşandanên di barê doza filistînî de, her weha yên di barê piştgiriya bi Iraq'ê re bibîne. Ji ber vê yekê, ji aliyê refên rêveberiyê ve dihê gotin ku, wê hinekî bizehmet be ku bandora Hamas'ê di nava civaka filistînî de pêş bikeve. Mînak, rêveberiya Amman'ê, di dema pevçûna navxweyî ya di nava rêxistinên filistînî de, bi awayekî fermî piştgiriya rêveberiya filistînî, ya ku di bin serokatiya birêz Mahmoud Abbas de kir. Dê ev jî were zanîn ku, piraniya alîgirên hevalbendiyê ji filistîniyan pêk dihê û parçeyeke wan xwe nêzîkî Hamas'ê dike.

Ji vê demê bi şûn de, nîqaşeke dualî di nava rêxistinê de dimeşe: digel daxwaza gel a ji bo pêvajoya hilbijartinên demokratîk, di vê demê de ku dewlet dixwaze hejmara nûnerên wan kêmtir bike, gelo pêwîst e ew tev li hilbijartinan bibin an na? Rêxistin bi eslê xwe "urdunî" ye an "filistînî" ye?

Van antagonîzmana di Tebax a 2009'an de xwe baştir nîşan dan, bi taybetî bi alîkariya raporeke navxweyî ku rêveberiyê bi "tevlêbûna projeyeke amerîkî-siyonîst ku armanca wê pelçiqandina pirsgirêka filistînî bû (2)" tewanbar kirin. Bi awayekî paradoksal, zexta ku hat meşandin bû sedem ku serekên ciwan û yên zêdetir radîkal bikaribin bibin xwedî cihên girîng. Destnîşankirina du "bazan", birêz Zaki Bani Arshid, di 2006'an de, wekî serokê Eniya çalakiya îslamî û birêz Hamam Saîd, ji bo cihê "rêkxistina giştî" ya Heval- bendiyê, di Nîsan a 2009'an de, bû sedema destpêkirina pêvajoyeke girîng di dîroka tevgerê de. Di 60 salan de, ev cara yekem e ku urduniyekî bi eslê xwe filistînî dibe xwedî berpirsiyariyeke weha girîng.

Birêz Bani Arshid, di barê wê neheqiyê de ku, bi rêya çapemeniyê li dijî wî dimeşe, nerazîbûna xwe weha aniye ziman : tenê ev nebûye sedem ku ew nikaribe xwe îfade bike, her weha ew wî wekî kesekî pir radîkal nîşan dike: "Ez nijadperest nîn im, ez nûneriya xeteke navîn dikim. Baweriya min bi reforman (guherînan) heye û ez bikaranîna şiddetê û terorîzmê rexne dikim." Bi van gotinan girêdayî wî da xuyan ku ew ferqekê dixe navbera "terorîzmê" û "berxwedana li dijî dagirkeriyê." Di barê hevkariya bi Hamas'ê re jî wî weha got "Dema ku Hamas li Urdun'ê bû têkiliyên min ên rêxistinî pê re hebûn. Lê belê ji 1999'an vir ve, tu têkiliyên me pê re tune ne." Birêz Bani Arshid, her weha da xuyakirin ku di nava tevgerê de jihevqetandineke di navbera "filistînî" û "urduniyên rojhilat" de heye.

Nebûna çareseriyekê ji bo pirsgirêka filistîn, bûye sedem ku li Urdun'ê tirs hebe û li paytexta vî welatî atmosfereke neyînî serdest be. Ji hilbijartina birêz Benyamîn Netanyahû, ya 2009'an û vir ve, Amman ditirse ku wê Israîl nihêrîna di barê "welateke alternatîv" ji bo filistîniyan derxîne pêş. Wê were zanîn ku parçeyeke rastgirên îsraîlî dibêjin ku Urdun welatê filistîniyan e. Her weha ew ditirsin ku, ji bilî dijwartirkirina jiyana filistiniyên ku di axa dagirkirî de dijîn, Israîl tu tiştekî neke, û wê bibe sedema koçbûna zêdetir filistiniyan ber bi Rojhilatê Urdun'ê ve.

Filistîniyên li Urdun'ê, bi giranî, di barê rewşa birayên xwe de têkildar in û ew dixwazin ku rojekê zû çareseriyekê rast bi Isarîl'ê re were dîtin. Lê belê, heger rojekê hemû hêviyên wan wenda bibin, ewê zêdetir xwe tev li mijarên siyasî yên navxweyî yên Urdun'ê bikin û pirsgirêka hemwelatiyê derxin pêş. Heya niha ev xal ji bo wan zêde nedihat rojevê. Ewê bixwazin ku di nava saziyên girîng de, yên wekî parlemento û artêşê, bibin xwedî cih. Bê guman di vî warî de ew ê bi derdorên elîtên siyasî û leşkerî yên urdunî re bikevin nava pêşbaziyê. Heger rewş weha bibe, tirs heye ku di nava girseya gel de radîkalî zêdetir pêşbikeve, bi taybetî di nava derdorên siyasî yên musulman de.

Pirsa di barê qelsiya Birayên Musulman de wê bibe sedem ku derdorên Salafî-Cîhadî, yên ku niha şîddetê bi kar tînin, zêdetir xwe xurttir bikin, ji niha ve ketiye rojevê. Lêkolînêr Osama Shahade, ku ew bi xwe jî mîlîtanekî Cîhadî ye, qebûl dike ku nakokiyên di navbera rayedarên urdunî û hevalbendiyê de ji niha ve valahiyekê pêk aniye; lê belê, bi ya wî, "Salafîyên li Ur-

** Rojnamevan, nivîskarê War and Peace in the Caucasus: Russia Troubled Frontier, C. Hurst-Columbia University Press, New York.*

www.arsivakurdi.org



*Kadir Akyol, 160 x 130 cm*

dun'ê hêzeke baş rêkxistî nîn in ku bikaribin encamekê bi dest bixin." Mohammed Abou Ramman, pisporê di barê rêxistinên îslamî de û rojnamevanê Al-Ghad, digot ku Birayên Musulman, bi awayekî aşkere Al-Qaida'yê şermezar nake "Ew li dijî kuştina sivîlan û ya kesên bê guneh derneketine." Heman pispor vê helwesta Birayên Musulman bi bandora Hamas'ê ve girê dide.

U wî balê kişand ser reqabeta li Urdun'ê ya di navbera van du hêzan û Salafiyan de heyî. "Ev hêz hewlê didin ku di nava alîgirên kevin ên Birayên Musulman de ji xwe re alîgiran çêbikin. Di dema borî de, di mizgeftan de, bi awayekî eşkere endamên Birayên Musulmanan û her weha endamên îstixbaratê jî dihatin dîtin. Lê belê îro, li heman deveran em dikarin Birayên Musulman, îstixbarat, Hizbut-Tahrir (3), Salafî, Cîhadî û hwd bibînin, bi kinasî, têkoşî tundtir bûye." Bi ya Abou Rahman, têkoşîna dewletê ya li dijî hebûna Birayên Musulman ku di camiyan de heye, hin encamên neyînî derxistiye holê. "Niha, di mizgeftên Amman'ê de, bi awayekî giştî nîqaşên di barê Al-Qaida'yê de dihên kirin", her weha, "ev tevgera ku ji aliyê girseyan ve nayê hez kirin, û marjînal bûye, niha dest pê kiriye ku derfetên xwe yên civakî ferehtir bike", ev rewş ji ber siyaseta arzîkirinê û her weha ya aborî, ku ji aliyê Qral ve ji 1999'an vir ve dihê meşandin, derketiye holê.

Azadbûna Abou Mouhammad Al-Maqdisi, di dawiya 2008'an de, bû sedem ku, di nava derdorên Salafî û Cîhadî de, polemîk careke din dest pê bikin û tansiyon geş bibe. Birêz Al-Maqdisi, şêwirmendê Zarqawî, serekê Al-Qaida ya li Iraq'ê, bi awayekî tund stratejî û rêbazên Al-Qaida'yê rexne kiribû. Lê belê, heya niha bandora wî, di nava tevgerê de, pir qels mabû, ku di nava heman tevgerê de ew wekî kesekî di bin bandora hêzên îstîxbarata Urdun'ê de dihate tewanbarkirin. Lê belê, ji azadbûna wî û vir ve, weha dixuye ku wî careke din baweriya mîlîtanan stendiye. Digel ku hin kêmasiyên alîgirên Zarqawî yên di aliyê zelaliya vîzyonê de û her weha di warê lîderekî karîzmatîk de hebin jî (4).

Bi ya Fahd Al-Khitan, analîstekî siyasî yê li Amman'ê, Birayên Musulman xwedî hêzê ne ku li dijî zextên derve û her weha li dijî atmosfera neyînî ya navxweyî li ber xwe bidin. Ji ber ku "Ji hemû partiyên din zêdetir, Birayên Musulman karibûn mekanîzmeyên demokratîk di nava xwe de pêş bixin." Digel zexta dewletê ku li dijî vê rêxistinê dimeşe, pir rêveberên wê nêzîkatiya pevçûna bi rayedarên dewletê re red dikin, Niha dihê pirsîn ku Birayên Musulman wê heta kengî bikaribin pêşî li nakokiyên xwe yên navxweyî bigirin. Û, di vê dema ku atmosfereke tund a civakî heye û her weha di vê dema nebûna çareseriyeke rast û pasîf aştiyane de, ji bo axa ku bi qasî çend gavan ji sînora Urdun'ê dûr, gelo wê kîjan hêza siyasî bikaribe ji vê rewşa marjînalbûna tevgera girseyî ya urdunî sûdê jê werbigire?

**Wergera ji fransî**
**Ahmet Dere**

---

(1) Di Îlona sala 1970'an de şerwanên filistînî ku li Urdun'ê bicîh bûbûn li dijî Îsraîl'ê dest bi çalakiyên çekdarî kirin. Mirê Urdun'ê Huseyîn, ji bihêzbûna filistîniyan ket gumanê û li dijî wan artêşa xwe xist tevgerê.

(2) Ali Abd al-Aal, "The Ghost of Division is Division is Following Jordan's Brotherhood", Islamyoon, 8 Eylül 2009,

http://islamyoon.islamonline.net/servlet/Satellite?c=ArticleA_C&cid=1252187873403&pagename=aslamyoun/IYALayout

(3) Partiya Urdun'ê ku di sala 1953'an de hat damezirandin li gelek welatan çalak e û ji nûh ve rêxistinkirina xîlafeta îslamî diparêze.

(4) Bixwîne: Mohammad Abou Rumman, "Jordan: al-Maqdisi wins int the first 'round' over the inheritance of al-Zarqawi", Al-Hayat, Beyrouth, 30 Mijdarê 2008,

http://international.daralhayat.com/archivearticle/231066

www.arsivakurdi.org

JAPONYA

# Li welatê ku roj lê hil dihê dîplomasiya Mîkado

MARTINE BULARD*

**Li heremeke ku çarenûsa wê nayê zanîn, Japonya diwxaze ku dewra wê ya navneteweyî bê naskirin. Lebelê hikûmeta Japon nikare ji Amerîka veqete. Dibe ku hikûmeta Japonya bedela vê mecbûriyetê di hilbijartinên meha tîrmehê de bi awayeke giran bide. (Serokwezîrê Japonya ji ber ku di hilbijartinan de sozê rakirina baregeha leşkerî ya Amerîka dabû û nikaribû ev soz pêk bîne hefteyên borî îstîfa kir. Notê LMD-kurdî)**

"Em nikarin cîranê xwe hilbijêrin, lê em dikarin hevgirên xwe hilbijêrin." Masaki Yasushi, wezîrê berpirsiyarê karên polîtîk a balyozxaneya Japonya'yê ya li Fransa'yê, bi kurtasî di vê wateyê de qala alternatîfên jeopolîtîk ên welatê xwe dike. Cîranên Japonya'yê yên mirov kêm hez ji wan bike hene: Rûsya ku ji nû ve bi hêz dibe, Çîn ku dengê xwe hil dide û Kore ya Bakur ku projeyên xwe yên nukleer diyar dike. Gelo Japonya jî wekî mînaka Fort Alamo ye ku bi tenê Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê wê diparêze? Ev îmaj her çend wekî karîkatûrekê be jî, elîtên Tokyo'yê, yên pirî caran heyranên Amerîka'yê ne, gelekî pê bawer in.

Tevî vê yekê, pencîhemîn salvegera di ber çavan re derbaskirina peymana ewlekariyê ya di navbera Japonya û Amerîka'yê de (US-Japan Security Treaty) (1) ku çarçoveya qanûnî ya têkîliyên her du welatan, û li ser erdên Japonya'yê bicîhkirina hêzên leşkerî yên amerikî diyar dike, di hewaya şahiyê de derbas nabe. Piştî deshilatdariyeke giştî ya ji 50 salan dirêjtir a Partiya Lîberal Demokrat (PLJ), hatina serokwêzîrê nû Hatoyama Yukio ji Partiya Demokratîk a Japonya'yê (PDJ) di Îlona 2009'an de, têkiliya di navbera herdu welatan de dijwartir dike. Ne ku daxwazeke wî ya bi dawîkirina hevgirtina her du welatan xwe daye der, lê belê niyeta xwe ya "normalkirina" têkiliyên bi Washington'ê re diyar kir. Dixwaze wekî her welatê serbixwe rêz ji welatê wî re jî were girtin. Di heman demê de ji bo afirandina "Civateke Rojhilata Asya'yê" têdikoşe. Gelo dixwaze ev civat berê xwe kêmtir bide rojava û berê xwe bêhtir bide rojhilat? Ev rewş derdorên rêveberiya aborî têra xwe ditirsîne û dijminatiya muxalefetê, ya beşeke mezin a rêveberiya îdarî - ku pir bi hêz e - û beşeke mezin a demokratan gurr dike.

Nîqaşên li ser baregehên leşkerên amerîkî yên bi navê Futenma hene ku li nava Ginowan bi cîh bûye. Ginowan bajarek e ku serjimara wê 90 hezar e û li ser girava Okinawa ye. Bi ya peymaneke di sala 1996'an de mohr kirî ku ber bi dawiya sala bihurî ve dema wê qediya, diviyabû ev baregeha leşkerî çend deh kîlometroyan ber bi bajarê Nago'yê ve bihata veguhestin. Lê şaredarê nû hilbijartî yê Nago'yê yê di hilbijartinên meha Çileya buhurî de bi ser ket, ev biryara peymanê qebûl nekir. Bes bû ku Hatoyama ji bo li cîhekî din ê veguhestina baregeha leşkerî bigere doza demeke ji bo ponijînê bike, da ku hêzên rêûresmê êrîş bikin... û bi ser kevin.

Di Cotmeha 2009'an de Wezîrê Parastinê yê Amerîka'yê, Robert Gates da xuyakirin ku "ne guncan e ji bo lihevkirina li ser cîhekî din hevdîtin pêk werin." Ji bo nîşandana nerazîbûna xwe, ew neçû xwarina fermî ku ji bo wî hatibû amadekirin. Di Wezareta Karên Derve (WKD) de ku gelekî piştgirtiya daxwazên amerîkiyan dike, her kes hîna jî matmayî maye. Rayedarekî payebilind ê dewletê li ber vê yekê weha radibe "Dîsa jî me hilbijartin pêk anîn" û sedemên ji bo "şertên peymanê bên bicîhanîn" dijimêre. Ma ne wezîrê wî Okada Katsuya, ji bo mana baregehên leşkerî rewa bike, behsa "polîtîkaya realîst" a li dijî serokwezîr dike? Ev lihevnekirina asta bilind, dike ku dîplomat û rayedarên payebilind nêrînên xwe bi awayakî anonîm diyar bikin. Çapemenî di riya Okada de dimeşe. Rojnameya mezin a çepgirên navendê Asahi Shimbun gotina pêşiyan a japonî bi kar tîne û dibêje: "Fermana imparatoriyê wekî xwêdanê ye (ku derket êdî tu carî venagere cihê jê hatî) (2)." Lewra veqetandina ji vizyona amerîkî ne guncan e.

Profesor Işida Idetaka, pisporê çapemenî û serokê Interfaculty Initiative in information studies – IIIS (Insiyatîfa navbera beşan a di lêkolînên agahiyê de), qet xeman naxwe: "nêrînên rojnameyan, tercîhên dîplomatan an jî yên hilbijartinan çi dibin bila bibin, lobiyeke xurt a amerîkî heye ku li ser her kesî bandorê dike. Ew li zanîngehên amerîkî hatine perwerdekirin, para bêhtir hev du nas dikin û hevalê hev in. Ew difikirin ku divê dorguherîna desthilatdariyê dêmdirêj bibe... û divê neguhere. Wekî ku tu riyeke din nebe. Divê mirov xwe ji vê teşeya fikrînê, ku me bi Amerîka'yê ve girê dide, xelas bike.

Da ku em karibin fêm bikin, çima zehmet e mirov li paşerojekê bifikire ku ne di bin desthilatdariya Amerîka'yê de be, divê em vegerin heta demên hema piştî dawîya Şerê Cîhanê yê Duyemîn. Bi ya Nishitani Osamu, li Zanîngêha Zimanên Biyanî ya Tokyo'yê profesor e; "hingî Amerîka îdealeke polîtîk bû. Piraniya gel Amerîka wekî Demokrasiyê didît." Ew, bi panzdeh kesên xwediyê heman nihêrînê, avakerê "manîfestoyekê" ye ku li ber mayîna Futenmayê li bajarê Osamuyê radibe. Mirov divê her weha dîroka dirêj a PLD (Partiya Lîberal Demokrat) li ber çavan bigire. PLD ji gelek aliyan ve girêdayî Amerîka'yê bû – di nava wê de elîta leşkerî jî hene, ku bi gunehbarên şer bûbûn û bi rehma Amerîka'yê hatibûn efûkirin.

Lê belê dem û dewran guherîn. Yek kadroyên ciwan ên şîrketeke telefonê û mîlîtanekî pasîfîst, Masami Honto dibêje: "Amerîka ji ber krîza aborî lawaz bûye, digel hevrikiya hêzên ku pêşdikevin rû bi rû ye, ketiye nav şeran ku ne yên me ne. Şerê sar xelas bûye lê 'ew' hîn jî wekî ku ev şer li ber devê deriyê me be, muameleyê bi me re dikin."

Rast e ku Japonya êdî di rêza aborî ya cîhanê de duyemîn e. Lê belê sala di 1947'an de dema bi zora general Mc Arthur, Japonya'yê destûreke bingehîn a pasîfîk ku şerkirin lê qedexe ye, qebûl kir, ew welatekî têkçûyî bû - her çend Japonya piştî demekê artêşeke bi navê "hêzen xweparastinê" avakiribe jî. Peymana ewlekariyê di navbera Amerîka û Japonya'yê de ku sala 1960'î hat sererastkirin, hebûna hêzên leşkerî yên amerîkî (heta 260.000 leşkerî) û girêdana Tokyo'yê bi Washington'ê re zexmtir kir. Peymaneke xwezayî di navbera her du welatan de pêk hat: "Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê xwediyê "keştiyeke firokeyan e, ku wê qet noqî avê nebe", û sûdeke mertalekî nukleer jî li arşîpela (koma giravan a) Japonya'yê dibe; Amerîka di heman demê de polîtîkayên xweparastinê yên Japonya'yê qebûl dike û bazara xwe ji berhemên japonî re vedike, Tokyo lêçûnên leşkerên Apê Sam (Dewletên Yekgirtî yên Amerîka) ku li ser axa wê ne, dide; Amerîka dîplomasiyê bi rê ve dibe, Japonya li pey diçe, ji ber ku dijminê hevpar ê her duyan jî komunîzm e. Êdî tu tiştek ji vê rewşa jeopolîtîk nemaye, lê peymana newekhev û nehevkêş hîna berdewam dike.

Di 22'ê Adara 2010'an de, Hatoyama di axaftina xwe de li hemberî kadroyên akademiya parastina neteweyî dilê xebatkarên xwe rehet û xweş kir: "Hevgirtina bi Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê re bingeha polîtîkaya derve ya Japonya'yê ye. (3)" Lê hevalên derdora wî wisa bersiv didin "em dixwazin danûstandinên di navbera me de heqtir bin" Hin ji wan buhayê xwedîkirina garnîzonên amerîkî bi bîr dixin – di salekê de nêzî 3 mîlyar dolar - û li aliyê din lihevderneketina budceya Japonya'yê zêde dibe ku ev yek tiştekî nedîtî ye.

Nîşaneke din a serweriya ji serdemeke din mayî, ev e: Ji Leşkerên Dewletên Yekgirtî yên

*Rojnamevan.

www.erse-kurdi.org

Amerîka'yê re qanûnên taybet ên îstîsnayî hatin derxistin. Şêniyekî bajarê Naha (ser bi Okinawa ye) weha dipeyive: "Dema qezayek di rê de rû bide, mekîneyeke spî ya polêsan dihê cihê qezayê û dûv re mekîneyeke reş û spî – ya polêsên leşkerî yên amerîkî ku bi tenê destûra wê heye di pirsgirêkên giredayî leşkeran de dest werde." Gelê herêmê ji dil behsa gunehên leşkerên amerîkî dikin yên ku çi qasî giran jî bin, nehatine dadgehkirin (destavêtin, qezayên li ser riyan, dizî...)

Senator Fujîta Yukîhîsa ku serokê giştî yê Ofîsa Navnetewî ya PDJ'yê ye, îşaret pê dike ku "Yekane welat ku bi Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê re xwediyê hevgirtineke bi vî rengî ye, welatê me ye." Senator dibêje ev "dîtina min a şexsî ye" yek ji kêm hilbijartiyan e ku pişgirtiya fikra guhertinê dike. "Di destpekê de armanc parastina Japonya'yê bû. Lê ji dema dawiya şerê sar û vir ve, sûda peymanê bi tenê li stratejiya Amerîka'yê dibe", wekî mînak li "şerên wê" yên li Iraq û li Afxanistan'ê. "Belê, divê em bi Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê re kar bikin, lê bi awayekî din." Senator îddîa dike ku têkîliya di navbera her du welatan de divê zelal be- behsa "peymanên veşartî" dike ku sala 1969'an ji aliyê Serokê Amerîka'yê Richard Nixon û serokwezîrê Japonya'yê Sato Eisaku ve hatine mohr kirin. Ev Peyman heta Adara sala 2010'an veşartî mabû. Adara 2010'an komîsyona, hukûmeta nû ew wezîfedar kir, rapora xwe ya li ser peymanên veşartî, eşkere kiribû.

Li welatekî ku bi bombekirina Hiroshima û Nagasakiyê trawmatîze bûyî, li aliyê rastê rêzdar Sato sisê prensîbên li ser çekên nukleer, ku hîna jî di meriyetê de ne, dabû qebûl kirin: "Ne hilberîn, ne xwedîbûn, ne jî destûrdana hebûna çêkên nukleer li ser axa Japonya'yê." BerambeRî vê yekê, Sato xelata Nobelê ya Aştiyê sala 1974'an wergirt. Li aliyê çepê, serokwezîr Sato serbestiyeke temam a tevger û manevrayê dabû Amerîka'yê: Bikaranîna baregehên leşkerî di wexta şerên bi welatên derve re, bêyî destûra rayedarên Japonya'yê (tevî ku peymana fermî Amerîka'yê mecbûr dike destûrê ji Japonya'yê bixwaze), depokirina çekên nukleer... Ji bo gelek pispor û rêveberên siyasî ev êdî "peymaneke veşartî" nebû, ji zû ve wan pê dizanî. Lê belê ji bilî aliyê komunîst û aşitîxwazan, bêdengî heta 40 sal di ser re bibihurin, bûbû qanûnek.

Îro jî zehmet e mirov her tiştî eşkere bike ji ber ku pozîsiyona pir tişt û pir kesan bi awayakî rêkûpek nehatine qeydkirin. Xetek di navbera alîgirên serxwebûnê û alîgirên Amerîka'yê de derbas nabe. Di nava yên ku dixwazin xwe ji Amerîka'yê xelas bikin de netewperestên rastgir ku mîlîtarîstên ji dil in û carinan jî ew mirov in ku bi nostaljîya imparatoriya beriya şer dijin. Ji bo wan ji nû ve bazarkirina peyamana bi Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê re, şansek e ji bo xwe ji "îstîsnabûna" Japonya û ji destûra bingehîn a pasîfîst xelas bikin - xala navdar a 9. ku destpêkirina opêrasyonên êrîşkar qedexe dike (4) Rêveberiya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê ji bo barê xwe yê leşkerî siviktir bikin, piştgirtiyê dide ji nû ve çekdarbûna bi lez a Japonya'yê, ji hingî ve bi awayekî mirov matmayî bihêle serxwebûnxwaz û alîgirên têkiliyên xurt ên bi Washington'ê re hev digirin. Wekî Nishitani dibêje, "di dinyayê de yekane (yan jî hema hema yekane) welatê xwediyê destûreke bingehîn a pasîfîk, welatê me ye, lê em di lîsteya welatên mesrefên wan ên leşkerî zêde de, pêncemîn welatê cîhanê ne."

Ji salên 1990-1991'ê ve - dema yekemîn şerê kendavê – her çend Amerîka'yê jê xwestibe jî Japonya'yê nikarîbû leşkerên xwe bişîne - hukûmetên japon qanûnên xwe her tim guhertin (di salên 1992, 1999 û 2001'ê de) da ku destûrê bidin operasyonên li derveyî welêt. Lê belê ev operasyon di çarçoveyeke teng de dimînin û bi tenê ji bo misyonên parastina aştiyê, ji bo projeyên alîkariya insanî, yan jî ji bo çavdêriya hilbijartinên di bin rêveberiya Neteweyên Yekgirtî de dikarin bên rêvebirin. Wekî encama vê rewşê jî qeşmerî kirin da ku tiştên nayên qebûl kirin, bidin efûkirin.

Dema leşker şandin Kamboçya, Mozambîk yan jî Ruwanda'yê ev yek hindikî hatibû rexnê kirin, lê ber bi Iraqê ve şandina leşkeran wekî veqetîneke bi rastî ya ji bêdengiyê bû. Keştiyên artêşa Japonya'yê yên cebilxane barkirî di okyanûsa Hindê de ji bo alîkariya balafirên NATO'yê yên li Afxanistan'ê, hatibûn şandin, vê yekê jî deng veda. Hatoyama soza xwe bi cîh anî û ev alîkarî di

Çileyê sala 2010'an de bi dawî kir. Lê belê pêşvexistina mertalê li dijî mûşekan di okyanûsa Pasîfîk'ê de, bi hevkariya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê re hîna jî di rojeve de ye. Wezîrê parastinê, bi piştgirtiya hempîşeyê xwe yê wezareta karên derve re, daxwaza x

we ya şandina leşkeran ber bi derveyî welêt we û gav bi gav "paqijkirina" destûra bingehîn venaşêre (5). Lê berevajî vê yekê, her du partiyên piçûk yên koalîsiyona heyî ya hukûmetê, Partiya Sosyal Demokrat û Partiya Nû ya Gel, li ber vê radibin. Her çend hêzên aşitîxwaz bi qasî demên berî xurt nebin jî hîna çalak in (6). Di vê çarçoveya nediyar de, Hatayoma di dawî de li ber zora amerîkaperestan serê xwe tewand û plana sala 1996'an ji Okînawa xiste meriyetê (7).



*Kadir Akyol, 30 x 160 cm*

### Barê dîrokê hewldana Niponn'ê asê dike

Bi ya senatorê demokrat Fujîta divê "statuya peymana ewlekariyê ya di navbera Amerîka û Japonya'yê de cardin bê nirxandin. Divê arteşa amerîkî bimîne lê divê endamên wê û cihê wê ji nû ve bên nîqaşkirin. Divê hejmara baregehên leşkerî were kêm kirin." Bi ya wî herî kêm "du sedemên li wir mana Amerîka'yê hene. Li aliyekî welatê me têra xwe xwedî hêzên leşkerî nîne. Hêza me têrê dike ku em xwe ji nû ve çekdar bikin, lê ev yek di bernameya me de nîne. Li aliyê din jî eger bibînin ku Japonya xwe çekdar dike, vê yekê wê welatên cîran bitirsanda. Dilê wan niha rehet e, lewra dibînin em hevkariyê bi Dewletên Yekgirtî yên Amarikayê re dikin."

Gelo Washington li Asya'yê garantiya ewlekarî û aşitiyê ye? Ne misoger e ku cîranên Japonya'yê hemû wisa difikrin. Lê belê hemû wê bi awirekî xirab li Japonya'yeke daxwazên wê yên çekdarbûnê hene, binihêriyana. Ji xwe di sala 2000'î de, Serokwezîr Koizumi Junichiro bi awayekî sîstematîk diçû serdana Perestgeha Yasukuni cihê ku gorên gunehkarên şer lê ne. Ev yek bû sedem ku li Çîn û Kore ya Başûr protestoyên mezin pêk werin. Piştî van bûyeran, "provokasyonên" bi vî rengî êdî qediyan. Lê Ishida diyar dike ku dîsa jî Japonya'yê "hîna helwesta xwe ya li beramberî dîrokê nehatiye sererastkirin." Ev tespît pir caran di devê dîplomat û pisporan de ye û li peşiya pêkanîna projeya Japonya'yê ya asyayî, astengek e. Tevî ku ev proje yek ji daxwazan li pêş a Japonya'yê ye jî. Hatoyama eşkere kir ku ew piştgirtiyê dide avakirina "civateke rojhilata asyayê" ya Bi ya modela Yekitiya Ewrûpa'yê.

Di vê pirsgirekê de para herî mezin a Çîn'ê ye, ku di navbera tirs û pêdiviyan de diçe û dihê. Wekî ku di nav derdorên aboriyê de dihê gotin, bazara gelekî mezin a Çîn'ê "pêşeroja Japonya'yê" mîsoger dike. Piştî krîzeke ku ji deh salan bêhtir dewam kir, aboriya Japonya'yê hê girêdayî firotina ber bi derve ve ye ku îro gelekî kêm bûne. Wisa xuya ye ku Asya xwe ji vê krîza aborî baştir parastiye, û şûna rojava girtiye. Çîn jî şûna Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê ji destê wê girt û xwe kir hevgirê bazirganîyê yê yekem. Vê yekê kir ku têkilî çêbin. Di salan 2009'an de, nêzikî çaryeka firotina ber bi derve ve ya japonî çûne Împaratoria Navendê (ango Çîn), ji sedî 16'ê wê çûne Amerîka'yê û ji sedî 12'ê wê çûne Ewrûpa'yê. Lê belê bazirganî têrê nake ku xwe ji kevneşopiyan xelas bike.

### Tirsa wendakirina piştgiriya Washington'ê

Ji serdemên destpeka nivîsê ve ku heta bi destpêka konfuçiyenîzm an ji bûdîzmê, kokên hevpar ên her du neteweyan hene ku dikarin hevkariya di navbera wan de xurtir bikin. Lê belê, rabihurî ji nelihevkirinan jî mişt e. Berê, imparatorên Çîn'ê japon wekî "neteweyekî hacûckan" didîtin ku yekane mafê wan bac dan bû. Li aliyê din, di destpêka sedsala bihurî de, ji dagirkirina Mançûrî heta bi komkujiyên Nankînê, japonan fetha xwe ya kolonyal bi xeddariyeke kêmdîtî meşand. Di cîhanê de yekane mexdûrê bombeya bombeyan- Bombayê atomîk- nikarîbû wekî Almanya ya ku hevgirê Japonya'yê bû, ji dîroka êrîşkariya xwe dersên ku diviyabû hîn bibin, derxe. Îro jî muzexaneya li kêleka goristana Yakusnunî, "şerê xweparastinê" yê Pasîfîk'ê mafdar nîşan dide.

Tansiyonên mezin ku sala 2005'an de gihiştibûn rewşa herî xerab, êdî neman. Li Taywan'ê – yek ji sedemên nelihevkirina Pekîn û Tokyo'yê ye - ji hilbijartina Serokkomar Ma Ying-jeou ku aligiriya hevkariya bi Çîn'ê re dikir, destûr da ku ji nû ve dest bi hevkariya baştir bikin. Berevajî serokkomarê berê yê zêdetir alîgirê sexwebûnê bû. Li Japonya'yê Koizumi çû û ev nîşana normalbûnekê bû. Hatoyama ji Hu Jintao re pêşniyara "veguhertina ava şêlû ya


www.arsivakurdi.org

derya Çîn'ê bi deryayeke biratiyê (8)" kir, ji bo çareserkirina pirsgirekên erd ên giravên Senkaku (Diaoyu)2. Di Kanûna 2009'an de alîkarê serokkomarê Çîn'ê Xi Jinping çû Tokyo'yê û ji bo Împarator Akihito bibîne tiştek kir ku heta niha kêmhatibû kirin. Di ser qonaxên protokolê yên rêûresma berî dîtina împarator re derbas bû û yekser çû cem wî. Li aliyê Japonya'yê di navbera 10 û 14'ê Kanûnê de, serokê PDJ'yê Ozawa Ichiro ku xwediyê hêzeke mezin e, bi şandeyeke ji 600 kesên navdar, ji bo gereke nehatî dîtin, çûn serdana Çîn'ê.

Bi ya Profesor Kokubun Ryosei ji zanîngeha Keio li Tokyo'yê, "Pêşketinên bidestxistî hêja ne", lê dîsa jî ew tembîh dike da ku mirov nekeve nav analîzeke zêde hêsan. Hevgirtineke çînî-japonî ya hewlê bide Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê ji Asya'yê bike der tine, lê belê têkilîyeke sê-alî heye (Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê, Çîn û Japonya). Çarenûsa van têkiliyên sê-alî di sedsala bistan de şahidî li serpêhatiyên cur bi cur kir: Di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de hevgirtineke amerîkî-çînî li dijî Japonya'yê hebû, piştre hevgirtineke amerîkî-japonî li dijî Çîn'ê çêbû. Vê rewşê herî kêm "heta bi salên 1970'yî dom kir, wê çaxê Yekîtiya Sovyetan ji aliyê her sê welatan ve wekî dijminekî dihat hesibandin." Wê demê Tokyo li bendê nebû ku di sala 1972'an de Amerîka pozîsyona xwe li hemberî Pekîn'ê biguherîne. Serokê amerîkî hingî çû serdana Pekîn'ê û Çîn heta hingî wekî dewlet nedihat qebûlkirin, nas kir. Japonan navê "şoka Nixon" li vê bûyerê kir. Japonya bi vê bûyerê ew qas matmayî mabû ku hîna jî behsa wê dike. Di sala 1998'an de heman şok Japonya dîsa hejand. Kokubun weha rave dike"Serok Clinton ji hefteyekê bêhtir li Çîn'ê dimîne û di Tokyo'yê re derbas jî nabe. Me dest bi tatêl û mitalên li ser vê 'jêbuhurîna Japonya'yê' [passing Japan] kir, tirsa me ev bû ku "hevgirtina stratejîk" a nû di navbera Çîn û Amerîka'yê de zirarê li Japonya'yê bike."

Demokratan vegeriya Qesra Spî û vê yekê fikarên Japonya'yê zêdetir kirin. Di warê fermî de herkes bi axaftina Barack Obama a li ser bêçêkkirina nukleer dilxweş û razî ye. Wezareta Karên Derve wisa dibêje "ev tiştek e ku me ji zû de dixwest." Lê piştî ku demeke kin li Tokyo'yê bihurand, serdana demdirêj a serokê amerîkî li welatê mezin ê cîran di Mijdarê bihurî de bala her kesî kişand ser xwe.

Dilê hukûmeta nû ya japonî nîn e ku bihêle Washington û Pekîn hevdîtinan di navbera xwe de çêbikin û wê li derve bihêlin. Lewra bi awayekî xurt xwe nêzî Çîn'ê dike û (di dawiyê de) daxwaza pêşdebirina karûbarên polîtîk ên herêmî, diyar dike. Rastî ev e ku fikra "Civata Rojhilata Asya'yê" ne ya wî ye. Ev fikir, piştî krîza aborî ya salên 1990'î de derketibû holê, lê ji aliyê Washington û Pekîn'ê ve nehatibû qebûlkirin. Hatoyama vê peşniyarê pêşkêş dike: "Di demeke dirêj de hebûna pereyekî [asyayî] yê hevpar" ku wê " rola nû ya Asya'yê di rêvebirina karên cîhanê de (9)" eşkere bike. Hewldaneke piçûk a fona dravî ku armanca wê alikariya ji bo welatên xizan e. Kore ya Başûr tev li wê bû, belê riya hevrikiyê vekirî dimîne.



*Kadir Akyol, 100 x 120 cm*

**Navbera Pekin û Tokyo'yê de pêşbirka Asya'yê**

Çîn rêvebiriya diplomatîk dike û bi deh welatên endamê Yekîtiya Neteweyên Başûrrojhilata Asya'yê (YNBRA) (10) re peymaneke kirînûfirotina serbest mohr kir ku ji 1'ê Çileyê sala 2010'an û vir ve kete meriyetê. Ji bo ku derengmana xwe telafî bike, Tokyo bi armanca avakirina tişta jê re dihê gotin "Kevana Azadiyê" bi xwîngermî berê xwe dide Hindistan, Awustûralya û Zelandaya Nû. Ev yek jî berevajiyê otorîtarîzma Çîn'ê ye. Hukûmet bi taybetî dixwaze xwe bi Delhiya Nû bide hezkirin ku ji bo giraniya Çîn'ê xetereke mezin e. Di Cotmeha sala 2008'an de "Peymaneke hevkariyê ya stratejîk" hat mohrkirin; meşandina operasyonên leşkerî yên hevpar wekî yên Amerîka'yê dihên plankirin. Tevî ku girîngî bi van têkîlîyan dihê dayîn û hêviyê didin mirovan, ev têkiliyên li pêş dihên girtin marjînal dimînin. Mezinahiya bazirganiya navbera Japonya û Hîndistanê kêmtirî ji sedî yekê bazirganiya Japonya'yê ye.

Di nava rêveberiya Hayatoma de, hin kes mînaka hevgirtina di navbera Fransa û Almanya'yê de li ber çavên xwe digrin û difikrin ku hevgirtineke bi Kore ya Başûr re wê bêhtir hêviyan bide. Li Wezareta Karên Derve pisporekî têkîlîyên navbera welatên Asya'yê diyar dike ku: "Bi Çîn'ê re di warê aborî de em heman zimanî diaxivin, lê di barê mijarên din ên hemûyan de nêrînên me gelekî cihê ne. Li rojhilata Asya'yê bi tenê du welat xwedî aboriya bazarê û demokrasiyê ne: Kore û Japonya. Ew dikarin bibin motorên hevkariyeke herêmî." Lê her çi qas wisa xuya bike jî tu garantiya serketinekê nîn e, lewra li aliyekî Çîn ditirsîne û li aliyê din jî Japonya li ber dilan nagera û aram nake.

Li vir, dilşikestin û dilmayînên dîrokî hîna jî îhtîmaleke ji nû ve lihevkirineke dîplomatîk asteng dikin. Piştî xebateke dualî ku sê salan ajot, di Adara 2010'an de raporeke 2200 rûpelî hat çapkirin. komîsiyona dîroknasên Kore ya Başûr û Japonya'yê sebaret bi çend xalên kilît li hev nekirin: Bi darê zorê xebitandina mirovan ku hukûmeta Japonya'yê di dema şer de ferz kiribû, her weha xebitandina "jinên rehetkirinê", ev gotin ji bo jinên Koreyî yên ji bo fuhûşê hatin mişaxtkirin, dihê bikaranîn. Pisporê Wezaretê Karên Derve dibêje: "Divê em sebr bikin. Êdî lihevkirinên polîtîk û aborî hêsantir in. Ji dema ku Kore kete nav refên welatên pêşketî êdî xelqê Kore'yê bêhtir bi xwe bawer e. Li aliyê Hatoyama jî, êdî em amade ne bi dilekî ferehtir dîrokê lêbikolin." Lê belê têkiliyên sêalî – Japonya, Çîn û Kore ya Başûr- bê dahol û zirne derket holê. Li dora mijara aborî kombûyî, ev her sê alî ji sala 1999'an û vir ve di civînên bilind ên Yekitiya Neteweyên Başûrrojhilata Asya'yê (YNBRA) de dihên cem hev. Di 13'ê Kanûna 2008'an de cara yekem ev her sê welat li ser navê xwe civiyan. Kokubun dibêje: "Di dawiyê de fikra Civata Rojhilatê Asya'yê rengê xwe digire."

Dîsa jî, eger em li cudatiya pozîsyonan li hember "pirsgireka" Kore ya Bakur binihêrin, em dikarin bêjin paşeroj wê bibe meşeke nû û dirêj: Pekîn hevdîtin û zextê bi kar tîne; Seoul hişk dimîne; Tokyo jî hevdîtinan red dike. Mûşekên ku li ser erdên Japonya'yê dihên avêtin û gefên nûkleer wê ditirsînin, lê belê di dilê xwe de, tu kes ji tiştekî bi vî rengî bawer nake.

Hêmaneke din a ku pêşketina stratejîk a Japonya'yê asteng dike, Rûsya ye. Dîsa pêlên dîroka Şerê Cîhanê yê Duyemîn hîna nehatine qulubandin. Îro jî tu peymana aştiyê di navbera Tokyo û Moskova'yê de hîna nehatiye mohr kirin, sedema wê jî nelihevkirineke li ser giravên Kurîl e ku ji wan re Japonya "erdên Bakur" dibêje. Hatoyama ku li wir li madeyên xam ên enerjiyê digere û hevrikiya biraye xwe yê dijmin Çîn'ê dike, hewlê dide hevdîtinan li dar bixe. Hevdîtinên dualî zêdetir dibin.

Şêst sal piştî têkçûna Japonya'yê li Pasîfîk'ê û bîst sal piştî hilweşîna împaratoriya Sovyet'ê, Japonya li riyekê digere da ku bikeve cîhana piştî şerê sar. Hatoyama qala otonombûneke ji Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê dike û li pey hevkariyeke nû ya herêmî ye. Gelo danseke sêgoşe bi Çîn'ê re dixwaze? Gelo li dijî Pekîn'ê, dixwaze bi desthiladariyeke xurt a amerîkî re riya xwe dewam bike? Ya rastî ev xewna guhertinê ya hukûmeta nû ya Japonya'yê, di kêliya herî xerab de pêk dihê. Çîn wekî ku baskên wê derketibin xwe pêş dixe û Japonya jî bêhna wê çikiyaye.

**Wergera ji fransî**
**Lokman Turgut**

---

(1) Peyman di 19'ê Çileyê 1960'î de hat mohr kirin û di Hezîranê de hat qebûl kirin.

(2) Edîtoryala rojnameya Asahi Shimbun, Tokyo, 2'ê Nîsana 2010'an.

(3) Axaftin û daxuyaniyên serokwezîr, www.kantei.go.jp

(4) Bixwîne; Emilie Guyonnet "Les ambitions militaires du Japon passent par les Etats-Unis (Planên eskerî yên Japonyayê di Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re derbas dibin" le Monde Diplomatique, Nîsana 2006'an.

(5) Bixwîne; Masami Ito, "Greater peacekeeping role OK, not truce enforcement (ji rolekî mezintir re ji bo parastina aştiyê ERÊ, ne ji bo xurtkirina agirbestê)" Japan Times, Tokyo, 23'ê Adara 2010'an.

(6) Bixwîne; Katsumata Makoto, "Le mouvement pacifiste japonais depuis les années 1990, le débat en cours (Tevgera pasîfîst a japonî ji salên 1990'î û vir vir ve, nîqaşên li dar in)" Recherches internationales, Parîs, hejmar 86, Nîsan-Hezîran 2009.

(7) Bixwîne; Gavan McCormack, "Client State: Japan in the American Embrace (Welatê girêdayî: Japonya di bersînga amerîkî de)", Verso, New York û Londra, 2007.

(8) Axaftinên ku Asia Times çapkiriye, 23'ê Îlona 2009'an.

(9) Hevpeyvîne bi rojnameya South China Morning Post, Hongkong, 25'ê Cotmeha 2009'an.

(10) Bîrmanya, Bruney, Camboçya, Îndonezya, Laos, Malezya, Filîpîn, Sîngapûr, Tayland, Vietnam. YNBRA bi Japonaya, Çîn û Kore ya Bakur fereh bû û jêre tê gotin YNBRA + 3.

www.arsivakurdi.org

AFRÎKA

# Bankayeke ne wekî yên din

DR. YVES EKOUÉ AMAÏZO*

Di 2005'an de, wezîrê berê yê aboriyê yê Ruwanda'yê Donald Kaberuka ku bi dilsoziya xwe ya ji bo pêşxistina aboriya parzemîna Afrikayê dihê nasîn, bi alikariya piraniya Hîssedaran (ji % 78,82 yê hemû Hîssedaran) wekî serokê Bankaya Pêşxistinê ya Afrîka'yê (BAD) hat peywirdarkirin. Wî di sala 1994'an de, piştî komkujiya li Ruwanda'yê, di pêşxistin û nûjenkirina aboriya vî welatî de roleke girîng lîstibû. Piştî vê peywira nû wî ji xwe re kiriye armanc ku "Bankaya Pêşxisitnê ya Afrîka'yê BAD ji her alî ve bigihîne asta bankayên din ên cihanê, wekî Bankaya Pêşxistinê ya Asya'yê û Bankaya Navneteweyî ya Pêşxistinê. (1)"

Ji wê demê ve, ev sazî pirsgirêkên herî li pêş ên neteweyî û herêmî yên hemû welatên endam dide berçav û hewlê dide ku vê parzemînê bixe bazara cihanê, rêjeya xizaniyê daxe astke maqûl, entegrasyon û reqabeta Afrîka'yê ya di piyasa cihanê de bilind bike. Di vê rê de gav jî hatin avêtin: Di saziyê de, sîstema navendî hat kêmkirin, li herêman nivîsgeh û nûnerî hatin vekirin, burokrasiya hişk hat kêmkirin, kapasîteya xebat û analîzên aborî hatin bilindkirin. Ev guherîn nîşan didin ku ev banka wê bibe navendeke girîng a zanyariya aboriyê.

Bankaya Pêşxistinê ya Afrîka'yê BAD di 1964'an de hat avakirin, di 1967'an de li Abidjan (Beravên d'Ivoire) bi cih bû, lê tenê bi endametiya welatên Afrîka'yê. – di 1982'an de welatên derveyî Afrîka'yê jî bûn endam- di destpêkê de armanc ew bû ku "li welatên endam, piştgirî bidin pêşxistina aborî û rewşa civakî bigihînin aramiyeke domdar (2)". Di nava hedefên BAD'ê de têkoşîna li dij xizaniyê jî hat bicihkirin. Lewra Neteweyên Yekgirtî jî di nava hedefên xwe yên Milenyûmê (hezarsal) de ji xwe re kiriye armanc ku ewê heta 2015'an rêjeya xizanî û belengaziyê daxin nîvî. Wekî çalakiyên herî li pêş ew girîngî didin projeyên entegrasyon û hevgirtina aborî ya herêman. BAD bi armanca teşwîqkirina perexistinên aborî, çavkaniyên xwe bi taybetî jî bi rêya kredî û deyndayînê, dixe xizmeta welatên hewcedar. Ne tenê kredî, ew her weha di barê politikayên aborî de ku divê werin meşandin, hem teknîkî û hem jî, ji hêla şêwirmendiyê ve diçe hawara van welatan. Bi vê armancê 1491 xebatkarên bankayê – ji wan 217 kes di sala 2008'an de dest bi kar kirine,- hewlê didin da ku BAD bigihîje armancên xwe. Ji 2003'an û vir ve navenda demî ya bankayê li Tunus'ê ye.

Di sala 1972'an de, banka xwe guherand û navê xwe kir gruba bankayên ji bo pêşxistina Afrîka'yê (GBAD). Di vê çarçovê de Fona Pêşxistina Afrîka'yê FAD jî ava bû û di 1976'an de, Fona Taybetî ya Nijerya (FSN) (3) jî tev li vê fonê bû. Di çarçoveya têkoşîna li hember xizaniyê de, FAD bi ya rewşa welatan, carnan krediyên bi şert û merc (4), carnan krediyên bêfaîz, carnan jî tenê alîkarî dida welatên xizan ên afrîkî ku pêdiviya wan bi alikariyê hebû. (5) Çavkaniyên fonê bi taybetî ji welatên endam ên derveyî Afrîka'yê dihên, ew welat bi giranî endamên Rêxistina Navneteweyî ya Hevkarî û Pêşxistina Aborî (OCDE) ne. (Ji bilî Afrîka'ya Başûr).

Her sê salan carekê FAD bêgav xwe nû bike. Ev cara donzdan e ku ew xwe di ber çavan re derbas dike. Di serdema yanzdan a FAD'ê de, bi qasî 6,53 mîlyar Euroyên wan hebû ku aîdî çil welatan bû (6). Di navbera 2004 û 2008'an de, fona wan ji ber perexistinên bêplan û bêpêşdîtin ew qas daket ku nîvê hebûna xwe wenda kir.

Fona Taybetî ya Nîjerya'yê (FSN) ji aliyê xwe ve ji xwe re kiriye hedef ku "alîkarî bide welatên herêmê yên endam (PMR) ku ji ber aboriya wan a qels, pêdiviya wan bi pêşketineke aborî û civakî heye." Ev hewldana rêveberi a Nîjerya'yê wekî alikariyeke dilnizm dihê qebûlkirin. Ji ber ku di 31'ê Kanûna 2008'an de, kapasîteya wan a deyndayînê 266,51 mîlyon Euro bû. Ew jî krediyeke bi şert û merc a ji bo zêdeyî bîst salan e ku rêjeya faîza wê di navbera ji %2 û ji % 4'an de diguhere.

Ji ber xebatên cuda û beşên cihêreng, burokrasiya bankayê carnan pir dereng dimeşe. Pêdivî heye ku rêveberiya BAD'ê û ya FAD'ê, Fona Taybetî ya Nîjerya'yê (FSN) jî bigirin nava xwe û bi hev re xwe entegreyî sîstema nû bikin. Gruba BAD'ê ku xizmeta xwe tenê ji welatên Afrîka'yê re dike, hewceyî hêz û hevkariyeke aboriyê ye.

Panzdeh welatên afrîkî yên xwedî rîzîkoyeke kêm ku dikarin deynê xwe bidin, bi navekî din ji wan re dibêjin "deshilatdar" (7) (li Afrika'yê bi tevahî pencî û sê dewlet hene) û hin sektorên taybet dikarin bi rêjeyeke normal a nêzî şertên bazara cihanê, ji BADê kredî bi dest bixin. Çavkaniya van krediyan ji fona deynan û ji welatên endam dihê. Şert û mercên kredîdayînê bi giştî ji aliyê rêveberiya bankayê ve dihê diyarkirin. Di sala 1982 de, welatên derveyî parzemîna Afrîka'yê jî karibûn bibin endam û tev li sermayeya bankayê bibin. Lê di rêveberiyê de mafê wan ê dengdanê tenê ji % 33 bû, ev rêje îro derketiye ji % 40.

Di 2008'an de, BAD xwediyê sermiyaneke 2 mîlyar Euroyî bû. Wekî tedbîr, tevlêbûna nava sermayeya bankayê, bi kontrol dihê kirin. Tenê rêveberiya bankayê biryar dide ka kîjan welat kengê û çi qas dikare pereyê xwe bixe ser sermayeya bankayê. Ger ji nişkan ve pêwîst were dîtin û alîkariyeke lezgîn hewce be, wê demê bang li welatên endam dihê kirin ku sermayeya bankayê bilind bikin. Ger hemû welatên endam, bi ya ku hatiye diyarkirin, pereyê xwe tev li sermayeya bankayê bikin, ji % 60'ê sermayê ji welatên afrîkî dihê, tenê ji % 40'ê (8) sermayê, ji welatên endam ên derveyî parzemînê dihê. Di rastiyê de, rêjeya sermayeya ku îro jê re destûr dihê dayîn di bankayê de kom bibe, tenê ji % 10,81 ê Hîsseyan e. Yên din ji % 89,19 Hîsseyan di rezervê de ye. Heta niha (bi giranî) pêdiviya BAD'ê pê çênebûye ku bang li welatên endam bike da ku rezervê serbest berdin.

Di konseya rêveber a bankayê de ji her welatek nûnerek cih digire û biryara herî bilind a gruba BAD'ê ji aliyê wan ve dihê girtin. Ji wan nûnerên endam, konseyeke din a bilind (a ji hijdeh kesî) dihê hilbijartin ku ew berpirsiyariya karûbarên rêveberiiya bankayê di nava xwe de li hev par ve dikin. Ji endaman, 5 welat bi ya rêjeya sermayeya xwe xwedî mafekî berfireh ê dengdanê ne: Japonya (ji % 6,26), Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê (ji % 5,87), Fransa (ji % 5,04), Almanya (ji % 5), Kanada (ji % 3,85). Bandora Çîn'ê gelek kêm e, ji ber ku tevlêbûna wê tenê ji sedî 0,92 ye. (9)

Hîsse û çalakiyên bankaya BAD'ê cihêreng in, wekî mînak: fînansmana ocaxên madena tinan li Kenya'yê, hilberîna paxir li Zambia'yê, hilberîna madena nîkel li Madagascar ; alikariya aborî ji bo şîrketên piçûk û mezin ên Misir'ê; ji bo kêmkirina rêjeya xizaniyê alikariya hukûmeta Mozambik'ê; fînansmana çêkirina rêya di navbera Guine û Senegal'ê de, avakirina bendava hîdroelektrîkê li Uganda'yê; amadekirina projeya avakirina balafirgeha Addis-Abeba li Etîopya'yê ; alîkariya aborî ji bo welatên xizan ên di bin deynên giran de; pêşxistina aborî û kapasîteya hilberînê ya welatên herêmê yên endamên fona bankayê; fînansmana krîz û rewşên awarte.

Di navbera salên 1967 û 2008'an de, du navgînên sereke yên budçeya bankayê hebûn ; yek krediya ji bo proje û reforman a din jî alikariya ku ji dilsozan dihat. Bankayê bi giranî piştgirî dida sektora transportê, kiştûkal, pêşxistina gundan û herêmên derveyî bajaran, sektorên cuda yên komunîkasyon û danûstendinê. Di 2008'an de, alikariya ji bo binesaziyê, ji % 23'ê budçeya giştî bû. (10) Armanc pêşxistina parzemîna Afrîka'yê ye. Marja budçeya vê parzemînê ya hilberîna navxweyî, di sala 2000'î de ji rêjeya ji sedî -0,1 % derket ji sedî 2,8'an. (11) Krîza aborî ya sala 2008'an, mezinbûna aboriya herêmê ku ji sala 2003'an û vir ve dihat piştgirîkirin, da sekinandin, (bi qasî ji % 5,9). Rêjeya mezinbûnê di 2009'an de, daket heta ji % 1,9, lê belê li parzemîna Afrîka'yê resesyon an ku rawestana aborî bi giştî pêk nehat. (12)

Bankaya Pêşxistinê ya Afrîka'yê (BAD) di rewşeke weha nazik de, di gel cudahiya mezin a di navbera herêm û welatan de, dîsa jî roleke girîng lîst. Di sala 2009'an de, deyn kirin û alikariya ji bo bankayê du qat zêde bû. (beriya krîzê 4 mîlyar Euro bû, di dawiya 2009'an de, bû 8 mîlyar). (13) BAD bû wekî pompeya yekem a aboriyê ku bersiveke ciddî dida welatên ku hewcedariya wan bi alikariyê heye. Di vê krîzê de ji ber pir sedemên cihêreng gelek welatên parzemînê karibûn serûbin bibûna lê BAD li hember buhrana aborî ya 2008'an, ji van welatan re bû wekî sitûn û stargeh.

Di çarçoveya plana xwe ya stratejîk a ji bo serdema navbera 2008-2012'an, banka li hember krîzên navxweyî û derve ku dikarin derkevin holê, bi ya gumanên pisporan, tedbîrên girîng girtine. (14) Grub xwe weha amade kiribû ku bi îhtîmala ku daxwazeke mezin a alikariyê were kirin, dikaribû ji du milan ve bigihîje hawara welatên hewcedar. Hem bi rêya BAD'ê hem bi ya FAD'ê. Di encama krîza aborî de bazara krediyê ew qas ket tengasiyê ku heger ev amadekariyên bankayê nebûna, hin welat karibûn ber bi topavêtinê ve biçûna. Heta Botswana digel rewşa xwe ya baş, xwe nêzîkî BAD'ê kir da ku di rewşeke kirîtîk de bikaribe xwe bigihîne bazara krediya Navneteweyî. (15)

Bi ya hesabên dawî yên di 31ê Kanûn'a 2008'an, BAD jêhatineke 337,18 mîlyon bi dest dixe, lê di dawiya 2007'an de ev hêjmar 358,21 mîlyon bû. Banka kara ku bi dest dixe li hîssedaran belav nake, lê di rezervê de dihêle da ku dema ku hewce be bixe

** Aborîzan, şêwirmendê navneteweyî yê aboriyê, dîrektorê saziya Afrika-nasiyê (Afrolojî), nivîskarê pirtûka "Crise financière mondiale : des réponses alternatives de l'Afrique," (krîza aborî ya cihanê û tedbîrên alternatîf ên Afrîka'yê) weşanên Menaibuc, coll. " Interdépendance africaine ", Paris, 2010 (di tebax'ê de derdikeve)*

www.arsivakurdi.org



*Kadir Akyol, "Metamorfoz III", 160 x 120 cm, 2009*

xizmeta însiyatifên taybet. Di hesab de ev yek her çend wekî lêçûn were nîşan dan jî di rastiyê de wekî alîkarî digihîje hin projeyan. Di vê krîza dawî de piştî daxwazên mezin ên welatên herêmê, konseya rêveberiya BAD'ê biryar girt ku di 2008'an de, kara xwe bixe xizmeta çalakiyên FAD'ê: ew jî alîkarî dide welatên xizan ên xwediyê deynên giran (PPTE) (16).

Ev hêza BAD'ê bi giştî girêdayî çavkaniya dewlemendî, binesaziya aborî û kaliteya rêveberiya aborî ya welatan e. Dema ku welatên endam di aboriyê de perexistinên xerab bikin, di projeyên stratejîk de gavên çewt bavêjin û yan jî zerar bikin, helbet Gruba BAD wê nikaribe bigihîje hedefên xwe. Ev grub her weha xwedî peywireke weha ye ku divê dayîna deynan bixe bin garantiyê û destûr nede ku hukûmetek deynê xwe bi tevlihevî ji hukûmetên nû re bihêle. (17)

Piştî hesabên jêhatina giştî, derket holê ku di sala 2008'an de BAD'ê 62,33 mîlyon Euro wenda kirine, lê belê di sala 2007'an de kara wê 250,46 mîlyon Euro bû (18). Divê neyê jibîrkirin ku peywira sereke ya bankayê ew e ku di şert û mercên zehmet de, ji warê aborî de xwe bigihîne hewara welatên endam. Ew her çend di xizmeta welatan de be, alikariya xwe ya ji bo sektora taybet jî, şûn ve nade. Li ser hemû projeyan ku jê re dihên şandin hûr dibe, wan bi hasasiyet di ber çavan re derbas dike. Krediya ku ji bo sektora taybet hatiye terxankirin vê gavê tenê ji % 20,7 alikariya giştî ye. (Dike 808,81 mîlyon Euro)

Bi xêra gruba BAD'ê parzemîna Afrîka'yê roj bi roj pêş dikeve. Rastiyek jî heye ku Afrîka hîna jî nebûye xwediyê navgîn û alavên xwe yên aborî ku bikaribe bi wan, kapasîteya xwe ya hilberinê bilind bike û dewlemendiyên xwe yên sererdê û binerdê bixe xizmeta gelê herêmê. Pirsa sereke ew e ku ji bilî alikariya navneteweyî ku bi rêya gruba BADê dihê kirin, gelo parzemîna Afrikayê wê kengê ji xwe re, di nava xwe de, navgîn û çavkaniyeke aborî biafirîne ku bi wê rêyê bikaribe bibe aktorê sereke yê çarenûsa xwe ?

**Wergera ji fransi**
**Bedran Dere**

---

(1) (Afrîkaya ciwan ) Jeune Afrique, Paris, 15 adar 2005.

(2) "Comprendre la Banque Africaine de Développement: Guide d'introduction pour les ONG", BAD, Tunis, mai 2007, p. 1.

(3) Fonên din ên taybet: fona petrolê ya ereb, fona taybet a ji bo hişkbûna xwezayê û birçîbûna li Afrîka'yê, Fona Taybet a Hawarê.

(4) Deyndayîneke bi şert wekî avakirina devereke ji bo xiymeta gel.

(5) Sî û heşt welat: Angola, Bénin, Burkina Faso, Burundi, Kamerun, Cap-Vert, Komores, Kongo, Côte d'Ivoire, Djibouti, Erythre, Ethîopî, Gambie, Ghana, Guine, Guine-Bissau, Kenya, Lesotho, Libéria, Madagascar, Malawi, Mali, Mauritanie, Mozambîk, Nijer, Uganda, Komara demokratî ya Kongo, Komara Afrîka Navîn, Ruwanda, Sao Tomé-et-Principe, Senegal, Sierra Leone, Somali, Sudan, Tanzanie, Çad, Togo, Zambi.

(6) Hesabên di naveroka nivîsê de tev ji nû ve wekî Euro hatine hesabkirin, ji bo hêsankirina xwendinê.

(7) Afrîka başûr, Algérie, Botswana, Misir, Gabon, Guineya Ekvator, Libya, Maroc, Maurice, Namibie, Nigeria, Namibie, Seychelles, Swaziland ût Tunus.

(8) "Rapora salane ya 2008", BAD-FAD, Dakar, Sénégal, 12-14 gulan 2009, pp. 179 et 180.

(9) "Rapora salane 2008", op. cit., pp. 263.

(10) "Rapora salane 2008", op. cit., pp. 286, 48 et 49.

(11) Îstatîstkên ji bo Afrika'yê 2009, BAD, Tunis, 2009, p. 53.

(12) "Regional Economic Outlook: Sub-Saharan Africa. Weathering the Storm", Fona pere ya navnetewî Washington D. C., 2009.

(13) Donald Kaberuka, "From the Digital Divide to the silent Digital Revolution, Statement at the Assembly of the African Union", BAD, 14mîn civîna asayî, 31 janvier 2010, Addis Abeba, Ethiopie, p. 3.

(14) Not û puan ji aliyê ajansên pispor ve tên dayîn (Standard & Poor's, Moody's, Fitch Ratings, et Japan Credit Rating, etc.).

(15) Botswana weke model tê girtin, "rêvebiriyeke serkeftî" li Afrika'yê hesabek "şefaf", çavkaniyeke "serbixwe".

(16) Moody's Global Sovereign, "African development bank. Credit Analysis", Londres, îlon 2009.

(17) Lire Anne-Cécile Robert, "ji Conakry heta Nairobi, gelê afrîkî dengê xwe didin, lê belê biryar nadin,", Le Monde diplomatique, sibat 2010.

(18) "Rapora salane 2008", op. cit. pp. 24, 34, 35.

www.arsivakurdi.org

EWRÛPA ÇAWA DERÎ LI CÎRANÊN XWE DIGIRE?

# Kontrola koçberiyê wekî îhale dane welatên cîran

ALAIN MORICE û CLAIRE RODIER*

**Ji salên 1990'î û vir ve, Yekîti'yê bi awayekî lezgîn, şêwirmendên xwe yên teknîkî şandin cem welatên berendam û bi wan re li hev kirin ku ewê pêşî li çavkaniya koçberiyê bigirin. Di sala 2004'an de, di navbera welatan de, toreke ji "wezîfedarên têkoşîna dijî koçberiyê" hat lidarxistin. Armanc ev bû: "Hevkariya ji bo pêşîlêgirtina koçberiya qaçax, têkoşîna li hember vê bûyerê, vegerandina koçberan û rêvebirin û kontrola pêlên koçberiya qaçax."**

Ewrûpa'yê dîwarên xwe guherandin. Beriya bîst salan, li Berlin'ê, berpirsên neteweyên demokratîk tev bi hevdengî hilweşîna dîwarê bi nav û deng wekî serkeftin pêşwazî kirin. "Her kes xwedî maf e ku karibe, welatê xwe jî di nav de, ji her welatî derkeve." Ev Xala 13'an a danezana gerdûnî ya mafên mirovan e ku di sala 1948'an de hatibû qebûlkirin. Bi derengî be jî, êdî derfetên ji bo pêkanîna vê xalê derketibûn holê. Di daxuyaniyeke sala 1991'an de, Konseya Ewrûpa'yê kêfxweşiya xwe ya ji bo serbestiya li ser tuxûbên welatên endam tîne zimên û weha dibêje: "guherînên polîtîk rewşeke wisa derxistiye holê ku mirov dikare bi serbestî li seranserî Ewrûpa'yê bigire. Ev jî, ji bo pêşketina civakeke azad û çandeke dewlemend, bi xwe re şert û mercên erênî derdixe holê." Azadiyeke wisa ku pir dem derbas nabe, mirov ji encamên wê ditirse. Di destpêkê de hat bibîrxistin ku "mafê ger û seyaheta serbest, çawa ku di beyanameyên navneteweyî de hatiye nivîsandin, destûr nade ku kesekî bi serbestî li welatekî din bi cîh bibe." Rayedaran tirs û fikareke din bi lêv kir: "Zêdebûna hejmareke mezin ya penaberan, hem li Ewrûpa'ya navîn hem jî li Ewrûpa'ya rojava nîşan dide ku peymana Cenevre'yê ya di barê tixûban de, wê ji aliyê koçber û penaberan ve xerab were bikaranîn." (1)

Di dawiya şerê sar de, xeteke nû ya tixûb hat ava kirin. Li ser van xetan bedenên wisa bilind hatin ava kirin, ha xuyangî ha veşartî, hem li ser erdê hem li ser deryayê dibin sedemê mirina mirovan. Li Rojava, Yekitiya Ewrûpa'yê, projeya berfirehkirianê xist bazarê û di berdêla endametiyê de ji wan welatan xwest tixûban biparêzin û jêre çavdêrî bikin. Her dewlet neçar maye dîwarê xwe yê arzî yê Berlîn'ê ava bike. Li peravên Derya Sipî, di civîna bilind ya Ewrûpa'yê ya Tampere de biryar hat girtin ku ji sala 1999'an û pêve "dewletên endamên Yekitiyê û dewletên ne-endam yên cîranên tixûbî, li ser sînoran di nava xwe de hevakarî bikin û li hember kuştinên organizekirî û bazirganiya mirovan têbikoşin."

Penaber û koçberên ku carnan wekî "qaçax" carnan wekî "qurban" yan jî dema alîkarî didin hev, wekî "şebeke" tên bi nav kirin (2), îro bûne hedefa axaftinke balkêş ku îdîa dike, ew ji bo baştir wan biparêzin , li hember wan têdikoşin. Civîna Bilind ya Serokên Yekîtiya Ewrûpa'yê ya li Séville (Hezîran 2002) bi giranî ji têkoşîna li hember koçberiyê re hat veqetandin û ev xebata li hember penaberî û koçberiyê wekî gava herî lezgîn ya yekîtiyê bi binav kir, hem jî bê ku niyeta welatên cîran bipirse.

Bi vî awayî, ev parzemîna kevin, di nava wê tirs û fikarê de ye ku nikare tixûbên xwe bixe bin kontrolê, lewma jî serî li rêbazeke taybetî xistiye -bêyî ku şertên peymanên navneteweyî pêk bîne-. bi ya vê rêbazê, divê berê têkoşîna xwe bidin çavkaniya koçberan, û di vê warî de jî welatên transît hatine wezîfedar kirin. (3) Migreurop, komeke lêkolînvan (li kêlekê bixwîne "çavkanî"), ji bo ku karibin astengiyên li pêşiya ger û seyaheta serbest terîf bikin, neçar dimînin konsepta bi navê " externalisation" (berovajiyê navneteweyî, der-neteweyî, yan jî bikaranîna çavkaniyên derve) ku ji zimanê aboriyê digirin, bikarbînin. Mafê ger û geştê ku daxwaza wî tê kirin ji xwe bi peymanên navneteweyî hatine misogerkirin.

Tuxûbên derve yên erdnîgara Schengen'ê (li nexşê binêrin) ji vir û pêve xwedî dîwar û sûreke duyemîn e. Ji bo parastina wî jî, pêwîstî bi hevalbendiya welatên derdorê çêdibe. Programa La Haye (Lahey) ya 2004'an (4) ku di rastiyê de xwedî nîyeteke xerabe, bi vê hevokê hatiye nivîsandin: "aliyê derve yê polîtîkaya li ser koçberî û penaberiyê": Naveroka wê tev bi derewên îdeolojîk hatine tijî kirin. Di rastiyê de armanc ewe ku kumê serê kontrolvanê sînoran bidin serê dewletên cîran yên derveyê Ewrûpa'yê. Ji vê polîtîkayê re jî kirasek hatiye dûritin. Hevkariyeke bi qasî ku tariye ewqas jî neheq e. Rêvebirên 27 dewletan têkoşîna li hember koçberî û penaberiyê nerm nîşan didin û di nava xwe de wekî "hevkariya ji bo rêvebirin û kontrola pêlên koçberiyê" bi nav dikin.

Ji bo pêkanîna konsepta "Externalisation" (der-neteweyî) navgîneke nerm û ji tixûban dûr dihê bikaranîn. Du aliyên vê navgînê hene, yek hemû kontrol tev li derekî neyên kirin ango berfirehkirina kontrolê, yê duyem îhaleya ji bo "têkoşîna li hember koçberiya qaçaxî." Di fermiyetê de rewş cuda ye: hemû welatên Yekitiyê Peymana Cenevre'yê ya di barê penaberiyê de îmze kirin û her weha soz dan ku ewê xala 13'an ya beyannameya mafên mirovan ya gerdûnî ku dibêje "Herkes xwedî maf e ku karibe, welatê xwe jî di nav de, ji her welatî derkeve" pêkbînin.

Ji salên 1990'î û vir ve, Yekîti'yê bi awayeke lezgin, şêwirmendên xwe yên teknîkî şandin cem welatên berendam û bi wan re li hev kirin ku ewê ji çavkaniyê pêşî li koçberiyê bigirin. Di sala 2004'an de, di navbera welatan de, tevneke ji "wezîfedarên têkoşîna dijî koçberiyê" hat li darxistin. Armanc ev bû: "Hevkariya ji bo pêşîgirtina li koçberiya qaçaxî, têkoşîna li hember vê bûyerê, vegerandina koçberan û rêvebirin û kontrola pêlên koçberiya qaçax."

Bi vî awayî, koçberî berê ku pêkwere navê wê di raporan de wekî "illegal" (qaçaxî) dihê bi nav kirin. Karê bingehîn yê wezîfedarên vê tevnê ewe ku alîkarî bide hêzên herêmî dakû li balafirgehan û li deriyên txûban pasaportan baştir di ber çavan re derbas bikin. Ev tevger jî dihê wateya binpêkirina mafê desthilatdariya welatên herêmê.

Di sala 2001'an de, bi biryara Yekîtî'yê sîstemeke nû ya ceza hat sazkirin: Berpirsên her cure wesayît, yên barkêşiyê jî di nav de, dema di wesayîta xwe de kesên tarîxa vîze û ya pasaportên wan derbasbûne bihewînin wê werin cezakirin. Zêde giran e, –ceza carnan dikare heta 500.000 euro bilind be, mesrefa vegera wî kesî jî li ser şîrketa xwediyê wesayîtê ye–. Bi vê sîstemê personelekî bê erk li gorî dilê xwe dikare rêwiyan hilbijêre. Mafê kontrolê bi vî awayî hatiye arzî kirin ango ji dewletê derbasî şîrketên taybetî bûye. Lê dema ku were zanîn ka ew bi kîjan rêyî û bi alîkariya kê hatine welatê lê ne, encamên pir giran derdikevin holê. Weke mînak di sala 2007'an de, heft mesîgirên tunusî bi biryara dadgerê îtalî bi bahaneya ku "alîkarî dane koçberiya qaçax" hatin sûçdar kirin û girtin, keştiyên wan jî hatin desteserkirin. Ji ber ku ew çûbûn hawara rêwiyên keştiya ku noqê binê avê bûbû û ew anîbûn peravê herî nêz yê bûyerê, bajarê Lampedusa (Sicîlya). Ji xwe qanûnên li ser rêwîtiya deryayê jî wisa ferz

** Her du nivîskar jî li CNRS'ê antropolog in. Nivîskara duyem cîgira serokê MIGREUROP'ê ye.*

www.arsivakurdi.org

dikin (5).

Ji sala 2005'an vir ve, ajanseke Yekitiya Ewrûpa'yê ya bi navê Frontex (6), operasyon û karên kontrola li ser deryayê ya di navbera Afrika û giravên Kanarya de dide meşandin. Kanala Sisilya jî dikeve nava çarcova wezîfeya wan. Serokwezîrê Spanya'yê Jose Luis Zapatero, di dawiya sala 2009'an de, bi kêfxweşî anî ziman ku li welatên wan, hejmara koçberiya qaçax ya bi rêya deryayê daketiye nîvî. Lê belê bi yapir çavkaniyan, hejmara miriyên penaberên rêwî yên bi rêya deryayê û bi rêya reşayî kêm nebûye. (li nexşeyê binêrin.) Zêdekirina astengiyan û bihêzkirina ewlekariyê, pêşî li koçberiyê nagire, tenê koçberan neçar dihêle ku rêyên xetertir biceribînin. Kes nizane endamên saziya ewlekariyê ya Frontex, di nava kîjan şertan de û bi tevgereke çawa mudaxaleyê koçberan dikin. Divê heryek ji wan û yên ku dixwazîn serî li mafê penaberiyê bidin, di çarçoveya normên Yekîtî'yê de nasnameyên wan werin diyar kirin. Ji aliyê din ve, tevgera hişk ya saziya Frontex ya di dema diyarkirina nasnameyên koçberan de çiqas bi yaqanûnan e. Welatên Ewrûpa'yê vê dijwarî û tevgera antîdemokratîk ya ku li ser xaka wan dihê meşandin ji nedîtî ve dihên. Ev jî dikeve çarçoveya binpêkirina mafên bingehîn yên mirovan.

Konsepta "Externalisation" (der-neteweyî) ya ji bo kontrola tixûban tevneke navneteweyî da li darxistin: "hevkariya gerdûnî ya bi welatên ku koçber jê dihên û yên transît re." Ev peymana Ewrûpayê ya ku di sala 2008'an de ji aliyê bîst û heft welatî ve hat îmze kirin bi temamî li ser pirsgirêka penaberî û koçberiyê ye. Ev înîsyatîf bi pêşniyaza serokê demê yê Yekîtî'yê Fransa ve hatibû pêniyaz kirin. Di bin navê "hevkariya ji bo kontrola koçberiyê û pêşketina aborî" de li ser welatên cîran dihê ferzkirin ku bibin gardiyanên tixûbên Yekîtiyê. Divê agahî were dayîn ka koçber li kîjan wealtî hatine, di ser kijan welatî re dixwazin derbasî kijan welatê Yekîtiyê bibin. Bi vî awayî ev welat neçarin di berdêla berjewendiyên aborî û carnan polîtîk de tixûbên Ewrûpa'yê biparêzin.

Welatê Marok, (Fas) di sala 2008'an de, ji ber tevgera xwe ya li hemberî koçberan, ji aliyê Yekîtiya Ewrûpa'yê ve "statuya pêşketî" bi destxist û di ser jî hat bi xelat kirin. Di payîza sala 2005'an de, bi qasî bîst kesên ji herema Sahara ya Afrîka'yê hewl dan li ser txubê Marokî û Spanî (7) li Ceuta û Melilla, ji çeperên hesinî yên sînor derbas bin. Hemû di encama gulebaran artêşa marokî de jiyana xwe ji dest dan. Ne tenê ev buyer, her weha li ser tixûbê Cezayîr'ê jî artêşa marokî bû sedemê kuştina gelek penaberan. Buyerên kuştinê yên bi vî rengî bi awayeke zanebûn ji aliyê hukumeta marokî ve hat medyatîze kirin. Buyereke din ku zêde di çapemeniyê de cîh negirt ew bû ku roja 28'ê Nîsan'a 2008'an, li ser derya herêma Al Hoceima (bakur-rojavayê Fas'ê) herî kêm sî kes, ji wan çar zarok, di avê de xeniqîn. Ji ber ku bi ya şahidên bûyerê, artêşa marokî bi zanebûn botên ku penaber lê sîwarbûbûn qul kirine, û tev noqî binê avê bûne (8). Di barê zelalkirina bûyerê de tu anket nehatin çêkirin.

Peymanên bi welatên cîran re hatine îmze kirin bi taybetî jî yên ku jî bo ji nû ve qebûl kirina penaberên di ser xaka wan re transît derbasbûne, (peymana şûnve vegerandina koçberan) aliyê herî girîng yê mijarê ye. bi ya zagonên îro, ji bo ku penaberek ji ber kêmasiya kaxizên xwe ji ser xaka Ewrûpa'yê were tertxub kirin, divê yan welatê wî yan jî welatê ku herî dawî, transît tê re derbasbûye wî qebûl bike. Tê zanîn ku ku welatên cîran yên ku rola transît leyîstine, ji ber ku tê de tu berjewendiyên xwe nabînin, şûnvevegera penaberan qebûl nakin, lewma jî welatên ewrûpî ku ji vê rewşê hayedarin ketine nava çerxeke bê dawî ya sûçan ku ji mantiq dûre û mafên bingehîn yên mirovan binpê dikin. Li Senegal'ê, li Ukranya'yê û li hin welatên Balkanan, şûnvevegerandina kesên "qaçax" di bin şertên zehmet de bê parastin û bê formaliteyên fermî hat pêkanîn. (9)

Yekîtiya Ewrûpa'yê û welatên endam li hember koçberên berendamên penaberiyê şer dane destpêkirin, qurbanê sererast yê vî şerî mafê penaberiyê ye. Kesên ku ji ber rewşa xwe mafê penaberiyê heq dikin, li "welatên tampon" ku wekî parazvanên bircên Ewrûpa'yê hatine wezîfedra kirin, li hev hatine kom kirin û ji mafên xwe yên penaberiyê bê par hatine hiştin. Di bin navê qaşo "parvekirina wezîfeyan" de Yekîtî hewl dide bide bawer kirin ku ewê bi awayke maqûl penaberên li kampan agahdar bike ku ew naxwaze mafê penaberiyê bide wan. Ew welatên ku demborî ji van penaberan re malovaniyê dikin jî bi pereyan dihên xelatkirin. Yekîtiya Ewrûpa'yê bi vê tevgera xwe cesaret dide welatên ku hem ji aliyê aborî ve hem jî ji aliyê polîtîk ve nikarin penaberan qebûl bikin û her weha li hember gelên ku li welatê xwe di nava jiyaneke nexweş de ne, dibe sedemê mezinbûna pêla nijadperestiyê. (10)

Yekîtî her weha piştgirî dide vebûn û pêşxistina kampên penaberiyê yên li welatên derdorê ku bi xwe fînanse dike. Weke mînak ji sala 2004'an vir ve li Ukranya. Yek ji wan welatane ku îmzeya xwe avêtiye binê peymana Cenevre'yê ya di barê penaberiyê de. Li Lîbya'yê jî tevgerên xerab yên li hemberî penaberan bi berfirehî hatin belge kirin. (11) Di gel vê yekê ji gulana 2009'an vir ve, Îtalya koçber û kesên dixwazin bi rêya deryayî ji bo penaberiyê bikevin welatê wan şûn ve vedigerîne Lîbya'yê. Bi vê tevgerê Îtalya hem peymanên navneteweyî yên di barê deryayê de binpê dike û hem jî prensîbên şûnvevegera penaberan davêje bin lingan. (12) Bi ya van prensîbên navneteweyî divê kesên pêdivaya wan bi parastinê hene şûnve neyêne vegerandin. Ev binpêkirinên mafên bingehîn yên mirovan ji aliyê welatekî endamê Yekîtî'yê ve dihê pêkanîn, hem jî li hemberî wî ti reaksiyon û nerazîbûn nehatiye nîşandan, nejî ji bo pêşerojê ti çareserî hatiye pêşniyaz kirin. Di tîrmeha 2009'an de, Komîsyona Ewrûpa'yê pêşniyazî li Libya'yê kir ku bi wan re bikeve nava "hevgirtina ji bo rêvebirin û kontrola pêlên koçberiyê." Komîsariya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo penaberan (UNHCR) ji xwe derfetên xwe seferber kirine ji bo ku "alîkariya mirovî" bigîhîne kampên penaberan yên derveyê Yekîtî'yê.

Hevkarî û hevalbendiya Yekîti'yê ya bi welatên cîran re ji bilî binpêkirina mafên penaberan mafekî din ya bingehîn dixe xeterê: ew jî mafê çûyîn û hatinê ye. Ev tevger herher weha koçberên ku naxwazin werin Ewrûpayê jî dixe bin tesîra xwe. Konsepta "pêşketina hevgirtî" (co-développement) di gotinê de her çend xweş were guh jî di rastiyê de di xizmeta paşketin û şûnvemayînê de ye. Ji bilî aliyî fermê yê mijarê, gelek aliyên sexte û veşartî yên ewlekarî û parastina tixûban hene. Ji bo pêşîgirtina li "koçberiya illegal" pir projeyên tedbîrê hatin finanse kirin.

Di konsepta "pêşketina hevgirtî" de armanc ewe ku biryarên yek alî yên Yekîtiya Ewrûpa'yê bi gelên din bide qebûl kirin û vê propagandayê derdixe pêş: pêşketina aborî ya welatên ku koçber jê derdikevin, dikare bi awayeke daîmî pêşî li koçberiya qaçax bigire. Di vê propagandayê de du xapandin hene, ji ber ku pêşketina aborî ya welatekî, hemwelatiyên wê hê bêtir dixe nava tevgera çûyîna derve. Ya din jî "alikariya" ku Yekîtî bi vê armancê dide wan welatan, ji aliyê rêvebirên wan ve dihên desteser kirin. Lê ev defik û xapandin digêhêje aramanca xwe, ji ber ku ev welatên hewcedar, ji bo ku wezîfeya xwe ya pêşîgirtina li koçberiyê bînin cîh, deriyên çûyîna derve asê kirine û ji hemwelatiyên xwe re bûne wekî zîndan. Encamên berbiçav yên hevkariya di navbera wekî mînak Îspanya û cîranên wê yên afrîkî de gîhiştine vê astê: li Cezaîr û Marokan'ê, di qanûnan de "koçberiya qaçax" wekî sûc dihê qebûl kirin. Lê li Senegal'ê ew sererast dihên cezakirin. Lê belê her gel û welat ji vê xapandinê re serî danayne. Di nîsan'a 2010'an de, serokê Malî'yê bi hemwelatiyên xwe yên li diyasporayê da zanîn ku ew ji "pêkanîn û tevgerên xerab yên li ser sînoran" hayedar in û bi tu şeklî ew van binpêkirinan qebûl nakin. Çawa ku rojnameya senegalî Le Soleil (roj) di arîfeya Konferansa Euro-Africaine de ya ku di sala 2006'an de li Rabat'ê pêk hatibû, di servivîsa xwe de jî bikaranî: Wateya externalisation ew e ku "Ewrûpa mifte li tixûbên me dixe."

**Wergera ji fransî**
**Bedran Dere**

(1) Encama 4'emîn konferansa wezîrên ewrûpî yên ji pirsgirêka koçberiyê berpirsiyar Luxembourg, 1991.

(2) Dosyê bixîne " şebekeyên biyanî ", Plein Droit, n° 84, Adar 2010 .

(3) Jelle Van Buuren, " Yekîtiya Ewrûpa'yê wê kengê li dora xwe çemberek ava bike ", Le Monde diplomatique, çile 1999.

(4) Plana li ser pênç salan ku cîh dide deh karên lezgîn yên YE

(5) Bixwîne Philippe Rekacewicz, "Koçber, mudaxeleya rizgarkirinê ya li ser deryayê û mafên mirovan", Visions cartographiques, 27 Îlon 2009. — http://blog.mondediplo.net/

(6) Bixwîne Jean Ziegler, "penaberên birçîbûnê", Manière de voir 108 "Afrîka ya pêwist", kanûn 2009 - Çile 2010.

(7) Migreurop (berhema hevbeş ya Emmanuel Blanchard û Anne-Sophie Wender), Şerê li hemberî koçberan, pirtûka reş ya Ceuta u Melilla, Syllepse, Paris, 2007.

(8) Loubna Bernichi, "La marine royale enfoncée", Maroc Hebdo, 16 mai 2008.

(9) Claudia Charles, "peymana şûnve vegerandina penaberan û rêzgirtina mafên mirovan", noten agahdariyê yên parlemena Ewrûpayê, Îlon 2007. Li dosya koma Migreurop binêre: http://www.migreurop.org/article1348.html

(10) Ji bo Marok'ê bixîne rapora GADEM (Koma dijî nijadperestî û parstina koçberan), Rabat, Sibat 2009: http://www.migreurop.org/article1395.html

(11) Rapora saziya îtalî bixwîne Cf. ASGI (Associazione per gli Studi Giuridici sull'Immigrazione), Bologne, Hezîran 2009 :http://www.asgi.it/home_asgi.php?n=314&l=it

(12) Rapora Komîteya li hemberî êşkencê (CPT) ya Konseya Ewrûpa'yê ya di barê Îtalya'yê de bixîne. 28 Nîsan 2010.

# Em çawa dizanin?

Têkoşîna li hemberî koçberiyê herçend yek ji karên lezgîn ê Yekîtiya Ewrûpa'yê be jî, di belgeyên fermî de cîh nagire. Ji bo tevger û helwesta polêsan a li hemberî koçberan baş were dîtin, divê belge û raporên saziyên derveyî hukumetan di ber çavan re were derbaskirin: United for Intercultural Action, Ev saziyeke anti-rasîst e (dijî-nijadperestî), navenda wê li Amsterdam'ê ye. Hemû bûyer û mirinên koçberên ku hewl didin bikevin nava txubên Schengen'ê, dixe rapor û hêjmara wan derdixe. (www.unitedagainstracism.org). Migreurop, Ji komeke lêkolînvanan pêk tê û li ser polîtîkaya Ewrûpa"yê ya koçberiyê kar dikin. Di destê wan de lîsteyeke dirêj ya kampên penaberan heye (www.migreurop.org).

Nexşeyên erdnigarî yên vê dosyayê ji aliyê lêkolînvan Olivier Clochard ve (endamê koma Migreurop) û bi alîkariya Thomas Honoré, Pierre Raseev, Guillaume Bernard û Nicolas Lambert hatin amadekirin. Nexşe ji berhema Armand Colon hat girtin, ya bi navê l'Atlas des migrants en Europe, géographie critique des politiques migratoires, (Atlasa koçberan ya Ewrûpa'yê, erdnîgareke hasas ya politikaya koçberiyê.) Paris, 2009. Nexşe ji aliyê Philippe Rekacewicz ve li gorî dosyayê hat guherandin û sererast kirin.


Nivîs û nexşeyên cihêreng yên li ser mijarê dikarin di malbera înternetê ya li Le Monde diplomatique de were xwendin.

(http://blog.mondediplo.net/777).

www.arsivakurd.org

ÇAND

# Dema ku binê hewayê sor bû



*Kadir Akyol, 40 x 160 cm*

**Hejmara taybetî ya le Monde diplomatique, 196 rûpel, 12 euros. Li firoşgehan.**

Li ser rêya Rewandûz'ê nuqteya kontrolê ya nobedaran heye. Ev nuqte her weha tixûbên herêma desthilatdariya hukûmeta Bexda'yê û ya xaka kurdên girêdayî General Barzanî diyar dike. Piştî kontrola dawî ya hêzên ewlekariya Baasî, wesayîta me rêya xwe berdewam dike. Rêwiyên ku bi me re ne şa dibin, mîna ku ji xeterekê rizgarbûbin, bêhna xwe fireh dikin û yek ji wan dibêje: "Hûn bi xêr hatine Kurdistan a azad." Di wê navberê de jî kaxiz û belgeyên ku divê di kontra pêş de nîşanî pêşmergeyan bidin amade dikin.

Li aliyê rast ê bajarê Rewandûz'ê, ku li quntarên çiyayên bilind hatiye ava kirin, li ser devê kendalekê, xwezayeke balkêş heye, mîna ku bi devê balte hatibe neqişkirin. Hêzên artêşa Iraq'ê tu car nikaribûn ev bajar ji holê rabikin. Li derveyî bajêr, baregeheke mezin a hêzên Bexda'yê heye: ji agirbesta 11'ê Adara 1970'an û vir ve, artêşa Iraq'ê hewl neda ku ji vê tixûbê derbas be. Di navbera wan û sinora herêma kurdan de, tenê çend sed mîtro mesafe heye.

Li pişt me, bi qasî sed kîlometre dûr, bajarê Hewlêr'ê û bi qasî 250 kîlometre dûr jî bajarê Kerkûk'ê heye. Ev bajar şev û roj bi fîşengên saziya berê ya nefta Iraq'ê ve dihê ronîkirin. Li Kerkûk'ê îro, salê bi qasî 50 mîlyon ton petrol derdikeve, çav li rê ye ku ev hejmar di demeke nêz de derkeve 80 hezar tonan. Ev bajar bi hilberîna xwe ya bilind a petrolê, di navbera Bexda û General Barzanî de sedema alozî û mijara nîqaşê ye. Ji bo Kurdan ev bajar paytexta Kurdistan'a Iraq'ê ye. Yek ji mîlîtanên ciwan, ku bi me re rêwitiyê dike, dibêje: "delîla herî mezin ew e ku li Kerkûk'ê tu goreke ereban tune! Hûn dikarin lê bigerin, hûnê rastî tu goreke ereban neyên!"

Kurdan vê gavê tenê herêmên çiyayî xistine bin kontrola xwe. Em jî niha li ser rêya "Hamilton"ê ber bi wan herêman ve diçin. Rêyeke xirab e, wekî derbazokeke çiyayî teng e, li hev civ dibe û dirêj dibe. Ev rê diçe heta Hecî Umran'ê, ser tixûbê Îran û Iraq'ê. Ji wê derê jî derbasî bajarê Îran'ê, Xane dibe ku hêzên Amerîkî piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê li vî bajarî, baregeheke leşkerî ava kiribûn. Ev rê her weha heta bajarê Mahabad'ê dirêj dibe. Îro ev rê şahrega jiyanê ya welatekî wisa ye ku li ser tu nexşeyeke Rojhilata Navîn cih nagire, û ji aliyê tu hêzeke navneteweyî ve nayê naskirin. Serokê vî welatî General Barzanî -bi gotina wî- "ji gelek serokdewletan ku welatê wan li Neteweyên Yekgirtî xwedî nûneran in, zêdetir xwedî desthilatdarî ye." Ji ber ku bi sedan hezar kîlometre tixûbên stratejîk ên nav dilê Rojhilata Navîn di bin kontrola wî de ne: tevahiya tixûbên Iraq û Tirkiye'yê, qismekî tixûba Iraq û Sûriye'yê û her weha bi qasî nîvê tixûbên Iraq û Îran'ê!

Di navbera hukûmeta Bexda'yê û hêzên General Barzanî de têkiliyeke balkêş heye. Her çend bêhna şerekî nû were jî, her du alî ji hebûna hev re deng dernaxin. Artêşa Iraq'ê bi qasî deh salan li hember hêzên Barzanî şerekî dijwar da meşandin, carnan sûcên giran û hovîtiyên mezin hatin pêkanîn, lê ev şer tu caran dijminatiyeke nîjadî dernexist holê. Di dema pevçûnên herî dijwar de jî, kurdên Bexda'yê – dora nîv mîlyon– tu car ji ber aîdiyeta xwe ya nîjadî nebûn hedefa zulmê. Di demekê de ku ji bo kuştina endamên malbata Barzanî xelat dihat dayîn, rêvebirên din ên kurd dikaribûn bi hêsanî bi rêya balafirê ji Bexda'yê derkevin rêwîtiya London'ê yan jî Moskova'yê! Dîsa di demekê de ku nûnerên hukûmeta Iraq'ê nikaribûn bikevin herêma di bin kontrola hêzên General Barzanî de, hukûmeta Iraq'ê mehê 250.000 dînars (bi qasî 750.000 dolars) pere alîkarî dida pêşmergeyên girêdayî hêzên Barzanî! Di hukûmeta Iraq'ê de digel ku pênc wezîrên kurd hene, rêvebirên Iraqî xwe ji êrişên bombeyî yên li ser gundên kurdan şûn ve nadin... Bi kurtayî, ev ne rewşeke aram e, ne jî nîşana şer e.

Piştî rewîtiyeke bi wesayîtê ya nîv saetî, em ji geliyekî ku dişibe geliyên piçûk ên li Alpan, (bi cemeda xwe, bi hêşinayî, bi keriyên bez ên ji mih û bizinan pir dişibin hev), derbas dibin û digihîjin Galala'yê. Bajarê herî mezin ku bi giştî ji aliyê hêzên Kurdan ve dihê kontrolkirin. Ji bo qaçaxçîtiya bi Îran'ê re, ev herêm ji aliyê aborî ve dema xwe ya herî xweş dijî. Piştî çend deqqeyan em li Nawperdan in, bi qasî 30 kîlometre dûrî Rewandûz'ê: Ev der baregeha hêzên General Barzanî ye. Peymana 11'ê Adar'a 1970 jî li vê derê hatibû îmzekirin. Li Baregehê çend holik hene ku ser wan bi axê hatine girtin û di hundir de jî çend mobîlya hatine bicihkirin û hew... Hemû hebûna vê rêxistinê, ku deh salan in ku li hember artêşa Iraq'ê li ber xwe daye, tenê ji van çend maseyên metalîk û ji van cîhazên telefonê pêk dihat.

Li vê derê mirov dikare rêberê tevgera berxwedana kurd General Barzanî yê 70 salî û her du kurên wî Îdris û Mesûd bibîne. Her du kurên wî yên 30 û 25 salî di tevgerê de êdî xwedî rolên girîng in. Lê belê ji heşt mehan û vir ve, gelek kesayetiyên nû dihên herêmê: xwendevanên kurd ên Iraqî ku li Ewrûpa'yê dijîn û xwendina xwe berdewam dikin, carnan dihên herêmê û alîkariya "teknokratîk" didin General Barzanî. Bi vî awayî, rêxistina berxwedana kurdan ku heta niha tenê ji hêzên çekdarî pêk dihat, bi alîkariya van xwendevanan êdî dikare dengê xwe bigihîne cîhana derve jî.

**Li jêr hewayê sor**

Le Fond de l'air est rouge (li jêr hewayê sor) fîlmeke Chris Marker'e. Bi destûra wî Le Monde diplomatique ev nav wekî sernivîsa roportajên taybetî yên ku di navbera salên 1960 û 1975'an de hatine weşandin, bi kar anî. Wan deman, li Başûr, têkoşîna li hemberî dagirkeriyê ber bi serkeftinê ve diçû û li rojhilat reformên sosyalîzmê pêk dihatin. Li Rojava tevgerên ciwanan li hember sîstema sosyalîst derdiketin. Rojnamevanên ku li her çar aliyên cîhanê belav bûbûn, bi dûr û dirêj behsa rêwîtî û serpêhatiyên xwe dikirin. Bi berhemeke du sed rûpelî, xwendevan dikarin bi van rojnamevanan re derkevin rêwîtiya çil welatan.

Ji destpêka serhildana li Angola bigire heta "manastira marksîst" a Albanî, ji berxwedana li Vîetnam'ê bigire heta dagirkeriya li Filîstîn'ê, ji çêbûna Bangladeş'ê bigire heta darbeya leşkerî ya li Şîlî'yê, ji beşdarbûna Afxanistan'ê ya di şer de bigire heta dîktatoriya serbazên yûnanî, ji mudaxaleyên navxweyî yên Çekoslovakya'yê bigire heta hewldanên darbeyên li hember rejîma Hassan II… Di nava ew qas mijarên cihêreng de, ev nivîsara li jêr, ji roportajeke Chris Kutschera hatiye berhevkirin. Ev hevpeyvîn di Nîsan'a 1974'an de li Kurdistan'a Iraq'ê hatiye çêkirin.

**Wergera ji fransî**
**Bedran Dere**

AFXANISTAN

# Kabûsa stratejên rojava



*Zorekekî afganî û kevokên aştiyê! - www.ihh.org*

Dema ku Amerîka û hevalbendên wî yên Hevgirtina Atlantîk'ê (NATO), li Afxanistan'ê, rastî zehmetiyên, ku di sala 1979'an de Artêşa Sor rast hatibû, dibin, wê demê stratejên rojavayî hewl didin ku paşerojê niqaş bikin, daku ji pirsgirêkên îroyîn re çareseriyan bibînin.

Her wiha, li gorî Mériadec Rafray (1), ji navenda doktrîna ji bo bikaranîna hêzê (CDEF), leşkerên Moskova'yê, ên ku ti carekê ser neketibûn, asta daxwaza serhildanê, ya girseyên di kampên afgan de, teqmîn nekiribûn. Bi saya guherînekê taktîkî, a di 1981'an de – yekîneyên zêdetir saxlem û zinde ku di herêmê de baş hatine bicihkirin, bikaranîna giştî ya hêzên taybet û her wiha ya balefiran û helîkopteran- wan dîsa karibû bandorê li ser berxwedanê de çê bikin, bi taybetî li ser girseyên mezin.

"Artêşa biheybet, ya ku biewle ketibû Afxanistan'ê, di nava demeke kurt de xwe di qadeke fireh de dît û li wê derê nizanibû çi bike, weke balyozeke ku nikaribe mêşekê bikuje". Ev hevok, ji aliyê serheng Philippe François (2) ve hatine ziman, bi van hevokan wî xwast "vegera berbi tecrûbeyê", ya artêşa sor, ku bi înîsiyatîfa Akademiya Frunze, dibistana şer ya hêzên bejayî ên Sovyet'ê, topî serhev bibû, bîne ziman. Leşker rastî "êrişeke piçûkxistinê ya ku, sed sal berê, ji aliyê îngilîzan ve hatibû jiyan kirin" li ser heman cihê tiyatroyê, hatibûn, "kemîna lidijî dagirker." Ev serhengê hêzên avî wiha dibêje: "Werema afgan êrişê 40'emîn artêşê kir, her wiha wê hemû saziya leşkerî kir bin bandora xwe, ji bo xwe li hemû civakê belav bike, wê hesasiyeta xwe bi cîhanê da bihîstin."

Di demeke kurt de, stratejiyekê li dijî serhildanên girseyî hate lipêşxistin, artêşa Sovyet'ê rêbazên "ji bo nehêle civak bi hikûmetê re bibin yek, terorîzekirina girseyê" û her wiha "parçeyeke behrê vala bike ku duşmin, weke masî tê de bêav bimîne" ji xwe re eciband. Di heman demê de wê kontrola herêmê kiribû bin bandora xwe, lê belê ew der ciheke vala bû. Bi awayeke giştî wê rojê rewş ji "fetihkirina dilan û aqilan" dûr bû. Bi rêya analîstên Olivier Hubax û Matthieu Anquez (3), General David Kilculen wiha digot "Şûna ku em hewl bidin artêşekê û firmeyekê tine bikin, qezenckirina dilan dihê wateya îqnakirina kesên ku serkeftinên we ji bo berjewendiyên wan dibin hacetên xurt; "qezenckirina aqilan" bi we dide ferz kirin ku wan îqna bikin daku hûn dikarin wan biparêzin, lê belê, berxwedan wan nabe derekê. Ev her du konsept jî bi nêrîna "kes ji we hez dike an jî ne", tine. Tenê hejmara berjewendiyên we ên şexsî dihê hesapkirin, ne tiştên a hestî."

Nivîskarên pispor ên di warê stratejiyê de, tînin ziman ku çawa amerîkiyan bingeha têkoşîna şoreşger, a li Iraq'ê, derxistine zanistiyê – bi vegera wan a bi derfetên teknolojîk ku piştî têkçûneke nîvçe, a li Iraq'ê, pêkhat. Pisporên teorîk, ên li Washington'ê, hewl dane ku lêkolînvanên şerê lidijî serhildanên girseyî, bi taybetî ên fransewî, bikin ber kar ku berpirsyartiya "zehmetiya herî mezin" ku ji aliyê serfermandarê artêşa fransewî, Jean-Louis Georgelin (4) ve pêk tê. Têkoşîna li dijî serhildanên girseyî duşmin ji hêza wî a zinde dûr naxe, lê belê, bêîstikrariya wî, an jî qelskirina wî tê, dikare bi wî biryarên girîng bide girtin. Ev jî di "çarçoveyeke ciddî ya bikaranîna hêzê" de derbas dibe, û divê ew bi awayeke "çalakiyekê global" pêk were, leşker û sivîl werin tevlihevkirin û bi vî awayî ji pêwîstiya "çeka psîkolojîk" re bersiv were dayîn.

En formûla General Challiand bigirin dest- "Têkoşîna lidijî serhildanan, xebatekê civakî ye" – Hubac û Anquez, li ser pêdiviya windabûna ji bo berjewendiyên hikûmeta legal israr dikin. Ji aliyê nivîskar ve ev gotinên General David Petraeus, fermandarê hêzên amerîkî ên li Rojhilata Navîn, wiha dihê diyarkirin "Ji bo her hêza rizgariya gelan kêm şans heye ku ew bikaribe xwe weke artêşekê birêxistin bike." Tenê mirov dikare bêje, li gorî Hubac û Anquez, qelsiya Rojavayîyan li Afxanistan'ê li gorî rastiya hêzên ku "nikarin dil û aqilên gelên xwe fetih bikin" e: Hesasiyeta herî mezin ya girseyan, bi taybetî ya girseyên ewrûpî; rastiya wendayiyên şer vedişêrin; xera bûna "motora îdeolojîk."

Fermandar Amin Wardak (5), yek ji şefên berê yê berxwedana afgan ku naha li Fransa'yê penaber e, wiha dibêje; "Iro, ez bihêrs im, ji ber ku rejîma ku amerîkiyan li Afxanistan'ê çê kirine, nameşe." Her wiha ew wisa dibêje; "lê belê, digel vê neserkeftina mezin, NATO dixwaze her tim zêdetir lemkeran û çekan bişîne Afxanistan'ê. Ev jî tenê şer gur dike." Ev şahîdî, cureyên aliyan û her wiha ên aktorên navneteweyî, ku ketine nava şerê li Afxanistan'ê, bi me dide fêmkirin. Serheng Geoffroy de Larouzière, profesorê dibistana şer e (6), her wiha , di dawiya 2003'an de, ji leşkerên Fransa'yê ên li Afxanistan'ê re fermandarî kiribû, wiha ji xwe dipirse; "gelo em ê neceribînin ku bi afganan bidin qebûlkirin, dê ew çawa bimeşin?" "Gelo mafê wan nîn e ku ew bixwe bêjin ka ew dixwazin çawa bibin?"

PHILIPPE LEYMARIE

**Wergera ji fransî**
**Ahmet Dere**

---

(1) Mériadec Raffray, Afghanistan, serkeftinên artêşa sor ku hatî jibîrkirin, Economica, Paris, 2010, 144 rûpel, 19 euros.

(2) Taktîkên artêşa sor li Afxanistan'ê, Tercûme û daxûyaniyên, serheng Philippe François, Economica, Paris, 2010,215 rûpel, 29 euros.

(3) Olivier Hubac, Matthieu Anquez, Qada şer a afgan: xera bûna qedexekirî, nivîskar André Versaille, Bruxelles, 2010, 283 rûpel, 19,90 euros.

(4) Hevpeyvîna bi general Georgelin, "hilgirtina rizîkoyên şer", Le Figaro, Paris, 22 août 2008.

(5) Amin Wardak, bîranînên ser, Arthaud, Paris, 2009, 392 rûpel, 22 euros.

(6) Geoffroy de Larouzière-Montlosier, Rojnameya Kaboul'ê, Bleu autour, Saint-Pourçain-sur-Sioule, 2009, 204 rûpel, 15 euros.

## Naverok


**Desthilatdariya banqeyan**
Serge Helimi ▶ 1-2-3

**Hevalbendiya kujer a çekan**
Dr. Nikolaus Brauns ▶ 1-4-5-6

**Tirkiye perçeyeke Ewrûpa'yê ye?**
Dr. Hasan Kaygısız ▶ 7-8

**Bankayên lobîst liIeyê Bruksel'ê nobedarên demokrasiyê ne!**
François Ruffin ▶ 9-10

**Li dibistanan ewlekarî**
Chase Madar ▶ 11-12

**Di perwerdehiyê de hêviyeke nû**
Dominique Godrèche ▶ 13-14

**Şîddeta li dijî kurdan û neteweperestiya tirk**
İlhan Kızılhan ▶ 15-16-17

**DOSYA: ÎSLAM**

**• Selefîzm an jî guhertina îslamî ya bi îstîqrar**
François Burgat ▶ 18-19 21

**• Birayên Musulman ên Rojava**
Jean-Pierre Filiu ▶ 20

**• Li Misir'ê çîna nû û şoreşa civakî**
Alain Gresh ▶ 20

**• Krîza nasnameyê li cem îslamiyan**
Vicken Cheterian ▶ 21-22

**Japonya: Li welatê ku roj lê hil dihê dîplomasiya Mîkado**
Martine Bulard ▶ 23-24-25

**Afrîka: Bankayeke ne wekî yên din**
Dr. Yves Ekoué Amaizo ▶ 26-27

**Kontrola koçberiyê wekî îhale dane welatên cîran**
Alain Morice û Claire Rodier ▶ 28-29

**Dema ku binê hewayê sor bû**
▶ 30


**Afxanistan: Kabûsa stratejên rojava**
Philippe Leymarie ▶ 31

**Ji evîn û ji tozê**
Xavier Lapeyroux ▶ 32

PIRTÛK

# Ji evîn û ji tozê

**Nivîskar:** Ernest J. Gaines
**Wergera ji amerîkî:** Michelle Herpe-Voslinsky
**Weşanxane:** Liana Levi, coll. “piccolo”, Paris, 2010, 256 rûpel 9 euro.



*Kadir Akyol, 90 x 60 cm, 2010*

Louisiane. Di nava zeviyeke bejayî, hişk û ziwa de, mirovên reş bi kedkarî dixebitin. Di ser wan re, mirovên sipî, hukumdarê herêmê tenê emir û fermanên xwe dibarînin. Lê hatina mirovekî, mirovekî bi tenê, Markus, her tişt dikare buguherîne. Cîhana ku em tê de dijîn, îro li ber serûbinbûnê ye. Mêzîna sîstema kevin xirab bûye. Tirs û fikar bersivên xwe dibînin.

Jim Kelly hem tiştên bi xwe dîtine ji me re dibêje, hem jî tiştên ku kesên din dîtine ji mê re dibêje. Ji ber ku Markus dema ku di berdêla heft û heyşt sal xebateke dijwar de ji aliyê axayê herêmê Marshall Hebert ve ji girtîgehê tê derxistin, êmanetê Jim – xebatkarekî reş yê bê pirsgirêk– tê kirin. Lê belê Marcus ketibû defikê. Ew difikirî ku ewê bi vî awayî çend salên xwe yên zehmet yên li zindanan kêm bike. Lê piştre ji Jîm re wiha dibêje : “Ji bo min, zehmetiyeke ji jiyana min ya îro girantir ne mumkune hebe. Jim, Ez vê gavê li vê derê kole me, ji jiyana koletiyê dijwartir jiyan nîne.”

Ernest J. Gaines bi karekterên pirtûka xwe re, girênekên ku mirovan dipelixînin û mekanîzmaya ku gotin û tevgeran diyar dike, yek bi yek ji hev derdixe: rastiya zehmet, tekiliyên serdestî û desthilaêtdariyê, pêkanîna adet, kevneşopî û kodên civakeke bê mirov, weke fermanên zagonan hatine diyar kirin.

Marcus piştî demekê dilê jina şefê komê Bonbon, ya bi navê Louise berbi xwe ve dikişîne. Jinik jî ji xwe di jiyana xwe ya teng de asê mabû. Lewma fîrar kirin, edî ji bo Markus gelek zehmet bûbû. Markus ji Jîm re dibêje “Niha ez dixwazim em herdu bi hev re ji vê derê birevin, ew jî weke min kole ye li vê derê.” Louise jineke sipî ye, lewma jiyan hinek zehmetir dibe. Meseleyek tozê ye, meseleya mekanizmeyek ku nexweş ketibe ji ber hebek dendikê niha jî bûye du heb. Li vê derê evîn kême, ji ber ku herkes ji bo kesekî din, alaveke. Şert û merc wisa ferman dikin. Cîhana mirovxuran, birçî, weke sipîral li dora xwe digere û wenda dibe. Di nava rûpelan de, herkes bûye yan nêçîr yan nêçîrvan, karekterên weke Jim û Marcus, Louise, Bonbon û metresa wî Pauline, Marshall Hebert û hemû kesên di rola duyem de, – xaltika Margaret, rêvebir, û Bishop û hemû kesên din her kes rola xwe ya ku civak li wan ferz kirye dileyîzin. Mirovên Reş û Sipî hemû jî bûne girtiyên şert û mercên xwe. Dema yek çewt dikeve, rêz xirab dibe, hemû civaka wê derê dicirife û hertişt serû bin dibe.

Nivîskar Gaines berê xwe dide hedefê. Ew di rêya herî kin de, bê ku li derdorê bigere diçe nava dilê bûyer û lehengan. Buyer li ser dika rastin diqewumin, hem jî li ber çavan, Bi nivîseke bijarte, elegkirî, û sererast Gaines ti tiştekî bê kontrol bernade. Li seranserê çemê wî ti darekî bê kêr tine. Dema mirov dikeve nava kûrahiya bûyeran ne mumkune mirov bandora hêza nivîsarê hîs neke. Bi aliyê xwe yê modern John Steinbeck, û herwiha Tennessee Williams tîne bîra mirovan. Dîrok mîna ku xwe dubare bike. Encama vê cîrokê mîna ku berî niha jî hatibe nivîsandin.

Dîmenek di seriyan de dimîne: “Lingê wî di ber derî de asê bû, Bishop di pişt wan berçavikên xwe yên stûr de, bi çavên matmayî li min nêrî û got. Ev avahî ji aliyê bapîrên wî ve hat çêkikrin, tev bi keda koleyan. Lingê wê ket ber deriyê vê avahiyê.”

Êdî tirs derbas bû. Jim li ser hersê tevgerên ku li ber çavên wî qewumîbû êdî zelal bû. Li hember Louise û Marcus minetdar bû: “Ez dixwazin ji wan re bibêjim ku wan buhureke nû vekir. Belê ezê ji wan re wisa bibêjim: Ewê rê vebikin, kesên din pê bihesin, fem bikin û ewê karibin di şopa wan de biçin.”

Ernest J. Gaines jî weke nivîskar rêyeke nû vedike – nivîskarê mezin yê “romana başûr” , di sala 1994’an de bi pirtûka (Ji wan re bibêje ez mirovek im) Dites-leur que je suis un homme xelata National Book Award bi dest xist. (Editions Liana Levi), di sala 2004’an de jî ev berhem bû yek ji pirtûkên ku ji bo namyetê xelata wêjeyî ya Nobel’ê hat nîşandan.

XAVÎER LAPEYROUX

**Wergera ji fransi**
**Bedran Dere**

**Le Monde Diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**Edîtor**
Faysal Dağlı

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**

Konrad-Adenauer-Ufer 39
50668 Köln / Almanya

**Desteya rêvebirîyê**
Murat Satık
Rıza Dinç
Metin Göktepe
Faysal Dağlı

**Le Monde Diplomatique kurdî**

**Şêwirmenda weşanê**
Berîvan Aymaz

**Asîstanta edîtor**
Semra Polat

**Asîstantê weşanê**
Sharo Îbrahim Garip

**Rêvebirê hunerî**
Hasan Hüseyin Deveci

**Designer**
Mehmet Nazmi Demir

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**Webdesigner**
Erhan Yekta

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH
Post Bank
Konto: 371219609 - BLZ: 50010060
IBAN: DE84 5001 0060 0371 2196 09
BIC: PBNKDEFF

**Almanya:**
Salane: 50 euro - 6 meh: 25 euro
**Derveyê Almanya:**
Salane: 60 euro - 6 meh: 30 euro

**Le Monde Diplomatique**

**Damezrêner**
Hubert Beuve-Méry

**Rêvebir**
Serge Halimi

**Sernûser**
Maurice Lemoine

**Cîgirên sernûser**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Rêvebirê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.avestakurdi.org